



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 7 Hejmar - 36
Reşemî - Adar 2011

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elixan LORAN

Mîzanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Bergê
Evdilxefûr HİSÊN

Şêwirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: (0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Hevpeyvîn bi Muhsîn OSMAN re - **Serwet DENİZ** / 3
- Du helbest - **Kawa NEMIR** / 8
- Inka BACH - **Tengezarê MARÎNÎ** / 9
- Avdar- **Avjen LÎS** / 10
- Teoriya aboriya nûjen - **Rênas JIYAN** / 11
- Hêsir û agir- **Îlhamî OZER** / 15
- Elektrîk - **Şevger ÇIYA** / 16
- Galaya xwekustînên qewmekî - **Janbijan AR** / 19
- Garan zikak û zarok - **Xort BAJARVAN** / 20
- Ji "evîndarên celadê xwe" re- **Şêxo FÎLÎK** / 21
- Du helbest - **Nesrîn NAVDAR** / 22
- Şev e - **Dilşêr BÊWAR** / 23
- Ez ê bi ser bikevim - **Fahrî KARAKOYÛNLÛ** / 24
- Ji avê heta axê Orlîcê - **Înan EROGLU** / 27
- Fêkiyên demsala kenê- **Berfo BARÎ** / 29
- Hezkiriya nejimartî - **Heinrich BOLL** / 30
- Sfînska bê raz - **Oscar WILDE** / 31
- Dosye - **Têkiliyên wêje û politikayê, wêjeya politik** / 34
- Ayîngeh û mabeda siyasetê edebiyat e - **Medenî FERHO** / 35
- Şoreşa wêjeyê ↔ wêjeya şoreşê - **Sidar JÎR** / 42
- Wêjeya kurdî û politîka - **Berken BEREH** / 45
- Wêjeya politik - **Sinan SUTPAK** / 49
- Têkiliya wêje û politikayê - **Fatma SAVCI** / 53
- Wêje, politîka û pêwendiya nivîskarên kurd - **Çiya MAZÎ** / 55
- Jiyan yekpare ye - **Feratê DENGİZÎ** / 58
- Di wêjeyê de siyaset - **Îsmail DÎNDAR** / 60
- Ê ez - **Kamran SIMO HEDİLÎ** / 61
- Heykelê Mazlûm dê kekobiray - **Sinan SUTPAK** / 62
- Îşev - **Rêdûr DÎJLE** / 63
- Dîlopek ehd mistek jiyan - **ar-da JANXWAR** / 64
- Bilbil - **Sîpan XIZAN** / 68
- Hesoyê dîn - **Zekî AKDAG** / 69
- Şoreşgerê esra teng - **Marin REHMAN** / 71
- Berdûş - **Hasip YANLIÇ** / 72
- Terka helbestê - **Tewfiq HÊJA** / 73
- Du helbest - **Faysalê ÛSIV** / 75
- Xirberojk - **Xecê OMERÎ** / 75
- Dev - **Şengul OGUR** / 76
- Serdaneke dereng - **Îsmail HACANÎ** / 77
- Diçim - **Peya SUVARÎ** / 78
- Kalo û niv kilo pîvaz - **Mirza RONÎ** / 79
- Xaçpîrsa helbesta kurdî ya nûjen - **Elixan LORAN** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji editor

Paul Valéry ji bo helbestê dibêje ku “Rista pêşîn dana Xwedê ye, jê pê ve jî xebat e”. Em ji ser gotina Valéry helbestnivîsina kurdî li qelemê bixin dê gelek helbest mirar bibin. Ji ber ku wê dana Xwedê ku em jê re bibêjin hevîrtirş ji bo qedimandin û destpêkirina hevîrekî ye, lê dema ku strîna hevîr –*xebata li ser helbestê*- tune be tê wê wateyê ku em bi hevîrtirş bera ser arvan didin û dixwazin ji arvan û hevîrtirş hevîrek –helbestek- pêk bê. Dîsa di vê çarçoveyê de divê em gotina Rênas Jiyan jî bînin bîra xwe dibêje ku “Helbest ne dirb e, derb e” Îcar ligel van bîrxistinanan helbesta me li ku dilûse? Em ê aşê helbesta ku mazmazka gotinê ye li ber ava kîjan çemî bidin gerandin? Ma gelo hêja ye ku ava aşê me yê helbestê lehî û şekelî bin ku mebesta me jê acizbûn, verişandin, têkçûnên serelî ne? An jî hêja ye ku ava aşê me çemekî dike lemelem be ku em têkevin timaya genimhêrandineke zêde? Bi kurtasî ji bo helbesteke mayînde da ku bibe dunde divê mirov bibe muptelayê xebatê û hewce bike di nava cîhana vegotinê de bibe peregende.

Di hejmara 35'an de nivîseke bi navê “Diyako” derketibû. Em niha zelal dikin ku nivîskarê wê nivîsê ne rêzdar Bîlal Çelîk ê ku berê di Wyê de nivîsên wî hatine weşandin e. Nivîskarekî ji Rojhilat bi navê Diyako ew nivîs ji me re şandibû.

Nivîskarê hêja, hogirê hevîbexş rêzdar Azad Ronakbar jî ji nav me koç kir. Xwedê bi rehma xwe wî şa bike.

Û Modikan! Modikên me yên êşê! Modikên me yên eşqê! Modikên me yê hestan! Modikên me yê hestiyar! Ax! Axê! Tu ji ku hînî welidandina hestiyar bû? Ma ax jî hestiyar dizê! Xerzano! Şerzano! Me dikujin bi çil û çar terzan!

Wekî ku tê zanîn Kovara Wyê weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê ye. Xwendevanên li girtîgehan gelek caran ji me Hînkêr û ferhenga kurdî-tirkî û tirkî-kurdî dixwazin ku ev weşanên hanê ji yên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ne. Navnîşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ev e; “*Cibali Mah. Atatürk Bulvarı Ünlü İş Merkezi A Blok Kat:3 No: 21/82 Unkapanı – Fatih / İstanbul. Telefon: 0 212 621 82 00 - 37*

Divê em tişteki bi xwendevan û nivîskarên kovarê re par ve bikin ku ji ber kar û barên me, me ev hejmar bi mehekê dereng derxist. Em ji ber vê derengmayînê lêborîna xwe dixwazin. Ev hejmar wê wekî hejmara “Reşemî-Adarê” derkeve.

Me berê dabû diyarkirin ku dosyeya “Adar-Avrêl” dê “**Li ba jinan wêjeya kurdî**” be, ji ber derengmayînê dê ev dosye di meha “Avrêl-Gulanê” de bê weşandin. Ji bo beşdarbûna vê dosyeyê herî dereng divê heta **15'ê Adara 2011'an** nivîs werin ber destên me.

Xwendevanên hêja wek kes û şopên wêjeyî em dixwazin herêm û hinek bajarên xwe ji aliyê çandî û wêjeyî ve bikin mijara dosyeyan. Çarçoveya dosyeyên me dê wiha bin, wêje û wêjevanên wî bajarî, wêjeya devkî û dengbêjî, muzîk û muzîkjenî, listikên şanoyî, çîrokên gund û wargehan, cil û berg, mihîrcanên herêmî û hwd.

Dosyeya Pûşper û Tîrmehê “**Silîva**” ye. Nivîskarê/a ku dixwaze beşdarî dosyeyê bibe herî dereng divê heta 15'ê Gulanê nivîsa xwe bişîne.

Em ji niha ve Newroza we pîroz dikin...



“Bingeha şanoya me jî kar û çalakiyên jiyana rojane ne”

Me di hejmara xwe ya berê de wek dosye “Şanoya kurdî” girtibû dest. Di çarçoveya dosyeyê de me cih dabû nivîseke mamoste Muhsîn Osman jî. Piştî ku bi boneya Konferansa Çand û Hunerê hat Amedê me xwest ku em hinekî bi berfirehî pê re biaxivin û ji ber vê yekê jî me ev hevpeyvîn pê re kir. Lewre ew kedkarekî şanoya kurdî ye û demeke dirêj e, serê xwe bi şano û bingehên şanoya kurdî diêşîne.

Serwet DENÎZ: Te di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê “Mezopotamya/ vekolîneke dîrokî di bajarvanî, kultur û dramayê de” gotiye “Min dixwest ez li ser şanoyê binivîsim lê min li ser Mezopotamyayê nenivîsanda wê nivîsandina li ser şanoyê kêma bima.” Çima bawerîyeke wisa bi te re çêbû?

Muhsîn OSMAN: Di rewşenbîriya kurdî de, di hunermendiya kurdî de heke em vegerin bingehê, em ji qonaxa duyemîn an jî sêyemîn dest pê bikin, ji bo gelê me giran e. Heke tu bingehêkê şîrove nekî, bê ka bingeh çawa çêbûye. Tiyatro li ser felsefe û mîtolojiyê radiweste. Heke tu behsa mîtoloji û felsefeyê nekî, wê demê tu di qonaxa duyem an jî sêyem de behsa şanoyê dikî. Lê qonaxa yekem wek dîwar jê re lazim e. Ji ber wê min xwest ez him cihekî bidim kurdan, peyva Kurdistanê çawa derbas bûye, têkiliya sumerî û kurdan û bandora vê herêmê li ser yewnanan çawa çêbûye.

Di karakteriya mirovê kurd de her tim valatîyek heye. Mesela ez gundî me ez hatime kêşan bûme Marksîst, ez zerdeştî me ez hatime kêşan bûme misilman, ez di rewşa eşîrî de me hatime kêşan bûme medenî. Lê dema ku ez vedigerim karakterê xwe yê eslî ka ez ji kîjan qonaxê mame. Tu lê dinihêrî îsal komunîst e pînc salên din diçe hecê. Çinku di karakterê wî de valatîyek heye, wek dîwarekî ku bingeha wî tune be. Ji ber vê yekê min

xwest ez vegerim bingehê û ji xelkê re bibêjim. Heke tu li ser Gilgamêş neaxivî, li ser “Hezar û şevêkê” neaxivî, tu bi mîtolojiya sumerî nizanibî, tu nizanî kral Odispus çawa derketiye holê. Mînak niha ew marê wek nişana tenduristiyê, heta niha xelkê me digot qey yewnanî ye. Ev encamên tembeliya aqil in. Gava ku tu ji bo her tiştî bibêjî

Jînenîgariya Muhsîn Osman

Di sala 1963'an de li Duhokê hatiye dinê. Di sala 1980'yî de cara pêşîn beşdarî şanogeriya bizav a ku nivîskarê wê Bayîz Umer û derhênerê wê Azad Sadiq bû, bûye. Di sala 1982'yan de çîroka wî ya yekemîn “Name livînek e di viyanê de” di roj-nameya Hawkariyê de li Bexdayê belav bûye. Di navbera salên 1987 û 1991'ê de serokatiya koma şanoyê “Evro” li Duhokê kiriye. Di navbera salên 1985 û 1989'an de li Akademiya Hunerên Ciwan di beşa Şanoyê de li Zankoya Bexdayê xwendîye. Di navbera salên 1991 û 1994'an de endamtiya desteya kovara “Serhildan” û di navbera salên 1992 û 1994'an de jî ya kovara “Nûxwazî”yê kiriye. Di navbera salên 1992 û 1994'an de li Duhokê di Peymangeha Hunerên Ciwan de mamostetî kiriye. Di sala 1993'yan de bûye endamê Yêkîtiya Nivîskarên Kurdistanê taya Duhokê. Di 2006'an de bûye endamê Rêxistina Hunermendên Kurdistanê. Ji sala 1994'an û vir ve li Almaniyayê dijî. Ji sala 1997'an û vir ve li Berlînê rêverîya kovara “Havîbûn”ê dike. Di salên 2005, 2007 û 2009'an de li Amedê her carê sê hefteyan li atolyeya şanoyê ders dan. Bi kurdî, erebî û almanî dizane. Bi navê “Mezopotamya / Vekolîneke dîrokî di bajarvanî, kultur û dramayê de” û “Hizirkin di pîrsên rexneyê de” du pirtûkên wî li Başûr hatine çapkirin.

“Xwedê dizane” wê çaxê tu naxwazî tiştêkî bikî. Her tişt Xwedê dike û tu tiral î. Yewnanan her tişt afirandiye wê çaxê tu serê xwe naxî kar.

Serwet D.: Bibore li vir ez ê tiştêkî bipirsim. Niha te qala mar kir. Ew mar jî wek nîşana tenduristiyê tê bikaranîn. Li ser dermanxane û gelek cihan heye. Tu dibêji ew sembola Xwedawenda tenduristiyê ya Sumeran e. Heman mar li ser deriyê Laleşê jî heye. Ew mar heman mar e yan tiştêkî din e? Tu lêkolînên te hene li ser vê yekê?

Muhsîn O.: Ez bi taybetî li ser Laleşê nesekinîme. Di kultur û baweriyên demên berê de wisa dihat bawer kirin ku hemû raz û nihênî di erdê de ne. Baş e, dema ku di erdê de be tiştêkî din jî difikirî. Wisa be tiştê nêzî Xwedê di erdê de ne, bi taybetî jî çiya. Olîmpîa çiya ye, Mûsa pêxember diçe Çiyayê Sîna, Mihemed Pêxember diçe Şikefta Hîrayê. Çiya û siruşt di tégihîştina berê de tiştên pîroz in. Digotin Xwedê di siruştê de ye, raz û nihênî di siruştê de ne. Wisa be kî dizane? Li gor fikra wan laşê kê herî zêde nêzî erdê be ew bêtir bi razan dizane. Fikirîne fikirîne, kîjan giyanawer laşê wî nêzî erdê ye, gotine mar. Wextê ku mar zêde nêzî erdê be, wisa be mar tiştêkî pîroz e. Ku pîroz be dikare şîfayê jî bide.

Ez a Laleşê dikarim wiha şîrove bikim, di kulturên berê de mar, şêr û hinek teyr wek totem hatine pejirandin. Lê vêya hanê ez li gor aqilê xwe dibêjim ne ku min vekolaye. Ji hemû giyanaweran tenê mar biharan kirasê xwe diguherîne. Mar ew giyanawer e ku giyayê nemiriyê jî nav destên Gilgamêş direvîne, dixwe û nemir dibe. Li gor mîtolojiyê guhertina kiras jî ber vê yekê ye û mar nemir e, xwe nûjen dike.

Arîsto dibêje “Huner teqlîdkirina xwezayê ye.” Huner çavlêkirina siruştê dike, çinku siruşt bixwe fotografê duwemîn ê Xwedê ye. Bi wateyeke îndîrek huner teqlîda Xwedê dike.

Serwet D.: Ji bo ku em kok û bingehe n xwe nas bikin pêwîst e ku em li dîroka Mezopotamyayê binihêrin. Lê gelo derfet hene ku em wek kurd bi wê dîrokê xwe binasin. Beriya ku pergala dewletê li sumer û akadê ava bibe, li Kurdistana îroyîn ber û berê çiyayan pergala gundîtiyê ya jiyana neolîtîkê hebû. Çavkaniyên ku em bikaribin wê demê, wê pêvajoyê, wê hişmendiye fêm bikin di destên me de hene gelo?

Muhsîn O.: Çavkanî ji keleporê zêdetir mijarên dîrokî ne, mijarên arkeolojîk in. Yên ku bixwazin dikarin gelek tiştan peyda bikin. Wekî paşxane min xwest ku ez li welatê xwe vegerim lê bi taybetî li ser pergala gundîtiyê nesekinîm. Ka li Kurdistanê gund çawa bûn, çi taybetiyên wan hebûn? Ji aliyê çandinî, huner û wekî din ve çawa

difikirîn ez zêde li ser wan nesekinîm. Ên ku pispor bin dikarin gelek belgeyan peyda bikin.

Serwet D.: Wek kurd em ê Gilgamêş jî xwe re bikin bingehe an Herdemciwanê? Nizanim tu bi Herdemciwanê dizanî, ew jî li pey nemiriyê ye. Lêgerîna nemiriyê di vî navî bixwe de jî heye.

Muhsîn O.: Bi rastî min çîroka Herdemciwanê nebihîstiye. Lê em vegerin ser Gilgamêş, ser Çîrokên Hezar û Şevêkê. Kurd, ereb, faris gelên kevnare yên vê herêmê ne. Em nabêjin sumerî kurd in, babîlî kurd in an jî aşûrî kurd in. Em ji aliyekî din ve lê binihêrin. Gelo gava ku yek dimire yên li dû dimînin nabin mîratgirên wî? Wê gavê mîratgirên wan gelên kevnare kî ne? Ku ereb bin, faris bin bi heman awayî kurd jî mîratgirên wan in. Em li vê deverê dijîn. Wisa be em jî mîratgirên sumerî û babîliyan in, ereb û faris jî. Yan na afrikî yan jî rûs ne mîratgirên vê herêmê ne. Ji ber vê yekê divê em xwe mîratgir û xwedanê vê dîrokê bizanibin. Îro em dikarin bibêjin wek rojhilat, mîtolojiya me jî heye. Me jî şanoya sumerî heye, me jî filan tişt heye. Ji bo me nêzikîtir e ji şanoya deverên rojava. Ew jî yewnanan zêdetir nêzikî me ne. Di şûna ku em her tiştî bi yewnanan ve girêbidin divê em belgeyan bibînin û bi awayekî zanistî jî xwe re bikin paşxane.

Serwet D.: Ewropaya îroyîn ji aliyê hişmendiye ve li ser bingeha yewnan û romaya kevnare rûdinê û dîroka mirovahiyê jî ji wê derê didin destpêkirin. A niha ramana greko-romen serdest e. Lê em dizanin ku ew ne rast e. Beriya wan bi hezar salan li Mezopotamyayê ew tişt derketine holê. Li vir pîrsa girîng ev e; ev serdestiya ramana greko-romen wê çawa bê şikênanandin?

Muhsîn O.: Zerdeştê kal di wexta xwe de digot “Kîjan mirov baş e?” û dibersivand “Hîzra baş, gotina baş, kiryareke baş.” Ev taybetiyên mirovên baş in. Ev riyeke xwenasîne ye. Sokrat li ser perestgeha Delfiyê nivîsîbû “Xwe binase.” Gava ku gelek xwe nas neke tiştên amade ji xwe re bi kar tîne. Divê kurd li arşîv û muzexaneyên cîhanê bigerin ka çi tişt xizmeta dîroka me ya kevnare dikin. An jî îşareteke zanistî dide me ku gelê me bi şeweyekî diyarde rola xwe bibîne. Tişt bi diyardeyan dibin. Tu rûpelekê li ser şanoyê binivîsî tiştêk e, tu dosyeyekê binivîsî tiştêkî din e. Û tu hejmareke taybet amade bikî tiştêkî din e. Ew karê ku min kiriye ne karê kesekî ye, karê saziyekê ye. Ku sazî hebin wê kultur û kelepora kurdî vekolin, ji aliyê muzîkê ve, ji aliyê resim, peyker, ji aliyê şanoyê ve. Lê ev karên ku min kirine wek gaveke destpêkê ne. Ev kar wek dîlanê ye, bi kesekî dîlan

nayê girtin. Dîlan karê komê ye. Her yek karekî dike, ev jî bi xwe re diyalogê tîne û diyalog jî bi xwe re pejirandina hevdu jî çêdike. Bingeha demokrasiyê çêdike.

Di sala 2008'an de nivîskarekî Awustîrî (Ostereich) **Raoul Schrott** pirtûkeke bi navê "**Schrott (Homers Heimat. Der Kampf um Troia und seine realen Hintergründe) München 2008. ISBN 978-3-446-23023-1 – Welatê Homer. Xebata Troya û rastiya paşxanan**" nivîsî. Dibêje "Welatê Homer bajarê Edeneyê yê li başûrê Çiyayê Torosê" ye. Dibêje "Min 1400 belge hene, eger 400 rast nebin jî, 1000 belge rast in." Her weha nexşe û resim di vî warî de hene. Belgeyên bi dehan tiştên wisa hene. Pêdivî bi sazî û dezgehên ku van karan bikin hene. Ku ev kar bînin kirin wek pirtûk an jî di televîzyonan de bînin weşandin dê ronesansek pêk bê. Wê gavê wê gelek tişt zelal bibin, mînak wê bê dîtîna ku peyva "kanûn" ne erebî ye, babîlî ye û em jî mîratgirên babîliyan bin, em ê çima wê peyvê bi kar neynin? Dîsa "edeb" peyveke babîlî ye, lê em dibêjin bi erebî ye. Ji bo me xwenasîn pêwîst e, ku em xwe nas bikin dê ronesans jî pêk bê.

Serwet D.: Em dikarin wek bingeha şanoya kurdî çi bipejirînin? Mînak li bakur hinek tiştên gelêrî hene. Nizanim tu jê haydar î yan na. Kosegelî, kalikê sersalê, bûka baranê û çend tiştên bi vî awayî hene. Mirov dikare vana wek şanoya kurdî ya seretayî bipejirîne yan na?

Muhsîn O.: Divê em şanoya gelêrî û ya profesyonel jî hev cuda bikin. Sheaksperare dibêje "Jiyan dik e û hemû mirov tê de listikvan in" Çi karên ku tên kirin cureyekî şanoyê ne. Pêdiviya van karan bi meji hebû. Meji jî mîtoloji ye. Baran nayê, em tiştêkî dikin ku baran bê. Tirs çêdibe, qurbanek tê dayîn ji bo ku tirs çênebe. Ew tiştên ku wan deman bi wî rengî pêk dihatin em îro wek huner bi nav dikin. Bûka baranê, tiştên li govend û taziyezan, li sersal û tiştên neteweyî û olî dikirin, ev hemû cureyên şanoya gelêrî ne. Nehatine nivîsandin, bi awayekî devkî heta îro hatine. Ew



hêdî hêdî dimirin. Gava ku dimirin em bê bingeh dimînin. Pêwîst e ev tişt bînin nivîsandin. Min di pirtûka xwe ya bi navê "**Hizirkirin di pirsên şanoyê de, vekolînên raveyî di teoriya şanoyê de**" qala bandora van tiştan a li ser şanoya îtalî ya "**Commedia dell'arte**" kiriye. Min behs kiriye ka çawa Karagoz ji Çînê hatiye di ser Mezopotamyayê re derbasî Misirê bûye û Siltan Selimê yekemîn ew aniye Stenbolê û jî wir jî derbasî Ewropayê bûye. Bingeha şanoya me jî kar û çalakîyên jiyana rojane ne. Ew tiştên ku di jiyandê de pêk tên cureyekî hunerê ne.

A niha belge di destên me de tune ne ku em bibêjin filan tiştî filan salê li filan derê dest pê kiriye. Ku em qala şanoya kurdî ya profesyonel bikin, ew jî dibe du beş. Şanoya kurdî û şanoya bi kurdî. Şanoya bi zimanê kurdî cara pêşîn di sala 1905'an de li bajarê Hewlêrê hatiye listin. A bi kurdî hatiye nivîsîn jî ya Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî ya bi navê Memê Alan e(2). Li gor belgeyan dîroka şanoya bi kurdî ji dîroka şanoya kurdî kevntir e. Ev belge jî bi piranî yê Başûr in. Dibe ku li Rojhilat, belgeyên hîn kevntir jî hebin.

Serwet D.: Me qala şanoya gelêrî kir. Ji wî aliyê ve bingehên şanoya kurdî gelekî kevn in. Ji aliyê şanoya nivîskî ve jî wek ku te got sed sal beriya niha ye. Lê li vir ev pirs tê hişê mirovan. Li ser axa Kurdistanê her tim mîrgehên kurdan hebûn. Hinek jê bi qasî 1000 salan jiyane. Gelo di dîwanên beg û mîran de şano yan jî tiştên wek şanoyê qet tune bûne?

Muhsîn O.: Me got jiyan bi xwe şano ye. Di şevên dirêj de mirovan êş û şadiyên xwe vegotine. Pêdivî bi xweifadekirinê hebûye. Ev jî yan bi riya muzîkê, çîrokê yan jî bi riya tevgerê pêk hatiye. Ev tevger jî şano tê hesibandin. Mijara wan dibe ku olî be, dibe ku neteweyî be û dibe ku mîtolojîk be. Ev tişt li ba hemû gelan hebûne û li tevahiya koşk û

serayên mîr û begên kurdan jî hebûne. Lê divê mirov li gorî belgeyan biaxive yan na tiştên ku mirov bibêjin texmîn in. Ji ber wê yekê divê saziyek hebe li pişt mirov be û alîkariya mirov bike. Mînak mirov mehekê biçe Rojhilat, mehekê biçe Başûrê Biçûk, du mehan bê Amedê. Dîroka şanoya kurdan pir pir kevntir e ji wan belgeyên di destên me de. Belgeyên di destên me de jî di jêrdesta desthilatdaran re derbas bûne. Em mînakekê bidin. Di sala 2004'an de filîmê Selehedînê Eyûbî, ku zarvekerê ereb, Mesûd Gesan rola Selehedîn didît, hat çêkirin. Nizanim Recep Tayip Erdogan e yan jî Evdîla Gul e, yek ji wan diçe Amerîkayê. Diçe studyoya ku filîm lê çêdikin, pereyan dide wan dibêje "Gerek hûn nebêjin Selehedînê Eyûbî kurd e." Ev di 2004'an de wiha dibe. Îcar em bifikirin ku ev 2000 sal in heman tişt tînin kirin û çanda me tê bişaftin. Divê em li muzexane û pirtûkxaneyên cihanê bigerin, belgeyên xwe berhev bikin.

Serwet D.: Di pirtûka te de jî heye û di nivîsên din de jî tê gotin ku peyva "tiyatro" cara pêşîn ji aliyê Mehwiye helbestvan ve hatiye bikaranîn û peyva "şano" jî ji aliyê Evdîla Goran ve di dîwana "Firmêsk û huner"ê de hatiye bikaranîn. Gelo kurdan beriya vana navek li van tiştan kiriye yan na?

Muhsîn O.: Mesela, Cizîrî qala "xeyala zirx" kiriye. Di Mem û Zînê de jî qala "xeyala zirx" tê kirin. Lê dibe ku wê demê navekî din jî lê hatibe danîn. Lê ew tiştên ku di helbestên yên berê de derbas dibin, tînin çî wateyê em îro nizanin. Temsîl, tiyatro û şano ji ber ku berdewam in, em dizanin. Lê dibe ku Cizîrî di helbesta xwe de navek bi kar anîbe ku em îro nizanin ji bo wî tiştî ye. Ji ber kêmbûna belgeyan û tembeliya aqilê me, em baş venakolin.

Serwet D.: Bi vîya ve girêdayî tiştêkî din bipirsim. Li gor agahiyên di pirtûka te de û çavkaniyên din de jî ev pêncî sal in peyva "şano" derbasî kurdî bûye û bi eslê xwe îtalî ye. Lê em lê dinihêrin ev peyv zêde belav bûye. Dîrokeke pir nêz e, di 50 salan de çawa ew qasî belav bû. Dibe ku ev dîrok kevntir be û beriya Evdîla Goran jî hinekan bi kar anîbe.

Muhsîn O.: Di van 50, 60 salên dawîn de Teverga Azadîxwaz a Gelê Kurd pir bi pêş ve çû. Tiştên bi vî awayî jî bi riya teverga azadîxwaz a gelê kurd belav bûn. Ango ev tişt bi riya siyasî belav bûne. Ne ku saziyeke hunerî ya tîkildarî çar parçeyan hebûye. Lê ya siyasî hebûye. Şano û peyvên wiha bi vî rîyê belav bûne.

Serwet D.: Rewşa şanoya kurdî ya îroyîn çawa ye? Di warê cil û berg, dekor, muzîk, listikvanî û hwd.

Muhsîn O.: Gava ku ez behsa şanoyê dikim, ez bêtir behsa şanoya Başûr dikim. Çînkû agahiyên min ê der barê Bakur de hindik in. Li başûr heta sala 1991'ê şano fotografekî din e siyasî bû. Pêşmerge bi çekê li ber xwe dida, şanogeran jî bi listikên xwe. Lê naverok heman tişt bûn. Naveroke wê siyasî bû lê forma wê cuda bû. Lê piştî Serhildana 1991'ê ew xewnên ku gelê kurd an jî şanogerên kurd bi teverga siyasî ve girêdabûn, şikestin. Ango ew peyker û rismên di hişê xelqê de şikestin. Lewre li Başûr şoreş pêk nehat tenê teverger pêk hat, mirov nehatin afirandin. Mirov tenê bi awayekî dilînî girêdayî tevergerê bûn. Di nav tevergerê de bîdadi çêbû. Çawa ku ji bo dema navbera hilweşîna Romayê -476- û heta ketina Konstantînyeyê -1453- de dibêjin serdema tarî, li Başûr jî heman tişt pêk hat. Li Başûr di warê fikr û ramanê de em di serdema tarî de dijîn. Berê li Başûr me dizanibû ku em çî dikin, lê niha ne diyar e kî dost e, kî dijmin e. Mirov ji bo kê dike û li dijî kê dike? Ev, tevlihev bûne û hinek bêhevîti di nav hunermendên kurd ên Başûrî de peyda bûye. Niha li Başûr gelek kes hene ku doktora li ser şanoyê wergirtine. Lê her tişt girêdayî armançê ye. Niha hûn vî kovarê li gor armançê derdixin, ku armanca we tune be hûn nikarin derxin û bîdomînin. Li Başûr armanç ne diyar e. Berê reş û spî hebû, dijmin reş bû û teverger spî bû. Dijmin çû teverger hat. Gelo teverger dîsa jî spî ye? Hunermendên me di navbera reş û spî de bê armanç mane. Vê jî kiriye ku li Başûr teverga şanoyê sist bibe. Ji aliyê teorîk ve gelek tişt hene. Gelek saziyên şanoyê hene, lê her tişt bi bîr û baweriyê dibe. Kereste heye, pere heye, salon heye, listikvan heye, tekst heye, derhêner heye, her teknoloji li ber dest e lê bawerî tune. Cureyekî reşbîniyê di şanoya me de peyda bû. Em dikarin ji aliyekî din ve jî binirxînin. Nîfşên piştî serhildanê ji nû ve dest bi şanoyê dikin. Ev nîfş jî sifirê dest pê dikin, ne ji aliyê formê ve, ji aliyê naverokê ve. Dibe ku bi riya van şanogerên nû şanoyeke nû li Başûr bilind bibe.

Serwet D.: Hinek kes dibêjin ku şano ne xwediyê giraniya berê ye. Tu jî ligel vî fikrê yî yan na? Sînema û televizyon jî derketin. Vana bandoreke çawa li şanoyê dikin?

Muhsîn O.: Armanca hunerê ji destpêkê heta niha heman armanç e. Lê formên derbirinê diguherin. Şano her tim jî bo tenakirin û rihetkirina serê mirov, hatiye kirin. Di dema sumerî û yewnanan de jî armanca wê ev bû û niha jî ev e. Îro dema em li Amedê şanoyê dikin, armanca me azadkirin angû rihetkirina gelê me ye. Rast e, bi teknolojiyê re alternatîfên şanoyê dertên holê. Lê ji aliyê din ve jî

teknoloji şanoyê xurt dike. Em dikarin bi riya internetê jî şanoyê pêşkêş bikin. Tu dikarî bi sedan pirtûk û çavkaniyên din bi riya internetê peyda bikî. Kitêbxaneyê dinyayê li ber destê te ye. Berê derfetên reklamê tune bûn, lê îro tu dikarî bi hezar rîyan reklamê belav bikî. Tu dikarî bi alîkariya teknolojiyê dikê li gora dilê xwe biguherîni û bi kar bîni. Tu dikarî vîdyoyê di nav listika xwe de bi kar bîni. Ji bo çî dibêjin şano bavê hunerê ye? Ji ber ku hemû cureyên hunerê digire nav xwe û sîudê jî wan werdigire. Kîjan cureyê huner û edebê bi pêş bikeve, bi awayekî erênî bandorê li şanoyê dike. Dibe ku hinek listikên berê nemabin lê îro şanoyê her tişt girtiye nava xwe. Ji ber vê yekê teknoloji nikare bandoreke neyînî li şanoyê bike.

Serwet D.: Tu têkiliya di navbera ziman û şanoyê çawa dinirxîni? Ji bo ku ziman bi awayekî xweş û baş bê bikaranîn, şano dikare roleke çawa bilîze?

Muhsîn O.: Her kesê/a listikvan divê di her qada jiyane de serkeftî be. Divê bi hevoksaziyê baş bizanibe. Bizanibe deng dê li ku bilind bibe û nizm bibe. Deng çawa bê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî şano elementeke dewlemend e ji bo çekirina ziman. Ji ber vê yekê Heidegger dibêje “Ziman mala hebûnê ye.” Ji bo me jî ziman mala hebûnê ye û şano ji me re vê malê çêdike. Li bakur jî tiştêkî ku zimanê kurdî li ser piya hiştiye, şano bûye. Min gelek şanoger dîtin ku listikên xwe bi kurdî dilistin, temaşevanên ku bi kurdî nizanibûn dihatin bi riya van listikan hînî kurdî bûn. Şano zanista hevoksaziya ziman e.

Serwet D.: Di şanoya bakur de komedî piçekî li pêş e. Gelo bi ya te sedemên vê yekê çî ne?

Muhsîn O.: Di melodiya strana kurdî de çar tişt serdest in. “Qederê, felekê, şewitî û ay dil” Ev trajediya gelê kurd nîşan dide. Rîtmî trajediya jiyane ji dika şanoyê mezintir be, şano nikare trajediyeke ji trajediya jiyane mezintir nîşan bide. Xelqê me trajediyên bi her awayî jiyaye, bi keda xwe, bi xwîna xwe. Aqilê gel êdî trajediya li ser trajediyê qebûl nake. Pêwîstiya wî bi nefesekê heye. Mînak Sofokles, Moliere li Fransayê çawa derket holê? Şanoya

Dell'arte di sedsala 16'an de li Îtalyayê çawa derket holê? Ew encamên ku bi hezar salan gel di jêrdestiya feodalîzmê û ola mesîhî de mane, ne. Bi hezar salan di bin zilmê de dijiyan. Ji ber vê zilmê pêdiviya gel êdî bi ken çêdibû. Ji ber ku rewşa me her tim trajedî bûye ku tu li ser dika şanoyê trajediyê bilîzî jî dê bala gel nekişîni. Şano rengdana jiyane ye. Şano ji erdê derdikeve, ji ezmanan nayê. Hemû fikir ji erdê derdikevin, erdê me erdê trajediyê ye. Dîroka me dîrokeke fetisî ye. Ji ber van yekan gel dixwaze piçekî bikene û ev pêwîst e jî. Û ev diyardeyeke tenduristiye

ye. Gava ku em li dîrokê dinihêrin jî piştî trajedyayê komedî dertê pêş. Rewşeke wisa dertê holê ku bi gotinên ji rêzê jî dikenin. Ji ber ku tijî bûye dixwaze biteqe. Ev li tevahiya cîhanê wiha ye.

Serwet D.: Gotina te ya dawîn...

Muhsîn O.: Di tevgera jiyane de du alî hene. Teorî û pratîk. Heke ku di şanoyê de aliyê pratîk û listikvanî hebe û rexne tune be, dê terazî li aliyekî xwar bibe û ev jî dîrokeke tendurist a şanoyê çênake. Pêwîst e ku kovareke weke kovara Wyê rolekê bilîze da ku nîfşekî rexnegir derkeve holê. Ji bo ku em palpiştiya xelqê bikin. Ku di navbera pratîk û teoriyê de hevsengî pêk neyê dê şanoya me leng bimîne. Ez dikarim alîkariya we bikim, ku hûn hejmareke taybet ji Kovara xwe li ser şanoyê derbixin, heke hûn amade bin.

Serwet D.: Spas

Muhsîn O.: Spasxweş

1. Şanoya sîtavkê rehên xwe ji hevîvendê û olê werdigire. Tekstên vî cureyî diçin sedsala duwemîn a zayînî li Çînê. Bingeha xwe ji efsaneyên sedsala duwemîn ên b.z ên Çînê werdigirin, bi taybetî serdema Song. Ev cureyê şanoyê naveroka xwe ji titalên ola bûda û efsaneyên taoîzmê werdigirin, lê belê mixabîn kevntirîn teksta li ber dest a şanoya sîtavkê digihîje sedsala 13'mîn a p.z. li Misirê. Ango mirov dikare bibêje destpêka zarvekerina xeyala sîtavkê digel moxolan ji Çînê hatiye Îraqê. Paşê ev cureyê hunerê li ser destê Îbnî Daniyalê Mûsilî diyar bû û navborî çû Qahîreyê û paşê ev huner di serdema Sultan Selîmê yekemîn de di sala 1517'an de veguhastin Stenbolê û paşê ber bi Ewropayê ve çû. Dîsan hindek boçûnên din hene dibêjin ku “Şeweyê şanoya xelqê û bazinî digihîje şanoya rojavayê Asyayê li ser şeweyê hekwaî li Kilîkya û Îrxîla dihat kirin.

2. Mixabîn bi vê dewlemendî û kelekebûna binemayên drama û şanoyê li nik me bo mêvan (wergerandin, amadekirin û nivîsina wê), diyar e ku şanoya derdorê (ereb, tirk û faris) jî ewqas kevn nîn in. Şanoya bi erebî, Lubnan, Marûn Alnûqas şanogeriya pîskê di 1848 û Îraq, Neûm Fetihlîla şanogeriya latîn û Xuşaba 1880 li Mûsilê pêşkêş kiriye. Her wesa li Îraqê Hena Hebeş şanogeriya Elşîmas 1880'an pêşkêş kiriye. Şanoya tirkî piraniya dî-roknasên şanoya tirkî di sala 1840'î berê xwe li şanoya tirkî didin. Bi vê çendê ciyê şanoya tirkî nêzîkî 150 salan e, (Binihêre li Dr. Şakir Alhac Mixalîf, jêdera berê.)

Her wesa Îbrahîm Şînasî şanogeriya govenda helbestvanî di sala 1859'an de pêşkêş kiriye û (Yariya li nivî - Ortaoyûnû ya ku di sala 1790'î jî berhemeke Karagoz hatiye listin). Şanoya kurdî, Abdûrehîm Rehmîyê Hekarî listika bi navê Memê Alan di sala 1919'an de bi kurdî nivîsî. Mixabîn bi vê re destpêka şanoya kurdî naçe berî sedsala bîstan. Hewlêr, şanogeriya Neûm Fethîla Emîrî di sala 1905'an, li Silêmaniyê listika Împarator di sala 1922'yan de, li Mehabadê listika Daykî nîştîman di 1945'an de hatiye listin. Bi vî rengî dîroka şanoya kurdî wek ên derdoren wan lawaz û qels berbiçav dibe.

Kawa NEMIR

Baran hebû qeyd û zincîr jî

Ew pisîka mirî bi darê ve darda kiribûn,
 Ew a reş, bi dara hêjîrê ve. Yekî defa
 hewarê digerland. Awir li teqezbûna
 tiştêkî digeriyan, a bûyerekê, hêviyekê, hêwirzeyekê,
 guherîneke çûçkanok qe nebe. Yên ku li ber
 tayê tolikê bireqisin mişe ne. Lemelema
 bêna ya rûbarê dûr ev yek kelimand.
 Belam baran hat, ew xortê por û rî
 gîjîk jî daxistin ji çiyê. Şingêşingêke
 diltezîn î şil, ku deng vedida li nava
 nefelan, li girdava dargerînkên bi dîwaran ve.
 Deng ji her kesî biliyabû. Cara din, bêdengiya
 wan jî bi daran ve darda kirin.

Me wiha peyda kir tunebûna te, lê lê Kurdistanê!

15 Rezber 2007 - Ferîkoy / Stenbol

Tê heye ku gurtir jî bibe deng

Xelk xeletiyên xitim dike. – Me kîngê
 perestgeha xwe ya çiyê ji dest da? – Kardox
 disimsimin di kuçe û kolanan de, ew qazên
 beyanî, birayên nêçîrvan, birîna birayên wan,
 li serên kêrên wan ên ko.

Xelk xeletiyên xitim dike. Qad û gorepan
 kulîlkên çîlmisî ne. Huş bin borîzanên
 devbelaş, nabişkivin hûn. Ên mayîn, xelko!
 Lempeya tariyê vêxin. Helbestkar dikelime.
 Ji xeletiya we çêbûye ew.

15 Rezber 2007
 Ferîkoy / Stenbol



Inka bach li Berlîna Rojhilat mezin bû, di sala 1972'yan de, digel malbata xwe ji Elmanyaya Rojhilat reviya û li Berlîna Rojava bi cih bû. Di sala 1974'an de, abîtura xwe bi dawî anî û di sala 1975'an de li Zanîngeha Azda ya Berlînê dest bi xwendina germanîstîk û felsefeyê kir. Doktoraya xwe di sala 1987'an de li ser "helbestvanî di Psalmman de" (ayetên pirtûka pîroz a kevn) da. Inka Bach, wek derhêner û nivîsera senaryoyê kar kir. Niha ji li Berlînê bi 2 zarokên xwe re dijî.

Inka Bach, helbest, kurteçîrok û senaryoyan dinivîse. Endama Koma Nivîskarên Elman û endama Yekîtiya Nivîserên Elman e.

Di sala 1989'an de, bo salekê ji hêla Senata Ber-

lînê de, bo salekê zemale li Newyorkê wergirt û gelek carên din ji zemaleya Weqfa Bazirganên Deryayê yên Preûs wergirt. Di sala 1989'an de Inka Bachman bû nivîsera bajêr a Rheinsbergê û di sala 2002'yan li Erfurtê bû karmend li nivîsgeha bajarî ya nivîsînê.

Nivîsên Inka Bach:

Helbestên Psalm ên elmanî ji sedsala 16'emîn ta sedsala 20'emîn, Berlîn 1989 (Digel Helmut Galle; Diss. FU Berlin 1987/1988)*

Hesel, Berlin 1992 (Digel Karl Schäfer)

Em ên biyanî nas nakin, Berlin 2000

Gopalê Bac, Erfurt 2003

Bextê marie, Berlin 2004

Çend helbest ên Inka Bach

Şêrgeh

*Dilovan, mezin
Li ser şêrgehî
Nivîsîbû
Qelem, himbiz
Gumgum û ronabî
Tu bêjayî wê bûyî,
şemaleke dûz
Tilî li ser jidilbûnê
Dilovan, çixêzê kirin
Tiştê tu jê şerm dikî, bike!*

Govenda rojê

*Tîrojê li ser eniyê
hildipeke
Xwe dirêj dike
Xwe xaç dike
Dibe vebirsîn
Li ser eniya stêran
Eniya telaşan
Vebirsîneke şikestî
Roj dikene
Û paş stûyê xwe bişikîne..*

Zeytûn

*Te ez dîtibûm,
çawa ber bi rojê ve diçim

te ez dîtibûm,
çawa li bin dara zeytûnê rawesti-
yame
ji sîberê
te pirsîyar kiribû
tu rojê dinasî
Zeytûn û Sîberê?*

Çend gav di parkê de

*Li parkê, me gav dibêjmartin
Kelemên sorretarî, gul bi rêz in
Belge bi qîrîna te ya ker re ketin
Min bi xwe jî hîlbijartin*

*Lê tînazvanên te jî li nav hev ketin
Ez gubdariya wî û sewdaya wî dikim
Rêyekê hîlbijêre, an jî awazekê
Ya darên westiyayî bû?
Çawa min xwe şaş kiribû?*

*Di binavê te de. Digel te, park badanok e
Milê te bindekê dibingîve milê min
Bi te re digirim, çend kevir
Bi tenê texmînek e, ka em li ku ne.*

Em in

*Destên firok, balindeyên biçûk
Her dem stranbêjî
Xetîreyek û fîtîlek
Wekhev vedimirin
Dijminê ronabîyê li dora roniyê*

*Her çînek, demeke bişkbûyî ye
Têleke benastenik e
Şaşîtiyên me yên kenok
Ji bo careke din rabe
her dem bibêz.*

Rêya pêk ve

*Pêpelûk
Mirdiyax
Armanc
Berjor
Gav
Berjêr
Lixwezivirîna bêdî
Zivirandin
Awir
Peyvek
Rêyek
Berjor û berjêr
Eynî rê ye*

Psalm= Mizmar ayetên Încîla kevn

**Avjen LÎS**

beriya ku helbestvan, dinyayê
ava bike bi ser de pir giriya

sê mirin pekiyan
ji nava destan
bê par ma Xweda
li singekî gewr çikiya

firiya destekî bizdonek

li çolekê xela ye
gewî bûne leylan

har bûne xwêdan
mêjiyê ku dibe derman
bang kirin li teyran
beriya dîtina êgir
dûxan da ewran
bi tifeke kevnar

firiya qewmekî wêrek

beriya ku dinyê, helbestvên
biafiranda bi ser de pir kenîya

Teoriya aboriya nûjen



Rênas JIYAN

Her çend neoklasîkan jî weke klasîkan bazirganiya derve destek kiribe jî di mijarên pereyî/diravî de jî klasîkan cuda fikirîne û wan gellekî girîngî daye pereyan. Ji ber ku rêjeya pereyan direkt bandora xwe li ser “buha”yan heye û her weha ji buhayê metayan jî bi wîrdetir pere bandora xwe li ser selefê (fayiz) jî heye. Dirav (pere) sedem in ku buha (fiyet) û selef (fayiz) bileqin û ekonomî jî eyar bikeve.

Marxî jî bo çareserkirina van derdan bi praksî-seke şoreşger û bi teoriyeke diyalektîk aboriyeke sosyalist pêşnûma dikir. Heta ku “şêwaza hilberînê” neguheriyaya û “têkiliyên hilberînê” jî nû ve nehatina sazîkirin ne gengaz bû ku rê li ber mêtîngerî û kedxwariyê bihata girtin. Marxî tavilê rakirina milkiyeta taybet pêşniyar dikir, ji ber ku tiştê “hêzên hilberînê” ava dikir milkiyeta taybet bû û diviya bû ku ev hêz tavilê ji destê takekesan derketa û biketa destê civakê, angî biketa destê dewletê. Bi veguherîna hêzên hilberînê kar, fayiz û ranta ku dibûn sedema kedxwariyê bi vî awayî wê jî holê rabûna û wê civak bigihîşt a wekhevîyekê.

Marx heta qonaxekê (heta komunîzmê) patroniya ekonomiyê dixê destê civakê (dewletê) û serdestiyê jî kapîtalîstan distîne û dixê destê bindestan (dixê destê proleterayê). Marx, klasîk û neoklasîkan weke berdevkên kapîtalîstan (dewlemendan) û xwe jî weke berdevkê xizanan dihesibîne.

Marx jî “teoriya ked û nirxî” derdiket rê û digihîşt “teoriya nirxê zêde.” Di Smithî de “sermiyan” bi “hilanîn”ê pêk dihat, lê di Marxî de bi “nirxê zêde”, angî bi keda karkerên ku keda wan li wan nedihat vegeandin, sermiyan pêk dihat. Kêmbûna heqdestê ku di Ricardoyî de jî ber zêdebûna gelheyê û tengbûna zeviyan pêk dihat di Marxî de dibe talana kedxwariyê, angî jî ber ku ked tê talankirin heqdest kêmkirî dibe. Di Marxî de çîna kedkar û çîna kedxwar di temama qonaxên dirokê de şerr dikin.

Kapîtalîst jî ber pozberiya (reqabet) navbera xwe û jî bo pîrîrkirina kara xwe heqdestan kêmkirî û hilberînê pîrîr dikin. Lê jî ber ku di heman

demê de mîşteriyê wê hilberînê kedkar in û heqdestê di destê wan de pîrîr hindik e û têrê nake ku wan berhema bikirrin, hilberîna heya di şûna xwe de dimîne û krîz derdikeve. 1 Mêtîngerî, kedxwarî, çavbirçîtî û pozberî dawîya kapîtalîzmê tînin.

Di ekonomiya sosyalist û her weha di Marxî de ekonomî aîdî dewletê ye û dewlet jî serî heya binî dikare dest werde ekonomiyê û plansaziya wê pêk bîne. Lê di qonaxa duyem angî di qonaxa komunîzmê de jî ber ku dewlet jî holê radike pê re destwerdana dewletê jî jî holê radike. Piştî qonaxekê di Marxî bi xwe de jî “destwerdan” a ekonomiyê jî holê radike.

Bingeha ekonomiya ku di klasîkan de “fizîk”, di neoklasîkan de “psîkolojî” bû, gava ku dihat li Marxî disekînî dibû “polîtîka.”

Piştî demekê hate fehmîkirin ku “balans” a ku klasîkan bi serî sond dixwar êdî hew dikare fonksiyonên xwe yê ekonomîk hilgire û peywirên xwe pêk bîne. Şerr derdiket, neteweperweran (nasyonalîst) jî aliyekî ve, humanîstan (mirovperwer) û sosyalîstan jî aliyekî ve êrîş dibirin ser ekonomiya klasîk; jî ber ku ekonomiya lîberal a ku xwedêgiravî “gerdûnî” bû bersiv nedida hin ekonomiyên herêmî; kedxwarî pîrîr dibû û mirov dieciqîn. Tu wateya “teoriya heqdestî” û “teoriya Ricardoyî ya rantê” nemabû, “pêşbînî”yên wan çewt derketibûn, jî ber ku ligel ku heqdest kêmkirî dibûn jî gelhe pîrîr dibû, lê belê “pêşbînî”yên wan tam dijberî vê yekê hatibûn pênasîkirin. Rêbaza zanyariya fizîkê ya ku ekonomiya klasîk li ser ava bûbû hem pîrîr razber hem jî jî pratîkê dûr bû. Teoriya ku li ser rasyonallîzmê ava bûbû di jiyanê de encamên erênî derne-dixistin holê. Ji ber van sedemên neyînî, hinekî jî di bin bandora ekonomiya Marksîst de ewil li Îngiltereyê û bi dûre li Almanyayê du êkolên ekonomiyê yê dirokas peyda bûn. Ekola Îngiltereyê di dirokê de pratîk girîng dihesiband û teorî bi awayekî neyînî rexne dikir; li hemberî teorîparêziya klasî-


kan derdiket û ev rêbaz (metod) çewt dihesiband. Ekonomî li gorî pêvajoyên dîrokî divê bihata şîrovekirin an na bi teoriyeke hişk ji ekonomiyê tu tişt nikaribû bihata fehmkirin. Di her qonaxa dîrokê de rengê ekonomiyê tiştêkî din bû, heger mirovî ev qonaxên dîrokî nehesibandina ne gengaz bû ku bi awayekî tendurist analîzeke baş bihata kirin. Ekola Almanyayê bi awayekî tundtir li hemberî teoriya klasîkan derdiket. Di şexsiyeta endamê vê ekolê Schmollerî de ne bi tenê teoriya klasîkan bi giştî “teorî” weke têgeh dihat redkirin û pratîkên dîrokî dihatin bilindkirin. “Çavdêrî”yên ji çavkaniya tecrubeyan û daneyên dîrokî ji bo aboriyê di ser her tiştî re dihatin hesibandin.

* * *

Di bin bandora ekolên ekonomiyê yên dîrokî de (Marksîzm jî daxilî van ekolan e) li wî aliyê Atlantîkê, li Amerîkayê, ji aliyê ekonomîstekî “balkêş” û “awarte” ve bi navê “Ekonomiya Sazîparêz” feraseteke ekonomiyê ya nû hemû “balans”ên ekonomiyê serobin dike. Ev ekonomiyê serobin dike. Ev ekonomiyê (bi jiyana xwe jî) balkêş û awarte, Veblen e. Veblen bi perspektîfeke holîstîk (tevahî), ji parçe û pirtikan bi wêdetir tevahiya binyada aboriyê şîrove dike. Ev ekonomî “sazîparêz” e ji ber ku di vê feraseta ekonomiyê de hemû “sazî”yên heyî ol, sinc, zanyarî, dadgerî, bîrdozî, kevneşopî giş beşdarî qada ekonomiyê dibin; ji ber ku çalakiya ekonomîk tiştêkî weha kompleks bû ku heger ji hemû saziyên heyî bêrî bihata lêkolînkirin ne gengaz bû ku encameke saxlem jê bihata bidestxistin. Li ser ekonomiyê bandor û rola saziyan pirr bû, “homo economicus” (mîrovê aboriyê) li gorî saziyên heyî difesilî.

Ekonomiyê hemû tevgerên mîrovî û “sazî”yên heyî di xwe de dihundirandin; ji ber wê, hemû sazî û tevgerên mîrovî divê bihatina nirxandin. Madem çand û saziyan takekes ava dikirin, wê çaxê hewce bû ku hemû tevgerên mîrovî yek bi yek bihatina çavdêrîkirin.

Di Veblenî de takekes bi tenê ji bo maksîmîzasyona fêdeyê tevnagere, hinek dozînen din jî mîrovî tevdigerînin; çanda mîrovî, elimandin û kevneşopiyên mîrovî jî li ser tevgerên mîrovî yên ekonomîk karîger (bi tesîr) in. Her weha Veblen ji çavdêriyên xwe yên mîrovî destnîşan dike ku her tim di navbera mirovan de li ser berjewendiyan xir-



Keynes

rûcirrek heye, di civakekê de weke ku klasîkan diparast lihevkerin û ahenga li ser berjewendiyan tune ye, xirrûcirra li ser berjewendiyan heye. Ji ber wê, di Veblenî de balanseke ku xwe bi xwe karibe xwe ava bike tune ye, piştî avabûna “bazar”ê berjewendiyên şexsî nikare biteyise berjewendiyên civakî. Maksîmîzasyona karê aîdî takekesî ye, ne aîdî civakê ye, ji ber vê yekê ye ku kirûyên weke monopolîyan û çavbirçîtiya însanan derdiketin holê. Di Veblenî de “laissez faire”a klasîkan û “marjînalîzm”a neoklasîkan tîr redkirin. Veblen li hemberî marjînalîzma “zewqa fêdeyê” derdikeve, ji ber ku li gorî wî mesele ji vê zewqê naqewime, mesele ji “dozîn”ên mîrovî diqewime.

Ji ber ku “sazî” diguherin, paralelî vê guherînê di Veblenî de ekonomî jî di pêvajoya dîrokê de diguhere, ji ekonomiya klasîkan a statîk cudatir ekonomiya sazîparêz dînamîk e. Lê erê bi guherîna saziyan re ekonomî jî diguhere lê dozînen mîrovî yên weke “çavbirçîtî û bexîltî”yê qet naguherin.

Veblen hewl dide ku ji xwezaya mîrovî fahm bike, di “teoriya wî ya çîna sakûl” de gava ku hinek mîrov çalakiyeke mezaxtinê pêk tînin armanca wan ne “pêwîstî” an jî “fêde” ye, armanca wan a kîrînê “fors” e, bi wê “fors”ê “statu”yekê ji xwe re bi dest dixin û ligel ên din hêza xwe ya ekonomîk dipeyitînin.

Veblen jî weke Marxî di pêşerojê de qedera kapîtalîzmê baş nabîne. Lê sedemên wî ji sedemên Marxî cudatir in. Di Marxî de kapîtalîzm ji ber sedema “mêtingeriya har” tîk diçe, lê di Veblenî de sedema xerabûna kapîtalîzmê ne mêtingeriya har, “mezaxtina har” e; pêşbaziya mezaxtinê (kîrîna belasebeb) dibe sedem ku “mîlkiyeta taybet” birûxe û kapîtalîzm tîk biçe.

Lê belê tam miqabilî vê yekê, J. M. Keynes ji bo silameta aboriya welatekî, heta dawiyê mezaxtinê diparêze. Keynesî dil dibijand mezaxtinê û ji bo aboriyeke pêşketî heta dawiyê mezaxtinê pêşniyar dikir, ji ber ku ancax bi rêya mezaxtinê “hîlanîn” (teserrûf) karibû bihata helandin û beşdarî ekonomiyê bibûya. Heger mezaxtin çênebûya “hîlanîn” pirr dibû; pirrbûna hîlanînê, hatina aboriyê kêr dikir û bêkarî zêde dikir. Hîlanîna (teserrûf) ku di klasîkan de dewlemendî û “dîlpakî”yek bû, di Key-

nesî de “qisûr” û sedema xizaniyê ye. Gava ku sermiyan dihat hılanîn, razemenî pêk nedihat. Keynes ne bawer bû ku weke ku klasîkan pêşbînî kiribû hılanîn bixweber veguheriya razemeniyan. Ji bo ku hılanîn veguheriya razemeniyan û ekonomî geş bibûya, daxistina fayizan û ji gişî girîngtir “*destwerdan*” (mudaxele) pêwîst bû. Nêta Keynesî ya ji destwerdanê, destwerdana dewletê ye. Heta Keynesî, lîberalîzm weha bawer bû ku bêtir ku mirov an jî dewlet dest bidê, ekonomî xwebixwe dikare hev-senga (balans) xwe bi dest bixe. Lê Keynes des-twerdana dewletê ya ekonomiyê pirr hewce û lezgîn dibîne, ji ber ku bêtir destwerdana dewletê ekonomî bi serê xwe nikare mêzînekê ji xwe re peyda bike û mezin bibe. Keynes jî weke Veblenî “*laissez faire*”ê (bihêlin bila bikin) qebûl nake, lê “balans”a ku li gorî Veblenî tu carî nikaribû pêk bihata di Keynesî de bi destwerdana dewletê pêk dihat. Di Keynesî de kengî hılanîn û razemenî wekhev bibûna wê çaxê hatina neteweyî digihîşt radexa balansê.

Divê mirov ji bîr neke ku Keynesî bi van ramanên xwe di lîberalîzmê de “*şoreş*”ek pêk aniye. Ev raman di “*bêkarî*”yeke mezin, di pêvajoya her du Herbên Cihanê û di windabûna “*balans*”a ekonomiya klasîk de weke çareseriyekê hatine pêşkêşkirin û li gellek welatan encamên pirr bikêrhatî ji wan hatine bidestxistin. Lê weke Veblenî digot, ekonomî tiştekî dînamîk bû, bi demê re diguherî.

Di Keynesî de “*mezaxtin*” jî bi qasî “*hilberîn*”ê girîng e, ji ber ku ne “*pêşkêşî*”yê (arz) “*xwestek*” (taleb) ava dikir, berovajî wê, ya ku pêşkêşî ava dikir xwestek bi xwe bû. Di Sayî de her pêşkêşiyê xwesteka xwe diafirand, lê di Keynesî de her xwestek pêşkêşiya xwe diafirîne.

Misyona ku Keynesî li destwerdana dewletê bar dikir, zêdekirina “*mezaxtin*”ê ye, bi vî awayî razemenî pirr dibe û her kes dibe xwedî kar û bêkarî di-keve bin kontrolê.

Keynes jî mîkroekonomiya neoklasîkan û ji analîzên wan ên li ser takekesiyê cudatir bi perspektîfeke mezin bi awayekî makroekonomîk analîzan dike. Keynes jî klasîkan cudatir di ekonomiyê de pirr guh dide politikaya pereyan, ji ber ku di piyaseyê de hebûna pereyan xwestekê çêdike û xwestek jî mezaxtinê, lê Keynes ne ku hay jê tune ye ku gurrkirina xwestekan û pirrkirina pereyan wê enflasyonê pêk neyne, ew bi vî yekê dizane, Keynes heta cihekî hebûna enflasyonê ji bo ekonomiyekê weke tiştekî bikêrhatî dinirxîne. Ew di navbera “*enflasyon*” û “*bêkarî*”yê de, enflasyonê tercîh dike.

* * *

Lê belê kesên ku di mijara pereyan de şekala Keynesî di taqê re avêtiye “*Moneteraîst*” (pereparêz) in. Keynesî heta cihekî guh dida pereyan, lê Moneteraîst teoriya xwe ya ekonomiyê gişî li ser pereyan ava dikin.

Bandora pereyan li ser pêşkêşî û xwestekê, li ser heddên fayizan û li ser razemenî û hatina neteweyî bi awayekî eşkere diyar dibû. Ji ber van sedeman pêşengê ekonomiya Moneteraîst Friedmanî politîkaya pereyan pirr girîng didît û sersebeba bêaramiya ekonomiyekê weke politîkaya çewt a pereyan dihesiband. Li gorî Friedmanî heger dirav baş bihatina nirxandin di ekonomiyekê de zû bi zû destabîlîzasyon (bêaramî) pêk nedihat. Divê kontrolê li ser pêşkêşkirina pereyan hebûya, heger dewlet û rayedarên wê li optîmîzekirina armancên xwe bigeriyana û pere bê kontrol çap bûbûna teqez dê qeyran (krîz) û enflasyon derketina, ji ber ku li gorî Friedmanî enflasyon kirûyeke diravî bû, heger pere bi bazirganî û hilberînê re paralel nemeşiyana hev-sengên aboriyî li bin guhê hev diketin û mêzîn ser-robin dibû. Li gorî Friedmanî sedema krîza 1929’an, Banqeya Navendî ya Amerîkayê bû.

Hayekî tiştekî nuh digot; ji bo kar û xêra her kesî û her tiştî “*sinc*” derdixist pêş. Divê di aborî û bazarê de jî dîn û îmanek hebûya yan na hertişt karibû bûbûya kerrafî. Li gorî Hayekî heger di aboriyê de sinc tune bûya ne qezenc karibû pêk bihata, ne refah û ne jî lihevkin.

Hayekî, di çalakiyeke ekonomîk de, mirov ji bawerî, adet û kevneşopiyên wî bêtir nedihesiband; bawerî, adet û kevneşopiyên wî jî daxilî ekonomiyê bûn, ango di kîrîn û firotin, dayîn û stendina malekî de adet û bawerî xwedî roleke girîng bûn.

Hayekî daneheva ekola ekonomiyê ya Nemsayê (Awusturya) ji aborînasiya xwe re bingeş dihesiband û li teoriyên weke marjînalîte û subjektîvîzma hemwelatîyên xwe Menger, Bawerk û Wieserî xwedî derdiket û bi helwesteke ûltralîberal ev teoriyên neoklasîk bi pêşdetir dixistin.

Hayek di metodolojiya xwe ya aboriyê de zêde guh nade zanyariya “fîzîk”ê, ji ber ku aborî zanyariyeke civakî ye û teoriyeke mekanîk nikare zanyariyên sosyal rave bike, her weha zêde guh nade “*statîstîk*”ê jî, ji ber ku di aboriyê de û di zanyariyên civakê de hejmara guhertoyan bi qasî ku nikare bê hesabkirin pirr û tevlihev in; ji bilî wê li gorî wî, teorî berî statîstîkê ye.

Ji xeynî ekonomîstiya xwe her weha Hayek dadmend û politîknasekî baş e jî û di van waran de

xwedî gellek lêkolînan e. Di van lêkolînên xwe de mirovî pê dihisîne ku di dîrokê de hemû sazîyên mirovî bixweber çêbûne. Hemû zagonên heyî, qaî-deyên sincî, zanyarî û rêveberî giş di pêvajoya dî-rokî de bêtî destdan û destwerdanê bixweber derketine holê û pêş ketine; tu tişt ji van sazîyan pêşnûmakirî û plankirî neafiriye. Heger mirovekî ku bi “aqil”ê xwe bawer derkeve û bixwaze bi destdanê û destwerdanê van sazîyan biguhere ew hay ji aqilê xwe tune ye ku “aqil”ê wî ji berhemeke vê pergala dest-ne-dayî û dest-ne-werdayî ye.

Di Hayekî de liberalîzm kirûyeke “sine qua non”^{*} e,

Piyase, jixweber çêbûye, ew pergaleke civakî ye, nayê plankirin. Piyase gellek armancên cuda û dijberî hev jî di çarçoveya fê-deyê de di xwe de dihundirîne ku ev taybetmendî aliyê wê yê erênî û mezin e. Mirov dest werde wê xera bibe. Piyase, “listik”ê ku hemû endamên civakê ji bo qezencê beşdar dibîne û encamên “listik”ê ji serî de berî ku listik pêk were nikare bîn zanîn. Li gorî Hayekî civak ne ji kesekî/ê pêk tê, civak ji hezaran kesan pêk tê û, tevger û armancên bi hezaran mirovî ji berê de nikare were zanîn, ji ber wê, mirov di “listik”ê de nikare ji berê de bi tu hatin û belavkirina dewlemendiyê derxe. Hayek başiya piyase û pozberiyê heta dawiyê diparêze, lê ekonomîstekî weke Hahnelî tam dijberî vê yekê piyase û pozberiyê tişteki kirêt dibîne û piyaseyê tam jî weke qada şerrî û dijminatiyê dinirxîne.²

Di Hayekî de pozberî (reqabet), ne rewşek e, pêvajoyek e; pêvajoyeke ku li gorî rewşan her kêlik dikare bi lewnekî din biguhere. Hemû zanînen mirovî subjektîf in û di pêvajoya demê de diguherin. Ji ber van sedeman Hayek destwerdana ekonomiyê pirr xetere dibîne. Hayekî li ser destwerdana ekonomiyê bi Keynesî re guftûgoyên tund kirine. Keynes destwerdana dewletê ya li ser ekonomiyê hewce dibîne, ji ber ku li gorî Keynesî sedema békariyê ji tunebûna xwesteka efektîf diqewimî, heger dewletê bi navgînên malîyeyê dest werneda ekonomiyê “hilanîn” jixweber beşdarî ekonomiyê nedibû û venediguherî razemenîyan; û heger razemenî tune bûya békari zêde bû. Lê Hayek bi awayekî tund li hemberî vê destwerdanê derdikeve. Ji bo ku dewlet dest werde ekonomiyê û xwestekan pirr bike hewce dike ku xerckirinên dewletê pirr bîn zêdekirin, ev yek

butçeyeke vekirî pêk bîne.

Her weha dayîna krediyên pirr, di piyaseyê de dikare jîndariyê pêk bîne lê di heman demê de ev rêjeya pereyên pirr, dibe sedema enflasyoneke zêde. Li gorî Hayekî destwerdana Keynesî di demê kin de békariyê kêmkirî dike lê enflasyonê har dike, her weha ji ber ku békari jî bo demê kin çareser dibe di dema dirêj de ji ber sedema destwerdanê di ekonomiyê de “stagflasyon”^{***} pêk tê.

Hayek ji bo xelasiya ji vê gerrînekê, ahenga hilberîn û xwestekê pêşniyar dike. Xwesteka pirr û hilberîna hindik, xwesteka hindik û hilberîna pirr eyara aboriyê xera dike.

Hayek bi kapîtalîzmê pirr “bauer” bû, lê hemwelatîyê wî Schumpeter di bin bandora ramanên sosyalîst de ewqasî bi kapîtalîzmê ne bawer bû û di pêşerojê de pêşbîniya xerabûna kapîtalîzmê dikir. Lê divê mirov ji bîr neke ku herçend Schumpeter heta cihekî di bin bandora sosyalîzmê de mabe û carinan ew parastibe jî ew bi xwe ekonomîstekî kapîtalîst e û wî kevneşopîya liberalîzma Nemsayê (Awusturya) domandiye.

Jixwe gava ku mirov li fahmdariya Schumpeterî ya aboriyê dinihêre tê dîtîn ku Schumpeterî ne bi tenê rêbazek bi kar aniye, wî komeke rêbaz bi kar anîne. “Teorî”ya ku îmana serê ekonomîstên dîroknas jê diçû di Schumpeterî de rêbazê girîng e, her weha ligel rêbaza teorîk rêbaza “dîrokî” jî em dibînin ku dişa di Schumpeterî de rol û cihekî xwe yê bingehîn heye. Rêbaza statîstîkê jî dişa bi hema lewnî di nav aborînasiya wî de cih digire. Li gorî wî aborîzan divê di mijara rêbazan de nerm be û li ku kîjan rêbaz pêwîst be divê ew wê rêbazê bi kar bîne.

Ji bo Schumpeterî aborî zanyariyêke sosyal e û hewce dike ku aborî bi hemû zanyariyên din re di torra têkiliyêke xurt de be. Weke neoklasîkan bi awayekî mîkro lêkolînên xwe ji takekesan dide destpêkirin, lê jê haydar e ku pêşketina ekonomiyê “pêvajoyek” e û gellek guherbarîyan di xwe de dihundirîne. Analîzên xwe hem li ser dirêjayiyê, hem jî li ser pahneyiyê pêk tîne, ligel zanîna zanyarî guh dide zanîna pêjnî (intuitionel) jî, her weha pêwîst dibîne ku faktora demê jî daxilî aboriyê bibe, ji ber ku ekonomî jî bo wî kirûyeke dînamîk e.

Schumpeter di sîstema kapîtalîst de pirr girîngiyê dide rola “peyaner”î (mutesebîs), “nûparêzî” û “zanîn”ê. Li gorî wî mezinbûna ekonomîk bi



Schumpeter

“nûbûn”ê dikare pêk were, di şixulandina ekonomiyê de alav û pratîkên nuh, ramanên nuh, zanî-nên nuh, xebatên nuh, îcadên teknîk ên nuh aboriyê pirr mezin û dilind dikin. Schumpeter di fonksiyoneke hilberînê de bi lêçûneke hindik çêkirina berhemekê û her weha tiştên ku dişibin vê pratîkê jî ji “nûbûn”ê dihesibîne.

Schumpeter ji aboriya klasîk û Keynesyen cudatir “pêşkêşî” û “xwesek”ê naxe navenda ekonomiyê, di navenda ekonomiya wî de “peyaner” (müteşebîs-entreprenant) heye. Schumpeter rol û mîsyoneke gellekî mezin li peyaneran bar dike, bi saya serê peyaneran ekonomiya sekinî ji sikratê rizgar dibe. Weke ku Marxî diangaşt ketina marja karan ku kapîtalîzm ber bi bobelatê ve dibir, bi hebûna “peyanerî”yê jî holê radike. Li gorî Schumpeterî sekn û têkçûna aboriya kapîtalîst jî ber vemirîna giyanê nûbûnê yê peyaneran diqewime.

Schumpeter têkilî teoriya xwe ya “peyanerî”yê bi navê “xerakirina afirîner” (destruction creative)

teoriyeke din pêş dixê. Ev teorî “xerakirin”ê diparêze, Schumpeter vê “xerakirin”ê weke “avakirin”ê şîrove dike. Di vê teoriyê de Schumpeter berovajî gellek ekonomîstan “monopolî”yan diparêze. Ên ku berhemên nuh hildiberînin, ên ku pêşketinên teknolojîk adapteyî hilberîna ekonomîk dikin, ên ku berhemên nuhtir û pêşketîtir diafirînin mafê wan heye ku yên berî xwe xera bikin, ji ber ku ev xerakirina wan wesfekî afirîneriyê di xwe de dihevin.

Kesên ku li ser navê nûbûn û pêşketinê xera bike ew afirîner e, a ku ew dike erê weke xerakirinê xuya dike lê di eslê xwe de ev avakirin e.


1. Ernest Mendel, “Marksist Ekonomi Kuramına Giriş- Qe-dimandina Ber bi Teoriya Aboriya Marksist ve, wer; Ali Ünlü, Toplumsal Dönüşüm, Stenbol, 1998, r. 26, 56.

* Biwêjeke Latîni, wateya wê; “ew tune be çênabe, bêyî wê qet çênabe”.

2. Robin Hahnel, “İktisadi Adalet ve Demokrasi-Dadmendiya Aboriyî û Demokrasi”, wer; Yavuz Alogan, Ayrıntı, Stenbol, 2006, r. 207, 326, 430.

** Stagflasyon: enflasyon û bêkarî bi hev re, bêkarî+enflasyon.

Hêsir û agir



İlhamî OZER

li qeraxên bijangên te yên wek pira
Amedê ya Dehderî
ketine dorê
ku bi darê zorê
bikevin rê

û hin peyvên herî bi wate jî
mîna çûkên dilrevîn û awarte
veniştine
li ser lêvên te

bo ku
bi hêsirên te
nameyan bişînin
raz û sirên te
tam di wê kêliyê de
ew çûkên
wek bûkên
bi kul û birîn

bo ku
di bendaveke vala de
têr têr
û kûrekûr bigirîn
li dora xwe
û desmalên xwe binêrin
hêdî hêdî
û yeko yeko firîn

lê ya dawîn nefiriya
ji nişka ve ket riya
xwe ya duduyan
û weha qîriya
“heke tu dixwazî ez bijîm
berde tenê carekê
wek dilopek baran û pelekî darekê
tîna agirê lêvên te bimijim

tu jî kêlî bi kêlî
bipijî, bikelî
bibî xwelî
û xwe ji min re tew nehêlî

ku ez xwe
di te de
ji nû ve
biafirînim?”



Şevger ÇIYA

Elektrîk



Serê sibehê bi qarewara diya xwe şiyar bû. Sibe-
han ew û diya xwe tenê li malê diman. Bavê wî diçû
qehwexaneyan, camiyan û her sê birayên wî diçûn
kar. Xwişka wî, va ye bû panzdeh roj in, çûbû mala
xwişka mezin, xwişka mezin kurikek anîbû di-
nyayê. Ew jî dixebitî lê saet di yekan de dest bi kar
dikir, heta yekê şevê dixebitî. Dûrî navenda Diyar-
bekirê li ser Riya Ruhayê, ji malên Hemrewatê wê-
detir parkek hebû, di vê parkê de hem xwarin dihat
çêkirin û firotin, hem jî bestenî, şîranî, hem jî vex-
warinên wek çay, qehwe û bi dizîkan be jî araqên
weke bîrayê dihatin firotin û vexwarin. Şiyar, li vir
weke garson dixebitî. Ev çend carên ku ket azmûna
zanîngehê jî tu cihek qezenc nekir û weke havînên
her sal, vê havînê jî dest bi xebatê kir.

“Şiyo, Şiyo, bextreş, rabe rabe.” Bi her du tiliyên
diya xwe yên ku dikir canê wî qul bike şiyar bû. Li
kaxiza destê diya xwe nihêrt, fatûreya elektrîkê bû.
Milyarek û nîv.

“Şiyo kurê dergevan dibêje ev milyarek û nîv e,
rast e?”

“Erê”

“Bangî Mehmûd bike, na na pêşiyê bangî kekê
xwe bike û dawiyê bangî Mehmûd bike. Hê hef-
teyek berê Mehmûd hat saet paş ve da. Şiyo, qaçax
girtin? Hela li fatûreyê binihêre, dibêje me qaçax
girtiye?”

“Na qala qaçaxê nake”

“La, ev çi ye?”

“Xuya ye qaçax girtin”

“Telefona xwe bîne, zû zû, telefonî kekê xwe
bike! Telefona Mehmûd bi te re heye?”

“Na”

“Ji kekê xwe re bibêje bila telefonî Mehmûd
bike, bila Mehmûd jî bê. Mêrik çûn avya kêleka me,
bazde here wan biqefêle. Ji wan bipirse ev çi ye?
Hadê, bilezîne. Ez û tu em bi hev re biçin.”

Şiyo telefonî kekê xwe kir, mesele jê re qal kir.
Ew û diya xwe çûn avahiya kêlekê, lê mêrik ji wê

derê jî çûbûn, li avahiya din mêze kirin, na mêrikan
li elektrîkên hemû avahiyan mêze kiribûn û çûbûn.
Vegeriya malê. Di nav deh deqîqeyên din de hem
kekê wî hem jî Mehmûd gihîştin malê. Kekê wî pala
xwe da seqefa derî, li fatûreyê dimêzand, wexta
Mehmûd gihîşt malê fatûre yekser dirêjî Mehmûd
kir. Mehmûd li fatûreyê nihêrt û got “Qaçax negir-
tine. Bi vê gotinê tawanbariya li ser wî kom bûbû,
xwest belav bike. Lewre kîngê dihat saeta elektrîkê
paş ve dida, digot “Jinxalê qet netirse, heke vê qa-
çaxê bigirin ez dê pereyê cezayê bidim. Xwe bi vê
rêgeza xwe serbilind dikir. “Di fatûreyê de weke we
hezar û hefsed kîlowat xerc kiriye, xuya dike. Heva-
lekî min heye li TEDAS’ê, ez biçim jê bipirsim gelo
şaşiyek heye yan na.” Mehmûd fatûre girt û çû. Niv
saet piştî çûyîne Mehmûd vegeriya. Şiyar, diya xwe
û kekê wî li salonê rûniştibûn. Mehmûd fatûre di
dest de ket hundir û got “Min fêhm kir, qaçax negir-
tine, jinxalê roja îne dema ku me saet paş ve da, fa-
tûreya du meh berê daye min û me gora wê
fatûreyê paş ve daye. Lewre ew qas pir pere hatiye.”
Hê gotina wî ya dawîn di dev de, kekê wî şemaqek
li rûyê Mehmûd xist, pihînek li tengala Mehmûd
xist, Mehmûd bê hilm ket erdê. Ji ser hişê xwe çû,
rûyê wî reş û tarî bû. Ew dirêjî ser paldankê kirin,
hinek av li rûyê wî reşandin, Mehmûd hat ser xwe,
qet dengê xwe nekir. Bi kalûkûtî ji mal derket. Fa-
tûre di destê kekê wî de ma.

Serê temûzê ye, bajar dikele. Saet di yekan de
kîngê berê xwe dide kar, tîna ku ji Riya Rihayê ra-
dibe, bi çavên seriyan tê dîtîn. Kes li derve namîne,
yên karên wan li derve ne û nikarin biçin malê jî
xwe dikişînin binê sifirneyên avahiyan, binê daran,
binê holikan, dikevin hundirê dikanan û nexweşxa-
neyan. Di vê mehê de karê wan jî kêmkirî dibe, lewre
zengînên bajêr diçin betlaneyan. Dotira rojê kîngê
ji xew rabû, diya wî weke her carê jê re taştê amade
kir û li hember rûnişt. Ev fatûreya elektrîkê dê bikin
pênc, şeş beş û wiha bidin, xeynî vê yekê çare tune

ye. Ji ber ku kekê wî deynên xwe yên qerta krediyê dide, ku ev deyn gelemperî deynê cilên ku ji xwe re stendiye ye, nikarê pereyê elektrîkê bide. Ji her du birayên wî yên din jî; yekî gotiye “Ez mesrefa malê dikim lewre ez nadim.” Yê din jî qet deng nebiriye xwe û malbatê jî newêribûye jê re tiştê bibêje. Camêr kîngê tiştê bê hesabê wî be û bikeve stûyê wî, berê xwe dide Îzmîrê, Entalyayê, Stenbolê. Yek ji malbatê, radibe diçe wî tîne, tonek jî mesref û deynê wî dide. Lewre li nav malê kes belaya xwe pê nade, ew jî qet guh nade rewşa malê. Kî ma li meydanê? Şiyo. Şiyo gava li van gotinên diya xwe guhdarî dikir, qet bertek nîşan nedida. Diya wî jî ji vê yekê hêz digirt û jê re xweş dikir, li ser girîngiya malbatê, xwedîderketina malbatê, nekenandina hemberan, meseleyên berê, qal dikir û dikir. Şiyo ev yek qebûl nekir “Ez nadim, kî dide bila bide. Ji min re çi? Me pere berhev kir, Xalit efendî çû jin kir, jina xwe anî ser malê, me dengê xwe nekir. Cilên herî xweş li xwe dike, telefona destê wî bi milyarekê ye. Ew û patronê xwe heman telefonê bi kar tînin. Ji forsa xwe re dike çil kîs. Her roj tê dibêje “Yekê ji min re got tu dişibî doxtoran, yekê got tu dişibî mamosteyan, yekê got tu dişibî quzê kerê.” Ew jî ket azmûnê, bila bibûya tiştê. Dema ku devê wî vedibe dikare hezar kevîran li ser lingekî li min bixe. Çima qezenc nekir? Ji xwe re na, ji min re mêr e. Qurişek pere nade malê, ji serê sibehê heta êvarê hesabê pereyên me dike”

“Te jî qezenc nekir, tu çima ji xwe re nabêjî?”

“Yaw min qezenc nekir ez bi pereyê yekî din neçûm dersxaneyê, ez xebitîm min perê xwe berhev kir û ez bi pereyê xwe çûm dersxaneyê. Ji kê re çi? Heta îro kî li vê malê bûye xwedî? Ez. Zarokên te hemû nakin bi bîst û pênc qurişan.”

“Hemû ji te mezintir in bextreş! Tu çima wiha xeber didî?”

“Erê mezintir in, kê çi xêra wan dîtiye ha? Cîhanê te serê sibê heta êvarê bi qîzikan re bipeyîvê tîr nabe. Keçikekê heta îro rû dayê? Na. Ez jê re dibêjim tu çima pereyên xwe didî qontoran û bi qîzikan re dipeyîvî, dibêje “Pere pereyên min in, ez bixwazim bidim çi ez dê bidim, ji te re çi? De here, bibe ker bila xelk li te siwar bibe û kîngê hatin ber deriyê xwe bila henekên xwe bi devê qûna te bikin, ji min re çi. Bila van çend mehan perê qontoran bide heqê elektrîkê, qey dê çi bibe. Kurê te yê din tu jê re bibêjî “Merheba” berê xwe dide Îzmîrê, Stenbolê, Entalyayê. Eraqa xwe vedixwe, çi xweş. Her kesî ji xwe re riyek dîtiyê. Yê ewêl kî ye? Şiyo. Perê elektrîkê kî bide? Şiyo. Heqê cixare û çaya bavo kî bide? Şiyo. Heqê dersxaneyê xwişka xwe kî bide?

Şiyo. Baş e, kerê weke min hebe ez jî dê lê siwar bibim, çima nebim. Dixwazî di tariyê de bimînin, dixwazî bila bîn elektrîka we bibirin. Eleqeya min tune ye. Vê carê ez qet eleqe nakim. Hê zarokên min çênebûne, ez nikarim bavîtiyê ji kesî re bikim.”

Wê şevê erebeya patron nebû, Şiyo venegeriya malê. Car caran wexta hêrs bibûya, dilê wî xirab bibûya, mal tije mêvan bibûya, bixwesta tenê bima, venedigeriya malê. Li cihê kar dima. Serê sibehê bi tavê re Şiyar dibû, ew henaseya hênîk tîr dikişand kezêba xwe, li tavê dimêzand, dengê dîkên gund ku bi qasî deh kîlometreyan dûrî wan bû, dihat. Pirê caran wan şevan ranediket, diket nava xeyalan, weke her kesî. Carcaran di tariya wan şevan de bi qasî ku taqeta wî hebû li nav wan zeviyan digeriya, pir bêriya gund nedikir. Tiştê ku bêrî dikir tenê serê sibeyan bû, beriya rojê rabûn û dîtina hilatîna rojê zewqeke mezin dida wî. Tenê ew dîmen car caran dihat ber çavên wî, hingê bêriya gund dikir, nexwe gavanîya dewaran a di wî temenî de, tenê bi serê xwe, bê hedar, dikir ku dîn bibe. Ew roj pir xirab bûn. Ji ber ku biçûkê malê bû diçû ber dewaran, yê din paleyî dikirin, hedara wî nedihat, dilîst. Dewar wenda dibûn, her kesî pê re li hev dixist, mezinan digot hişê vî lawîkî hinekî kêr e, divê meriv lê miqate be.

Wê şevê jî dê bi îhtîmaleke mezin biketa nav wan erdên beyar û bigeriya, heta serê sibehê. Lê nobetdarê kar bi hinceta nexweşiya jina xwe ji Şiyo rica kir ku di dewsa wî de nobetê bigire. Şiyo jî got baş e. Şiyo dengê radyoya xwe vekir. Di wan saetan de di radyoyê de, stranên herî arabesk, mirovên herî arabesk, keçikên kêmaqil ku ji destgirtiyên xwe veqetiyane, ciwanên lîseyê ku ji keçikê hez dikin lê haya keçikê jê tune ye, telefonî radyoyê dikin, peyaman dişînin. Hinek ji wan navên xwe didin û dibêjin em qansêrî bûne, hinek ji wan bi peyaman dibêjin “Ez êdî ji te hez nakim”, hinek ji wan dibêjin “Ez ji te pir hez dikim.” Pêşkêşvan şîretan li wan dike, bi dengêkî zîz û tije keder, aqil dide wan, stranan diyariyî wan dike.

Saet dihat sisêyan, dengê muzîkê tenê dihat, ne pêşkêşvan mabû, ne mêvan ne jî peyam. Şiyo li ser sedîra binê sêncê xwe dirêj kiribû, jan ji laşê wî diçû. Goreyên xwe ji lingên xwe derxistibû, çavên wî hatibûn girtin, ji ser kabokên wî heta binê lingên wî jan diçû, diçîziya.

Dengê jinîkekê tê. Jinîk dinale, dikene, hêrs dibe, diqîre. Şiyo xilmaşê xewê ye. Bayekî hênîk tê, di meha temûzê de mirov diricifîne, Şiyo xwe diqelibîne aliyê dinê, lingê xwe dikişîne ber xwe, destê xwe dike binê çengên xwe. Dîsa dikeve xewê. Vê

carê dengê hinek zilaman tê, sê an çar, ne kifş e. Dikenin, henekan dikin, çêrî hev dikin, dikin qarewar. Dengê jinikê jî dikeve nava dengên wan. Şiyo hê jî xilmaş e. Ji nişka ve ev meseleya nobetdar tê bîra wî, diz hatibûn, li gorî ku nobetdar qal dikir, ne tenê yek, ne du, ne sê nêzikî deh dîzan xwestibûn kafeyê bişêlînin, heke nobetdar di wexta xwe de bi çifteya xwe bi wan ve nedabûya, dê dîzan ne tenê bişêlanda belkî ecêbê giran bianiyana serê nobetdar, ku nobetdar bibûya sosret. Li van derdoran her kesî qala dîzan dikir. Bi taybetî nobetdaran. Çi rast, çi derew xwedê zane lê her yekî ne tenê qala yekê, belkî qala bi dehan bûyerên ku hatine serê wan dikirin. Di vî bajarî de kî forsa xwe nake? Dikandar, xwendekar, sût, bêkar, mele, karmend, karker her kes qala mêraniya xwe dike. Pîrên heftê salî qala ciwaniya xwe û eşîrên gund dikin, ciwanên nûhatî qala xwe û mamosteyan, ciwanên nû leşkeriya xwe qedandî, qala leşkeriya xwe, yên navsere qala duh û pêr dikin. Yên karê wan parastina mal û dikanan bû mêraniya herî pir ji wan re dibû qismet. Lewre karê wan ew bû, ji bo qalkirina mêraniyê hewceyî şahidan nebû, lewre ew nobetdar bi serê xwe, wexta her kes raketî bû, li mal û dikanên xelkê miqate bûn. Nobetdarê Şiyo jî, her roj nebe jî ji çend rojan carekê qala hewldanaa diziyê dikir û piştê dor dianî ser mêraniya xwe ku çawa diz destvala vegehandiye. Çawa dîzan kirine qarewar, çawa dê diz êdî nikaribin xwe li van deran bigirin.

Şiyo bi bîranîna van bûyerên nobetdar ji cihê xwe pengizî, bi çavên xilmaş li dora xwe meyzand. Dixwest fêhm bike gelo ev dengê bihîst xew bû yan rastî bû. Sira bayê careke din laşê wî ricifand. Erê sar bû. Saqoyê nobetdar li xwe kir, guhên xwe mîç kir, li hêviya deng ma. Destê xwe li binê sedirê gerand, çifteya nobetdar ji binê sedirê derxist. Gule da devê çifteyê, li cihê xwe bê liv û tevger sekinî. Çend deqîqeyan deng nehat, tam ji ser hişê xwe diçû dîsa deng hat. Ne tenê dengê mêran dengê jinikê jî dihat. Şaş ma. Jinika diz ne aqilane ye, lê ji xwe bawer nedikir. Xilmaşê xewê bû, ev dengê jinikê dibû ku ji xilmaşiya wî bê, li dora xwe meyzand, tariya zilamat. Her ku diçû deng nêzik dibû. Biryara xwe da, ev ên ku dihatin diz bûn. Deng nêz bû, nêz bû û biliya. Piştî çend kêliyan deng dîsa hat lê vê carê dengê inteinta jinikê û kenê mêrikan bû. Çifteya xwe girt û bi aliyê deng ve çû. Sê mêr û jinek bûn. Jinik tazî, li ser piştê dirêjkirî bû, mêrikek di nava her du lingên jinikê de bû. Ew jî tazî bû. Bi her du destên xwe bi her du lingên jinikê girtibû, kabokên xwe şikandibû, xistibû binê xwe. Bi her liva wî re jinikê dikir inteint, bi her inteinta ji-

nikê wî jî dilezand. Mêrikên din li her du aliyên wan sekinibûn, bê liv, bê tevger û bê deng, li dûmenê temaşe dikirin. Her kes ew qas bi karê xwe biliya bû ku kes lê varneqilî. Di navbera wan û Şiyo hindik mabû. Şiyo berê tivinga xwe bi aliyê wan ve kir û kir ku biqîre. Dawiyê jî vê ramana xwe dage-riya û berê tivinga xwe bi aliyê asîman ve kir û guleyek teqand. Bi teqîna tivingê jinika tazî, mêrikê tazî û her du temaşevanan berê xwe bi aliyê deng ve kirin. Şiyo berê tivinga xwe da wan, tev li cihê xwe sar bûbûn. Şiyo li wê navberê newêribû ku her sê mêran dîl bigire û bike mêraniya xwe. Lewre çi dibû û çi nedibû, Xwedê dîzanibû. Lê heke her sê mêr ji destê wî biçûna jî ev jinik hem delîl bû hem jî şahid bû ku çiqas mêr e û çawa jinik xilas kiriye û ji tirsan mêr çawa bizdiyabûn, beziyabûn. Şiyo qîriya “ Ho! Ho! Bênamûsino! Bêşerefino! Wa ye ez hatim. Ez im Şiyoyê mala Zeynikê, ez dê îşev qira we bînim, xwe ragirin bênamûsino!” Bi van peyvên ku di gund de natoran ji dîzan re digotin, wî ji mezinan seh kiribû, hem mêrik hem jî ew şaş ma. Mêrikan bi nêrînen seyr li Şiyo dinêriyan. Şiyo jî li wan. Dawiyê Şiyo guleyeke din berda û dîsa qîriya “Li wir bisekinin, wa ye ez ji we re hatim, ez dizanim ez dê çi bînim serê we, hela ji min re bisekinin” Bi van gotinan mêrikek bêyî ku haya hevalên xwe pê bixe reviya, her duyên din jî dan dû. Di demeke kin de ji ber çavan wenda bûn. Jinikê bi tevgerên ne zû, bêdil kincên xwe li xwe kir. Şiyo li cihê xwe mat mabû, zîq li jinikê dinîhêrî. Jinik hat li pêşberî Şiyo sekinî, bi nêrînen tije kîn û rik li Şiyo nihêrî û got

- Sêsed dolarî bide min.
- Çi?
- Quzilqurt, sêsed dolarî bide min.
- Çima? Tu sêsed dolarî bide min.
- Min kîrê te di diya hefsed bavê te ve kir, ew mêrik mişteriyên min bûn. Dê wan sêsed dolar bida min.
- Bîteqize ji vir here.
- Çiqas pereyê te heye? Were tu îşev bibe mêr min? Çiqas pereyê te heye?
- Bîteqize here.
- Lawê qehpikê wê çaxê te çima nehişt ez pereyê xwe kar bikim. Bi van gotinên dawîn jinik xwarî erdê bû, kevir girtin û bazda serê rê, erebeyên ku dihatin û diçûn da ber keviran. Jinika nîvtazî li nava rê sekiniye, kîjan erebe tê û diçe dide ber keviran. Li aliyê din ê rê bînaya TEDAŞ'ê hebû, jinikê jî nişka ve berê xwe bi aliyê TEDAŞ'ê ve kir, şibakeyên TEDAŞ'ê hemû anîn xwarê. Di vê navberê de çend texsiyan fersenda xwe dîtin û ji nav lepên ji-

nikê xilas bûn. Lê otobosa ku ji Wanê diçû Stenbolê bû armanca jinikê. Ew rêwiyên feqîr ku piraniya wan raketî-bûn, bi derbên kevîran ji cihên xwe pengîzîn, zarokan dest bi girî kirin. Pêşiyê her kesî xwe bi paldankan ve zeliqand, gotin qey gule ne, ajokar pê li gazê kir ji nava destê jinikê xilas bû. Gava ku di awênayê de dît jinikek wiha dike, otobos sekinand û ji çaviya otobosê darekî stûr derxist û xwe ji erebeyê avêt xwarê. Ber bi jinikê ve bazda. Beriya ku xwe bigihîne jinikê, polês bi carekê ve tije bûn. Bi zorê û lavayan ajokar dan sekinandin. Polêsan Şiyo, jinik û ajokar birin qereqolê. Ajokar bû dozdar û doza zirara xwe kir. Di vê navberê de haya firmayê pê xist, qasî du saet şûnde du parêzerên firmayê hatin qereqolê. Şiyo mesele ji serî heta binî ji polêsan re qal kir, lê jinikê ev angaşt qebûl nedikirin. Digot Şiyo kevîr avêtine otobosê. Şiyo nizanibû çi bike, soromoro bûbû, hêstir ji çavên wî dibariyan, ji hêrsan destên wî dilerizîn. Dawiyê ajokar got tiştê min dît jinikê kevîr avêt otobosa min. Bi hatina parêzeran re ji bo ajokar pêvajoya hiqûqî qediya. Ajokar pîştî îfadedayîne çû. Şiyo û jinik li wir di nezaretê de man. Bi bîranîna şikandina camên TEDAŞ'ê û fatûreya elektrîkê, Şiyo diricîf. Îfadeyên ku jinikê ser dida û van bûyeran hev digirtin. Lê haya jinikê ji fatûreya elektrîkê tune bû. Polêsan jî nizanibûn. Lê heke lê bikolin? Di bûyerên wiha de kes lê nakole, lê heke vekolin? Bikolin jî bila bikolin, kes nikare bipeyîtine. Lê hezar biryar hene ku tu sûcê bersûc tune ye jî û hatiye mehkûmkirin. Lê tenê malbat dizane, heke yek ji malbatê nebêje dê polês çawa zanibin ku ew qas pereyê elektrîkê hatiye û dê çawa têkiliyêke wiha deynin. Şiyo bi van ramanên dîn û har dibû, fikir ku mejiyê xwe bixwe. Ji nişka ve hat bîra wî ku çend erebeyên ku nikaribûn ji ber jinikê xelas bibin û biçin, dîtibûn ku jinikê kevîr avêtiye TEDAŞ'ê, vê ramanê kir ku hêrsa Şiyo sar bibe. Saet dihat pêncê serê sibê, Şiyo xwe li ser textê nezaretxaneyê dirêj kir, beşiya û raket.

Galaya xwekuştinên qewmekî



Janbijan AR

Û jixwe yê me,
Bi me re her tim
Sebra Eyûb pêxember hebûye
Û me di her dikê de
Heman danazîn keritandiye

Yên bi bengînî
Li axeke şikeva geriyane em in
Û yê ew ax di xwîna xwe de kirine jî em in
De ka, belkî di xurcika me de
Çend kesên bi xîret mabin

Û rabin
Me jî vê kûçikistaniya hanê rizgar bikin
Pêşîrên êşê, cihêtname ye jî me re
Di nivî de eliqandinên me yê kronîk
De werin em tev de bifirkînin/bifirkînin

Balam; qey di berketinên me de
lorîkên me û em yek bûn.

Garan zikak û zarok

Xort BAJARVAN

Garan muxriban bi xwer tînin
Rohn dikin tavê û ber bi gund ve tînin sti-
riyên xwe
Cema xwe û rewaya devê xwe jî her weha
Mahsere û mahşere li hev diqulipin di meşa
wan de
Şûr di navbera wan re derbas nabe

Xwedê!
Her şopik çiqas dişibe jiyana me
Jiyan, terapêlk li ser axa cihanê
Ne pirsin ji wan, çima darneqlok hestiyên
me qulqulî dikin
Û çîrokên me çima bi şev tîn bîra me
Mîna neynûk dirêj dibe.

Neynûkên me zarokan û yên garanê
Neynûkên zarokan zûtirîn dirêj dibin.

Garan di nav gund re derbas dibe
Di nav tûtina kalan, keziyên pîrika û çîrokên
me zarokan
Ser xaniyan gindorkirî û aram
Kêzikên hecê li zarokan digerin
Gulên berbiro hezkirinan diçelfisînin, hinek
pir hezar
Aaaaaa ew qas!

Pelên gûzan dasiyên masiyan jî bi xwere
dixin vê payîzê
Beq tenora hildibijêrin bi fona xuşxuşa çem
re

Dibe ku niha tîjmar çirayê vêdixin di mala
xwe de
Kevjal dikevin tora masiyan.
Xortên gund jixwe her dem govendgêr in
Loma, kelogirî û xemgîn e garan.


Lê, wênevanên welatan çûne ber golikan.

Ez li zikaka gundê xwe me, li hêviya garanê
Piştî min bextewar bi dîwar ve sipartî
Dîwarê gundê min dişibin gundiyan, loma di
şibin hev
Destê wan pê bûne, tîrsa destê wan û dilo-
vaniya wan
Ango cindî çi hebe, ji hebûna destên wan e

Zikak, nasnameya zarokatiya min
Amûreke ji dengê zarokan
Dema min î zêrîn zaroktiya min
Axxx!
Ger we zanibûya zikakên zaroktiya min!

Li zikakên bajêr
Qîr û beton bingeşa endezyaran datîne
Her tişt ji lek e
Dayîkên zarokên wir zû bang li wan dikin
Û sed heyf...
Dîksilêman nafirin li ezmanên wan.

Jî "evîndarên celadê xwe" re...



Şexo FÎLÎK

Mîna termê miriyekî li ser mevşenê dirêj bikî xwe li ser nivînê dirêj kir. Hilmeke kûr kişand û bi 'ofînî berda. Her du destên xwe dan bin serê xwe û pelûyên xwe hêdika dan hev. Di rewşên wiha de bivê nevê di behra ramanên reş de avjenî dikir. Kîngê bi tena serê xwe bima, vedikişiya quncikê dilê xwe yê tarî û difikirî. Fikirî, fikirî, fikirî... Dûr û dirêj fikirî. Lê nikaribû rûyê 'wî' bine bîra xwe. Zêdetirî bîst salan bi paş ve çû. Heta 'wê rojê'. 'Ew roj...' Ew roja ewil anî ber çavên xwe. Bi hêviya ku hêsantir were bîrê. Lê na, na, na. Ne rûyê 'wî' ne dirûvê 'wî' ne jî taybetmendiyeke wî ya bi tenê. Belê ew zêdetirî bîst salan e. Zêdetirî bîst salan her rojê Xwedê li 'wî' mêze kiribû, tew carinan rojê du, sê caran. Lê a niha tu alavên bibîrxistinê di hişan de tune bûn. Dê wiha nebûya. Dê roj bi roj rûyê 'wî' jî bîr bikira. Ê paşê bi demê re kirinên wî, pê de pê de jî hesta tolhildanê dê di dil de sivik bibûya.

Bi dilekî mişt hesta tolhildanê û mêjiyekî rik û bîza bîst salan tije jî ser nivînê rabû. Qehirîna kêliyeke kin –ku 'ew' nehat bîrê- bi ser hêrsa zêdetirî bîst salan vebû. Qehirîna kêliyekê, hêrsa bîst salan tevgerand. Bi destê xwe yê rastê, bin balîfa xwe pelikand, lê tişt bi dest neket. Di odeya razanê ya reş û tarî de rabû ser xwe, bêyî çiraxê pêxe û kesî pê bihesîne bi destpelkî nava odeyê serûbin kir. Piştî lêgerîneke dirêj, di paş awênayê de dît. Destên ricricî û lertzok dirêjî paş awênayê kir û derxist. Bi ber pacyê ve kişiya. Perde kişand. Li ber tavehîvê rast kir û lê nihêrî. Got "Tu" di dilê xwe de û bi dengêkî tîr zîz; "Tu ey celadê bav û kalên min. Tu ey kujerê hêvî û baweriyên min. Tu ey sersedemê hemû sewîtiyên min. Bi te ku ez ê te nebînim? Te got qey ez ê te ji bîr bikim? Ez te ji bîr bikim? Naa... qet û qet." Got û kir berîka şalê xwe yê biçûk û xwe avêt derve.

Di qerebalixa sûkê ya wek tiliyên destan xwe dane paş hev de bêyî wewest, bi kulmên guvaştî, bi gavên revokî diçû. Wek meyxurên ber dîlkêşî û cazîbeya meyên salanî dikevin, ew jî bi ber bayê dîlkêşiya hêrsa xwe ya kevnare ketibû îşev. Çavên eniyê lê sor bûbûn. Ew çavsorkî bûbû îşev. Xwîn ketibû çavan îşev. Îşev divê bi ya xwe bikira û ti-

ştêkî din na! Ê kir jî...

Bi vebûna deriyê derve re dengêk ji dilekî tîr tirsî û meraqdar hat:

- Ew kî ye?

- ...

- Tu yî?

- ...

Xwediyê dilê bi tirs û mereqdar, ber bi deriyê derve ve bezand. Bi dîtina dîmena hemberî xwe rihetiyek hat li ser rûnişt. Lewre "Ew" hatibû. Wê rihetiyê pir neajot. Lewre xwediyê dilê bi tirs fêhm kiribû. Derketina vê saetê ne ya xêrê bû. Bêyî ku tiştêkî jî hev du bipirsin û serê hevdu biêşînin her du jî derbasî odeya mêvanan bûn. Xwe dan ser qenepeyê û ew rûyê bê can di navbera xwe de dirêj kirin. Her du jî bi ser rûyê bê can de xwar bûn. Demekê, bêdeng li wî rûyê bê can nihêrîn. Yê ku dawî li bêdengiyê anî, xwediyê dilê bi tirs bû:

- Em ne hevjinê hev in? Divê haya min jî ji we kiryara te hebûya.

- Bibore...

- Dê niha çi bibe?

- Nizanim...

Piştî bêdengiyê dirêj vê carê ew axivî:

- Ez ê wî li odeya mêvanan daliqînim. Bila tim û tim li ber çavên me be. Me hinekî din bi baldarî tevgerîn divê, ew qas. Bes bila kûçikên 'wî' yên birçî nebînin.

- Dilê te çawa rihet dike, yeqîniya te çawa dikeve wisa bike. Bes bila dilê te bibe... Megrî... Ez qurbanî te me megrî...

- Ew roj... Ew roj qet ji ber çavên min naçe. Wê roja ku ez hê heft salî bûm û diya min bi dizîka hatibû bi min de digiriya û digot "A ev e." "Ev e kujerê bav û kalên te, ev e sersedemê hemû sewîtiyên te. A jî te re wênayê wî. Bila tim bi te re be. Da ku tu 'wî' jî bîr nekî. Tolrakirina me ji destê te nehat jî, de qet nebe neyar û dijminê me nas bike. Heke tu wî ji bîr

bikî, tu şîrheram î. Heke dilê te bi 'wî' re nerm bibe tu şût î" Ev jî jibîrkinê ne çêtir e, ez qurbana te?

- Çêtir e. Pir çêtir e. De rabe em bi dîwêr ve daliqandin.

Rabû û wênayê kujêrê bav û kalên xwe ku, gavek berî vê ji odeya razanê, ji paş awênayê derxistibû û paşê jî biribû sûkê ew mezin kiribû û dora wê çarçove kiribû bi dîwêr ve daliqand.

Di her derketin û têketina malê... ne digotin rojên şînê, ne digotin ên şahîye... her tim li ber wênayê 'wî' bûn. Rabirdûya wan 'ew' dianî bîra wan; 'wî' jî rabirdûya wan... Bûn xwedî zarok bi zarokên xwe ve, bûn xwedî nevî bi neviyên xwe ve... Diçûn hemberî wî disekinîn, dûr û dirêj lê dinêrîn. Bi rik û bîz...

Roj bûn meh, meh bûn sal lê qet ji biryara xwe

daneketin. Pê de pê de zarok, pey re nevî, pey re zarokên neviyan, neviyên neviyan û... Neviyên neviyan jî her roj di her keysê de li wênayê 'wî' dinîhêrîn. Wan jî di odeya xwe ya mêvanan de wênayê 'wî' daliqandibûn. Tenê di odeyê xwe ya mêvanan de? Di kargehên xwe de, di saziyên xwe de, heta di PERESTGEHÊN xwe de jî... Kevneşopî nîfş bi nîfş hat û gihîşt qonaxê nû. Neviyên "kevneşoperest" wêne li her derê zêde kiribûn, bi her derê ve daliqandibûn... Lê êdî cudatiyeke miz û mezin ketibû navbera bav û kal û neviyan. Lewre neviyan bi nêrîna bav û kalên xwe li wî nedinîhêrtin. Bîz û rîka bav û kalan veguherî, bû hez û rêz. Bi wê jî nema bû, veguherîbû evînê... Erê neviyên bav û kalekî bûbûn evîndarê kûjerê bav û kalên xwe. Bi vî awayî bîz perisîbû hezê...

Xezale koyan


Wexta vewra verîne
siyahîyey porê ya temernayne
û dimara çîmanê ya yê zeytûnan
hewrê ezmanan qeleşnayne.
Hewayîşê xo emanet verdabi
di verikey bajarê xo de.
Bi heskerdiş dekerdîbî
zerrîye ya
bi heskerdişê merdimahî,
heskerdişê zîwanî
û yê azadî!
Kevoke bajaran bî,
bi hêvîyanê xo yê rengînan
ver bi koyan wa perayne.
Û delale daye xo,,
gule bayê xo.
Xezale koyan bî
aw roc ra tepya.
Newe zîl dayne hêvîyanê ya
Di binê roşniye esteran de.

Bêxemiya te

Bi kêfê kesnedîtî dihatî.
Tu, ji nav asoyên nîgaşan,
ber bi zeviya rastiyê ve.
Û her gav
di destên te de gul sor dibûn.
Te di nava Sehayê de
bîra evînê vedikola,
ji bahoza qûmê bê hay
Ji xwe bawer,
ji xwe hez kirî,
û pozbilind.
Te ew rewş ji xwe re baş didît,
dinya çawan dizivirî ne xem bû.
Jixwe ya ku ji te re baş dihat
ji nedîtî ve hatina te bû.
Piştî bahoza li Sehayê,
cara dawîn dema tu hatî
qevdek payîz di nav destê te de bû.
Min jî zerpelên kulên xwe bi ser de rijandin.
Ew jî ji min re baş bû.

Nesrîn NAVDAR

Şev e



Dilşer BÊWAR


Şev e xeyalo
serê min li ser çoka xemê ye
xem ji memikên xwe
meya sor, sorişkî
na, na
reş, reşê qetranî pêşkeşî min dîke
wek hurumekî dinya nedîtî
vedixwim
dialêsim binê piyalê
û
îskanan li bin guhê erdê dixim
serxweş im.
serxweş
dîn û har...

bi newaya ji tariya şevê
û
guliyên xemê difikere
dihejim
dreqisim
diperpitim
bi hêrs
bi kîn
û
dîn...

tûyî rûyê xwe û we dikim
berî ku
tûka serxweş dakeve erdê

na, na
ji serma dilan li hewa biqerise
bi kêfxweşî û serxweşî vedixwim
tûka xwe
dinalim
dikalim
ji tariyê re
ji roniyê re
ji xwê re
ji xemê re
çêran dikim
bi tîqetîq

ji bédengiya şevê
dengekî ne diyar olan dide
"Gava mirov dibêje însan, ava çem û ka-
niyan disekine"
û xweza bi ser min de rondikan dibarîne
şil...
şilftazî
çokên xwe dikişînim nava xwe
û
bi ser termê bêwariya xwe de digirîm
yar yar...



Fahrî KARAKOYÛNLÛ

Ez ê bi ser bikevim..!

Rojeke wek mahşerê bû. Bi hezaran zarok, jin, kal û pîr.

Rêveberên bajêr, şaredar, parêzger û serleşkerê bajêr di heyecaneke bêsînor de bûn.

Di stadyûma bajêr de civiyabûn .

Îro, rojeke taybet û pîroz bû, ji bo wan.

Cerga ku, komar ava bûbû, tu car heyecaneke wiha neketibû, nav gel û rêveberên komarê.

Di damezirandina komarê de, bi hezaran zarokên li ser vê axê dijiyan, bi navê dewleteke netewî û nijadperest hatibû qirkirin. Yê ku ne ji ola wan bûn, ji xwe bi bernamayeke taybet bi navê “cîguhertin”, “ewlekarî”, “mubadele”, û bi navê “yekîtî”yê dûkel bûbûn.

Di damezirandina komarê de bi navê “Desthilatdariya Neteweyî û Cejna Zarokan” cejnê li dar xistibûn. Ji bo wan, her sazî û dezgeh, ji bo ewlekarî û ayendeya komarê û ji bo damezirînerê komarê bû. Ji ber wê, komar bûbû şûnwarê “cejn û şahiyân”. Dibistan, kargeh û civak wek saziyeke leşkerî hatibû rêkûpêk kirin.

Ji bo rêveberên komarê û serokê komarê ne xem bû ku, zarok ji birçînan dimirin, bê mal, bê dê û bav in û di nav jiyaneke kambax de dijîn. Serokê komara mezin, bi zarokan re di nav hinek dûmenan de xuya dikir û bextewariya xwe û zarokan nîşan dida. Li ser damezirandina komara mezin, gelek sirûd, ji bo cejn û pîrozbahiyan hatibûn pêşkêşkirin. Zarokan, her sibe bi serê komara mezin sond dixwar. Hebûna xwe, ji bo hebûna damezirînerê komarê û neteweya xwe feda dikirin.

Ev dûmen, ji bo rêveberên komarê, serkeftineke mezin û bextewariyeke bê hempa bû.

Li paytext û derdora wê çend bajar û ji hinek navendan pê ve li ser axa komarê, zarok û ciwan dê çî bikin, çî bixwin, çawa bijîn, ayendeya wan dê çawa be, ne xema tu kesî bû. Komara mezin, bi sirûd, bi al, bi meş û leşker her di bin ewlehiyê û aramiyê de bû.

Bernameya komarê, bi navê “hemdemiye” di

bin zordariyeke leşkerî de dimeşiya. Yên ku li dijî îdeolojiya “Serokê Mezin” derdiketin, bi tawanên giran, bi kuştinê û bi îşkenceyan ve rû bi rû diman.

Komarê li ser guman û tirsê hatibû avakirin.

Yên di nav komarê de hindikahî bûn, mal û milkê wan ji dest wan hatibû stendin û bi piranî re-viyanbûn derveyî welêt. Bi rastî, bi navê “mubadeleyê” hatibûn mişextîkirin. Yên mabûn jî, wek di bin parastina “peymanên navneteweyî” de, ji komarê re, êdî ne xetere bûn. Bernameya komara mezin, gav bi gav ber bi armanca xwe dimeşiya. Lê, di nav komarê de gelek hebû ku, ji bo bernameya komarê astengiyê mezin bû. Ev gel, bi hejmareke mezin, bi hezar salan bû ku, li ser axa xwe dijiya. Bi gelemperî zimanê xwe, toreya xwe û erdnîgariya xwe parastibû. Ji ber vê, bernameya komara mezin, wek ku wan hesibandibû, nedîçû sêrî.

Her çiqas, ji aliyê asîmîlasyonê ve serketineke bi dest xwe xistibûn jî, ji aliyê ramana neteweyî ve, rê li ber têkoşîna wan nehatibû girtin. Ev 20, 30 salên dawîn jî, têkoşîna azadiyê û daxwazên neteweyî her diçû bilind dibûn. Ji ber wê, bernameya komarê, wek ku wan dixwest nedîçû serî û gelek tişt berevajî bûbûn.

Bi destê nijadperestên komarê şerekî qirêj ber-dewam bû. Di vî şerê qirêj de, bi deh hezaran xort, qîz zarok, kal û pîr hatibûn qetilkirin, bi hezaran gund, navçe hatibûn valakirin û şewitandin. Bi milyonan mirov li rojavayê komarê, hatibûn bicîkirin, di kolanên bajaran de bi hejarî û neçarî, jiyaneke bê hêvî, bê rûmet berdewam bû.

Komara mezin, serkeftina xwe li ser fen û fûtên dîplomasiyê ava kiribû. Rêveber û aqilmendên komarê, di vî warê de jîr bûn. Ji bo li seranserê dinê ziman û çanda xwe belav bikin, di nav gelek hewildanan de bûn. Li gelek deverên dinê heta 115 dewletan, ji bo fêrkirina zimanê komara mezin, dibistan û hinek saziyên perwerdekirina zimên ava kiribûn. Ji sala 2003'an û vir ve jî, wek “Olimpiyadên Zimên” ji her devera dinê, zarokên biyanî dia-

nîn, û bi wan re, li ser zimanê komarê pêşbirk çêdikin. Îsal jî, 120 dewlet û 750 zarok û ciwan beşdarî “Olimpiyadên Zimên” dibûn. Ji Myanmarê û Nepalê bigire heta Perû, Kongo, Filipînan, DYA û dewletê ewrûpayê 120 dewlet...

Ji bo komarê rojeke serfiraz û dîrokî, rojeke şadiyê bû.

Ji Kongoya Demokratîk du xwişkên reşik; yek pênc a din çar salî, di destê wan de mîkrofon, “Sirûda Neteweyî” dixwendin. Koma rêveberan, ketibûn nav çû û xuroşekê. Serokomar û serokwezîr ji heyecanan, nikaribûn rê li ber hêşirên çavên xwe bigirin û di nav girînekê de bûn.

Rêveberên mezin, wek ku, bi tayê bikevin, ketine nav çû û xuroşê. Bi ya wan, dîsa li ber Viyanayê ne û di 87 saliya damezirandina komara mezin de, çûne seferên dagirkeriyê. Wek serê wan gihabe erş û alayê, helwest û çûsa gel, ji stadyûmê belav dibe û li seranserê bajêr olan dide.

Îcar dora zarokêkî Sûriyê ye, wê “Xîtaba ji Ciwanan re” bixwîne.

Bi hezaran mirov ketine bêdengiyeke wek mirinê. Bêdengî û şaşwazî, dê dilê gel bisekinîne. Her kes, wek ku li cemserê bin, qerisîne û di cî de matmayî mane.

Wek ku, kes naxwaze ji wê çû û xuroşê derkeve, di wê xewa mirinê de her wisa dixwazin bimînin.

Ev çi bû?

Çi qewimî bû?

Gurîniyek bi nav stadyûmê ket, dora serokomar, serokwezîr û rêveberan ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hat dorpêçkirin.

Gelo çi qewimîbû?

Hêzên ewlekariyê, şaredar û serleşkerên herêmê ketibûn hev, nizanibûn çi bikin.

Gel serobinî hev bûbû.

Endamên komîteya amadekar, geh vir de geh wê de bazdidan!

Tiştêkî wiha, çawa qewimîbû?

Dê çawa bersiva serokomar û serokwezîr bihata dayîn.

Kê ev komplo çêkiribû?

Ev sedema şer bû di navbera dewletan de.

Cerga komara mezin ava bûbû, gelek komplo û êrîş dîtibû, lê îcar ne wek her car bû.

Ev skandalek, komployeke mezin bû.

Serokomar dixwest fêhm bike, ka çi qewimiye?

Çima deng hatibû birin. Wî zarokî çi kiribû?

Serokê komîteya amadekar li ber serokomar ketibû heyecanekê û dest û piyên wî dilerizîn, dê çi bigota?

Ev ne karê wî zarokî bû.

Kê ev komplo anîbû serê wan?

Ev rûreşiyek bû!

Ev komployek navnetewî bû!

Dê çi ji serokomar re bigota?

Serokomar, bi dengê hêrs û zîz:

“Çi qewimiye? Çima “Xîtab” nehat xwendin? Ev çi lihevketin e, çima gel ketiye nav hev?”

Devê serokê komîteya amadekar ketibû hev, dilerizî

“Serokê min, za za zarok... si si rûd ... ku ku kur...e e ey”

Peyvên xwe neqedand û li ber serokomar ket erdê.

Rustem, xortekî pir çeleng û jêhatî bû. Di nav malbateke mezin de mezin bûbû. Dema komara mezin hatibû avakirin, kalê bavê wî û malbata wan, li dijî projeya komara mezin derketibûn û ji bo mafên neteweyî serî hildabûn. Lê mixabin, şerê wan bi ser neketibû û mişextî Sûriyeyê bûbûn. Ji aliyê gelê wir ve, bi qedr û qîmet hatibûn pêşwazîkirin. Her çiqas gelek mirov, heval û hogirên xwe li welêt hiştibûn jî, hêdî hêdî ketibûn nav jiyaneke bextewar û aram.

Kalê Rustem, rewşenbîr û dîrokzanekî neteweperwer bû. Dûre, li Şamê bi cîwar bûbûn. Bavê Rustem, parêzerekî bi nav û deng bû. Xwe li Sûriyeyê dabû naskirin. Her çiqas bi hest û hişmendiyeke neteweyî hatibû perwerdekirin jî, ji ber îstixbarata Sûriyeyê nedixwest li ber çavan be.

Lê di mala xwe de, zarokên xwe bi nîrxên neteweyî perwerde dikirin. Xebera zarokên wan, ji dîroka wan, ji erdnîgarî û nîrxên neteweyî hebû. Ji kalê wî, pirtûkxaneyêke dewlemend mabû, ji wan re. Rustem, bi çîrokên bav û kalan mezin bûbû.

Dema wî ya pirsan bû. Her roj bavê xwe dida ber pirsan.

Rojekê ji bavê xwe pirsî :

“Bavo, gelo sirûda me ya neteweyî heye?”

Bavê wî, ji ber pirsê wî ketibû şikê, lê bersiva wî dabû.

“Belê kurê min, çawa tune ye”

Û nexwestibû zêde dirêj jî bike.

Wek li gelek deverê dinê, li Şamê jî, dibistaneke bi zimanê komara mezin perwerdehî dikir hebû. Rustem, diçû wê dibistanê. Her çiqas bi zimanê dayîka xwe diaxivî jî, ev ziman tenê di nav malbatê de dihat bikaranîn. Ji ber wê, li dibistanê wek zarokêkî Sûriyeyê dihat nasîn. Li vê dibistanê, fêrî zimanê komara mezin jî bûbû.

Rojekê mamosteyê wan got **“Zarokino, dê li Komara Mezin, olimpiyadên zimên werin li-darxistin. Ji welatê me jî dê hinek zarok herin vê Olimpiyadê. Ger hûn dixwazin beş-**

darî vê olimpiyadê bibin, bi malbatên xwe bişewirin, da ku hûn bên bijartin.”

Li ser vê pêşniyaziya mamoste, Rustem, ne bi dilê malbata xwe be jî, ji wan destûr standibû.

Ji bo olimpiyadê hatibû bijartin. Êdî bi mamosteyê xwe yê wêjeyê re, li ser zimên, dîrok û erdnîgariya komara mezin dixebitî. Mamosteyê Rustem, ji wî bi hêvî bû. Cara yekem bû ku dewleta Sûriyeyê beşdarî olimpiyadên zimên dibû. Navbera Sûriyeyê û komara mezin, vê dawiyê baş bûbû. Ji ber wê, gelek girîngî didan vê olimpiyadê.

Ne bi dilê wan bû jî, lê nexwestibûn dilê kurê xwe bihêlin, lê belê, jirgî ku Rustem biryara tevli-bûna olimpiyadê dabû, zêde nedipeyivî, carinan xilmaş dibû û tim di nav fikaran de bû. Ev rewşa Rustem, ji aliyê malbatê ve dihat şopandin, lê tu wateyek jê dernedixistin.

Diya wî, gava carinan diçû odeya wî, wek ji diya xwe hinek tiştê veşêre diket nav hinek tevdan. Lê diya wî nedixwest zêde bi ser wî de here.

Şevêkê, diya wî, bi dengê wî şiyar bû û zû çû odeya wî.

Rustem, di nav xwêdanê de û bi pest gotina:

“Min berdin, min berdin ez ê bi ser bikevim!”

Diya wî ew rakir, hembêz kir û maçî kir û got:

“Belê kurê min, em ê bi ser bikevin”

Dawiya gulênê bû, xebata wî bi dawî bûbû.

Mamosteyê Rustem, bi wî bawer bû û jê pir hêvî bû. Hatibûn komara mezin. Cara yekem bû ku, ev qas zarokên biyanî bi hev re didît. Spî, reşik, zerik, ji her rengî zarok û ciwan.

Lê tiştêkî balkêş bû ku, zarok û ciwanên amade bûn, tevan bi zimanê komara mezin dizanibûn.

Gelo ev çi sazûman bû?

Komara mezin, çima di nav tevgereke wiha de bû?

Çima di nav ev qas zarokî de tu kesî, bi zimanê wî yê dayîkê biaxive, tune bû?

Hizirî û got:

“Ez ê bi ser bikevim”

Berî wî, sirûda neteweyî ya komara mezin hatibû xwendin. Her kes li ser piya û di nav bêdengiyeke bê dawî de bû.

Dengek li stadyûmê belav bû.

“Niha, wê ji Sûriyeyê Rustem “xîtaba ji ciwanan re” ji we re pêşkêş bike!”

Rustem, di nav keskesorekê de bû.

Baskê xwe ji bayê azadiyê re vekiribû.


Di nav refên şervanên azadiyê de û bi zarokên dinê re difiriya û bi ser ketibû.

Ey Reqîp her.....



Ji avê heta axê Orlîc

Ji bo Oxûz Atay ê ku tenûra dilê min geş kir



İnan EROGLU

Şevêk nîvê şevê li Deşta Bêkesan bi çavên giyantijî, bi dilê tirsîyayî, bi jiyaneke tarûmarkirî û tevînokên jixweçûyîne ûrînî pê ket. Destên xwe li çoka xwe xist. Got “Ev dever ne cihê min e.” Û lê zêde kir “Ez ê herim cihê bav û kalan.” Kir ax û wax. Wê biçûya ku? Hîn bavê xwe nas nedikir, wê çawa cihê bav û kalan bizanibûya?

hêrî; şalekî qot ê şîn ku jinekê bi xêra xwe û dê û bavê xwe dabûyê li ser hebû. Ji ber ku şal di her carê de diçirîya, her carê jî dihat dirûtin û êdî ne cihê dirûtinê û ne jî cihê çirandinê mabû. Şal cur bi cur bi pot û capûnan hatibû pînekirin. Qazaxekî bi xêzikên reş û spî hatibû nexşîn, li ser wî bû. Milekî qazê tune bû. Quleke gilover li ser navika wî, di qazax de çêbûbû. Wî carinan tilîkên xwe di vê qulê re dikir, jî bo ku li gora dilê xwe navika xwe bixwirîne. Ji ber pêlawa xwe ya nîvqetiyayî şujik dipekiyan nav pêçiyên wî, pêçiyên wî birin dibûn. Ev pêlav kê bi xêra xwe dabûyê nizanibû. Vê dawiyê li destê xwe nihêrî. Nava nenûkên wî reş dikir, mîna qîrê bûn. Serê tilîkên wî terikîbûn. Tilîkên xwe bir di nava porê xwe yê gijol gijolî û ji ber xwêdana ku mezeloqî bûbû, gerand. Serê wî dixwirîya. Ji kîngê ve bû serê xwe bi qalibek sabûn neşûstibû. Mehek, du meh, sê meh...

Wê rojê riha xwe qusandibû, lê zû dirêj dibûn. Dixwest wê gavê çavên xwe bibîne. Çavên wî du libên zeytûnî bûn. Xwe dawêşand. Biryara xwe da, wê biçûya. Dil hebû xatir bixwesta ji hevalan, lê ew curet di xwe re nedît. Hêdî hêdî xwe tev da. Bi kîjan aliyî ve biçûya; başûr, bakûr, rojhilat an rojava? Li gor wî ew bû ku; bi kîjan helê de biçûya wê hêla din li ber xwe biketa, aciz bibûya, bingirîya û bigirîya. Ew jî ingirî. Dixwest heta jê bê nifiran li dinyayê bike. Ji nişka ve xwe bilind kir û çarmêrkî rûnişt. Her du destê xwe ber bi rûyê xwe ve bir, girt. Yê derdora wî, ji wan wiha bû ku ew diayan dike. Ji ber wê wan jî gotin amîn.

Difikirî. “Ez ê çavên xwe bigirim, lingên min, min bi ku ve bibin.” Lingên wî çol bi çol ew dibirin. Zarokekî bi bisqilê hindik mabû ku ew li ber ba

bifirîya. Çavên xwe li ber wî bayî vekir. Li hemberî wî stesyon hebû. Ber bi stesyonê ve çû. Gava gihîşt ber stesyonê tabeleyeke spîboz û mezin ber bi çavên wî ket. Li ser tabeleyê bi nivîsa reş “Stesyon Mela” hatibû nivîsîn. Pala xwe da dîwarê stesyonê. Cur bi cur mirov bi ber wî de dibihurîn; ên kor, ên sêwî, ên rûreş, ên bextreş... Çavên xwe zoq kiribû li wan dinihêrî. Gava dît ku kesekî ciwan bi ber wî ve tê xwe rast kir û li hêviya wî ma.

- Merheba ezbenî, xortê ku destek cilên fermî li ser wî.

- Merheba

- Ez Selîm. Dibêjin, Orlîc ji Oxûz xeyidiye. Bi vê keydê jî nemaye, reviyaye

-Waa!?

Ez jî li Orlîc digirim. Oxûz heta sê rojan mawe daye min. Divê ez wî bibînim. Te navê xwe negot.

Ez Orlîc. Lê hevalên min bi navê “Orlîcê Kulek” bangî min dikin.

Selîm dibêje “Tu henekan dikî. Tu li vir bisekine ez ê a niha werim.” û ji stesyonê dûr dikeve.

Wê çima bisekîniya? Di dilê xwe de dibêje “Ma ev der cihê seknê ye?” Çavên xwe li derdorê gerand. Mirovên di ber wî re diçûn bi çavên tijîtirs û pirsîyar lê dinihêrtin. Zarokên wan Orlîc bi tiliyan nîşanî dê û bavê xwe didan û di ber xwe de dikirin pistepist. Wek ji kabûsekê hişyar bibe, ji nişka ve veciniqî. Li mirovên ku li rûyê wî dinihêrtin, dinihêrî. Bişirîneke zarokane xwe li rûyê wî girt. Destê xwe ji wan re hejand.

“Ev دنیا, دنیا we ye; mirin jî ya we ye, kirin jî.”

Orlîc wî destê xwe yê ji wan re li ba dikir xist berîka xwe. Çi ket ber destê wî derxist. Bû tingetînga diravan di destên wî de. Ji berîkên wî ax û kevir jî derketin. Ax ber bi bêvila xwe ve bir, bi serê zimanan tehm kir; lê tu tehm tê de nedît.

Orlîc got “Ez herim, qet nebe hîn Selîm nehatiye.”

Çû cihê bilêtfirotinê. Bilêta cihê herî dûr xwest. Ji birêketina trêne re hîn du, sê saet mabûn. Heta trêne bi rê biketa, ji bo ku xwe bi tiştêkî biştexilîne ji xwe re listikek dît. Ew ê bi ew lingê xwe yê kulek li ser hesinê trêne biçûya û bihata.

Orlîc. Orlîcê Kulek li ser şîva hesin nikaribû bisekîniya. Carê carekê lingê wî dibû qup û ditewiya, difisiya. Li ber hewayê qerisî hesin ji cemidî bûbû. Orlîc guhê xwe bel kir, danî ser hesin. Ji binî ve bi hêdika, dengêkî dikir xîzexîz hat guhê wî. Guhê xwe yê bel ji hesin vekîsand. Rabû ser lingên xwe. Çavên wî li ber vê rewşê dibişirî; lêvên wî lê dinihêrî. Orlîc xwe bi xwe got “Şikir ji Xwedê re, şikir.” Bîsteke din dengê trêne hatê. Xwe ji ber hesin da alî. Li ber vî dengê dikir tir tir hêrs bû. Tiliya xwe ya eşhedê ber bi guhên xwe ve bir û guhê xwe girt. Bîsteke din trêne di ber wî re bihurî çû. Da dû trêne, bazda. Gava gihişt ba trêne dît ku qeptanê trêne bangî rêwiyan dike. Qeptên ji rêwiyan vê neqlê dixwaze ku rêwî li trêne siwar bibin. Orlîc çû ba qeptan, silavek dayê. Qeptên silava wî nestend, hîn bi gazîna rêwiyan ve mijûl bû. Rêwiyan êrîşî trêne dikirin. Orlîc dudil ma; biketa nav koma rêwiyan an li derveyî wan bimaya, nizanibû. Rêwî li wî şaş bûn. Wî jî li xwe nihêrî. Heq da wan. Lê vê dawiyê heq da xwe jî. Bêbiryar xwe avêt nav koma êrîşkeran û êrîşî trêne kir. Di nav mirovên êrîşker de, wek hêlekane geh di vir de geh di wir de çû û hat. Bi têkoşîneke zor û bela xwe bêhnçikîyayî avêt hundirê trêne. Selîm hat bîra wî. Wî xortê rûşêrîn bi ku ve çû!? Çima li benda wî nesekînî, bisekîniya wê çi bibûya?

Êdî li tiştêkî nedifikirî. Ma hişê wî yê fikirînê mabû ku bifikirîya? Li hêwana trêne gavên xwe dihejmart. Deriyekî li ser piştê vekirî dît. Ket hundir, sê kes dît; keçek û kurekî ciwan û jîneke navsere. Keç û kur ketibûn çepilê hev, jîna navsere jî li ba keçikê. Bi serê xwe eselamun aleykumek da wan, tenê lawik eleykumselam stend. Bi çend gavên ji xwe bawer çû xwe li paldankê bi cih kir. Hersê kesan li wî dinihêrtin, wî jî li erdê dinihêrî. Gava bala xwe da wan, ji tevger û pêvçûna wan fahm kir ku; her du ciwan nuh desgirtî bûne û jinik jî xwesûya zavê ye. Jinik bi çavên tijî pirs ji Orlîc dipirse:

Tu çi karî dike lawê min?

Ez revok im.

Revokê çi!?

Revokê ji ber destê Oxûz

Jinik fêhm nake dibêje çi, lê wek ku fêhm kiribe pê re pê re serê xwe dihejîne.

Orlîc. Orlîcê Kulek. Orlîcê ku li Deştê Bêkesan

tikîtenê mabû, cihê ku wê here xeyal dike. Orlîcê ku ne bavê xwe dîtibû, ne jî kalê xwe... Orlîcê ku bi bêhna şîrê dêya xwe nizanibû. Orlîcê gerok yê ji ber revokan. Orlîcê ku a niha xwe li paldankê dirêj kiribû û pala serê xwe spartibû şîbakeya qeşagirtî û seqemgirtî, li xwe heyirî mabû. Lê ev ne heyirîneke ji rêzê bû. Gelo, ev çi çîrok bû hatibû serê wî? Wê çîrok çawa dom bikira û çawa biqediya. Ev bûyerên dihatin serê wî, qedera wî bû yan qedera wî ji destê yekî din dihat dihat xêzîkirin? “Ev ne xewneke xapînok be, ji roj de?”, ji xwe pirsî Orlîc. Çavên wî girtî, li ser riyekê zirav diçe, keçikek di ber re, pêlava wî ya qetik qetikî diçike nav qîra ku ji ber germaya rojê bûye pelûl. Gazî keçikê dike; “keçê ha keçê, bi qurbana te bim keçê, agir bi mala te nekeve keçê, jîyan ne bi zor e, bi dor e, li vir mame pelûl, tu bi dengê xwe qîrê bihejîne, bi lingê xwe erdê biqelişîne, lê tu were, were min li vir nehêle keçê.” Keçik diçe û hey diçe, ew bangî dikê. Dihele dibe pelûl. Dibe finda li ber serê Zînê. Lê çav dide dû rêça keçikê.

Gava hat ser hişê xwe serê wî tevîzibû. Serê xwe jî şîbakeyê vekîsand. Bi wan tilikên xwe yên nenûkqirêj paş serê xwe xurand. Bala xwe da her sê kesan. Ew sê kes hîn jî li ser zewacê bi hev re dişewirîn. Qurpînî ji tilikên xwe anî, qurp qurp... Ji hundir derket ber bi tuwaletê ve çû. Derî li ser piştê vekiribû. Çawa ket tuwaletê derî li ser xwe kilît kir. Hilmegulma tuwaletê kişand pozê xwe, ji pozê xwe jî bir li nava xwe gerand û kêlikêkê di kezêba xwe de hişt. Hilma xwe wexta berda rihetiyekê xwe li wî girt;

Ox û ax, çi xweş bû!

Çend deqeyan di tuwaletê de ma. Ne mîz kir, ne jî tiştêk din. Ji tuwaletê derket, ber bi odeya xwe ve çû. Vê carê kes nedît. Dîsa bi heman gavên ji xwe bawer çû xwe palda. Serê xwe spart şîbakeyê, pişt re jî dest avêt zilamtiya xwe û li ser gerand.

Bi gerandinê re di xew re çû. Bi azana dîkên qoqo re hişyar bû. Mîna kevir hişk bûbû. Stûyê wî ketibû ber wî, nikaribû xwe tevbileqanda. Stûyê wî weke ku meriv sîxikan tê re bike, dişewitî. Çend deqeyan wiha ma û bi şûnde ev êş li xweşiya wî çû. Rûyê wî bişirîneke sivik wergirt. Serê xwe jî şîbakeyê vekîsand. Serê xwe jî şîbakeyê derxist, li gund nihêrî. Ew gund çû, gundekî din hat. Dengê mele, dengê dîkên qoqo. Çol û bi çol çûn, beyar û bi beyar çûn, qelaç û bi qelaç çûn. Sê saetan wiha çûn. Piştî sê saetan, trêne bi dengêkî ku sefête meriv dibe sekinî.

Ew jî trêne daket. Bala xwe da stesyonê. Li ser vê tabeleyê “Stesyona Xanî” bi hin tîpên

xwarowîçko hatibû nivîsîn. Şîrşira avê li ber guhê wî ket. Ber bi vî dengî çû. Ev şîreşîr ji kaniyeke xerabe, xirxope û zengirtî dihat. Bi şelpeşelp av şelpişand ser rûyê xwe û bû qurtequrta wî, av vexwar.

Gava ji stesyonê bi dûr ket li pêşberî xwe du zîlam dît; yekî navsere, yek jî kal bû. Bi aliyê wan ve çû. Ji wan pîrsî:

Xalo ev der ku der e?!

Ev der Amed e xwarziyê xalê xwe. Ez jî Bavê Tûrgût im. Ev jî -zîlamê kal nîşan dide- bavê min, Bavê Siyo ye. Amed; cihê bav û kalan, cihê dostik û birakan e.

Orlîc, li mînbusekê siwar bû. Ji sîmsêr re got, min bibe cihê herî dûr. Wî birin cihê herî dûr. Li nava bajêr geriya. Gava hat geraja dolmîşan sekinî, ji wan kesên li wir re got; "Min nebin cihê bav û kalan, min bibin..."

Ew li dolmîşa Bismilê siwar kirin. Di dolmîşê de taqet nekir, dilê wî li hev diket. Ev ji kîngê ve ji qurtek av û pê ve tiştek di gewriya wî re neçûbû xwar. Li ber xwe da, ji xwe re çêr kir ji bo ku venerîşe. Lê bi xwe nikaribû. Serê xwe ji şibakeyê derxist, kir iq û verişiya. Tehmeke tîrş û tehlokî xwe li arîka wî girt.

Gava dolmîş wî gihîşt ber Çemê Dicleyê, ji ajovan xwest ku li cihekî musaît bisekine. Ji dolmîşê peya bû, bi hêla çem ve çû. Li wir sê çar zarokan torên destên xwe diavêtin çem û masî zevt dikirin. Gava di ber zarokan re bihurî, zarokan çend cara jê re gotin "Pîço!" Belê, xwe pîç didît û wê her wiha bidomiya.

"Li vî bajarî şevê dikim tor, nîkê jî stêrk"

Çû ser tehtan. Berê xwe da çem û weke ku tinazê xwe bi çem bike, wiha awir dayê. Çend riste qîrînên Feqî li ber guhê wî ket. Dilê wî nerm bû. Ji deşteke hatibû û wê ji deşteke biçûya. Wê xwe li vî çemî bixista, çawalêhato. Ma tiştek ji vî xwestir heye gelo!? Digot "Madem ez ji axê çêbûme, ez ê bi avê jî wenda bibim. Bifikire, mîna masiyekî..." Gazî zarokên li wir kir:

-Haho zarokino! Ev dinya, dinyaya we ye; mirin jî, kirin jî"

Jêrenot: Orlîc beriya ku xwe di Çemê Dicleyê de bixeniqîne, jê wiha bû ku; bi xeniqîna wî re dê çîrok jî bi dawî bibe lê fêhm nekiribû ku çîrok hîn jî didome...Didome...

Fêkiyên demsala kenê



Berfo BARI

Ji nava lêvan fir dibû
Fêkiyên di demsala kenê te de gihîştî
Di mesîlên kûr ên çiyayên Egeyê de
Bi tiq û tenê!

Û deriyên wan li ser piştê vekirî
Li benda aştiyê bûn
Wê kurên wan ên li Kurdîstanê leşker
Tê de derbasî menzela zavatiyê bibûna

Me li derê yekem da
Hêjîr rijîn ji dil
Derê duyem
Gûşiyek tirî
Derê sêyem
Hinarek
Deriyê çaran
Libên reşqeytan zeytûn
Rijîyan ber dilê me
Fêkiyên di demsala kenê de gihîştî.

Hezkiriya nejimartî

Heinrich BOLL
Wergêr: Salih BADILÎ

Wan lingê min veherandin û peywireke, ku bi rûniştî bikaribim pêk bînim, dan min. Min dê mirovên ku di pira nû re derbas dibûn, bijimarta. Ev yek wan kêfxweş dike, dema ku behreya xwe bi jimareyan qeyd dikin: Ew bi vê bêwateyiya vala ya ku ji jimareyan pêk tê, bengîn dibin.

Ez bi devê xwe yê bêdeng mîna demjimêreke li darxistî hejmaran bi ser hev de dicivînim, da ku êvarê serkeftineke ji hejmaran pêkhatî arasteyî wan bikim. Rûyê wan dibiriqe, hejmar çiqas zêde be kêfa wan ew qas zêde dibe û êdî sedema wan heye ku bi dilxwazî têkevin nav nivînên xwe; ji ber ku nizam îro çend hezar mirov di ser pirê re derbas bûne.

Lê îstatîstîka wan ne rast e. Mixabin ne rast e. Her çiqas ez çavdêriyeke bi rûmet û şiyar dikim jî, ez mirovekî pênebawer im.

Bi dilxwaziyeke nepenî carinan ez li ser hejmarekê rûdiniştim, carinan dema dilovanî diket ber dilê min, min cotek hejmar diyarî wan dikir. Serfîraziya wan di destê min de ye. Dema ez biqehiriyama cixare tune bûya, min encameke ji rêzê dida wan. Û carinan jî di bin navînciye de...

Ger dilê min lê bide û ez kêfxweş bim, ez xweşbîniya xwe bi hejmarên pêncreqemî bi ser wan de diherikînim. Ew bi vî awayî dilşad in; serê carê ew encamê zûka ji destê min digirin û çavên xwe li ser digerin û destê xwe li piştê min dixin. x

Belê tu tişt bala wan nakişîne! Piştê dest pê dikin: Hejmaran li hev dixin, ji hev derdixin, dabeş dikin: Nîşeya wê ya sedane derdixin holê; nizanîm çima? Dihesibînin, ka di deqîqeyê de çend mirov di ser pirê re derbas bûne û deh sal şûnde dê çend mirov derbas bibin.

Ew ji dahatûya duyemîn hez dikin. Dahatûya duyemîn qada wan a taybet e. Lê belê sed mixabin, encam seranser xelet e.

Dema hezkiriya min a biçûk tê ser pirê -ku rojê du caran tê- wê demê dilê min tavilê disekine. Heta ku ew di rêwarê re diqulibe û wînda dibe tepîniya bêrawestan a dilê min disekine û hemû bûyerên ku di vê demê de diqewimin, ez ji wan vedişêrim. Ev her du deqîqe yên min in, bi temamî yên min. Ez nahêlim ji min bistînin.

Gava ew êvarê cardin ji bestenîfiroş tê - di vê navberê de ez dizanim, êdî ew li ba bestenîfiroş dixebite - an jî ew di ber devê min î bêdeng ve di aliyekî din re derbas dibe, heta ew ji ber çavên min

diquilibe, cardin dilê min disekine û ez dev ji jimar-tinê - divê ku ez bijmêrim- berdidim. Û ew ên ku xwedî şens in, di vê navberê de di ber çavên min ên kor re qor bi qor derbas dibin û heta bi hetayê ji ber hejmarên îstatîstîkê difilitin; jin û mîrên ji siyê û tiştên razber pêkhatî ji ber encamên paşeroja duyemîn difilitin.

Belê, kifş e, ez ji wê hez dikim. Lê ew nizane û ez naxwazim ew pê bihese. Divê haya wê jê nîn be, ka kîjan hesabên mezin tevlihev kir, divê xwe bê xem û bê guneh hîs bike. Bi porê xwe yê qehweyî, bi gavên xwe yên nazenîn ber bi bestenîfiroş ve bi-meşe. Çav lê ye ku gelek bexşîş bistîne. Ez ji wê hez dikim; ev gelekî berbiçav e da ku ez ji wê hez dikim.

Demekê berê wan ez ceribandim. Hevkarê min ê ku li aliyê din rûdinişt û diviyabû ku erebeyan bijimêre, ez zûtirê şiyar kirim û min çavên xwe beloqandin. Min mîna dînan jimart; ku jimêrkerek nikare çetir bijimêre. Îstatîstîkvanê payebilind li aliyê din, li jorê sekinî û piştê encama saetekê bi encamên min re da ber hev.

Bi tenê çend libên min kêmbûn. Di wê navberê de dilketiya min a biçûk derbas bûbû. Di jiyana xwe de min tu carî ev keça bedew nexist nav paşeroja duyemîn, da ku delaliya min neyê komkirin, parvekirin, jêderxistin û nebe mijara nîşeya nizanîm ji sedî çendan. Ez ji hevkarê xwe re, yê ku divê erebeyan bijimêre spasdar im.

Wî ez şiyar nekirima min dê delaliya xwe jî bi mecbûrî bijimarta û dilê min dê birîndar bibûya. Niha mijar paşeroja rewşa min e! Îstatîstîkvan destê xwe li piştê min xist û got: Da ez mirovekî çê, pêbawer û dilsoz im. "Di saetekê de libek şaşî ne zehf e. Em bi zanayî ji encamê, ji sedî çend liban davêjin. Ez dê pêşniyar bikim, da ku tu êdî erebeyan bijimêrî Fayton ji min re kewên di çeltik de ne. Fayton rûn û hungiv in. Ku heta niha nehatibû serê min. Herî zêde di rojê de bîst û pênc erebe derbas dibin. Tu dikarî nîvsaetê carekê yekê di hişê xwe de bigirî. Ev şîr û şerbet e!

Fayton ji min re tiştêkî nedîtî ne, di navbera çar û heştan de bi ya min be tu erebe derbas nabin, Hingê ez dikarim herim gerê yan jî ber dikana bestenîfiroş. Dikarim dûr û dirêj li wê binihêrim an jî evîndara xwe ya biçûk heta çend caran ber bi mala wê ve bibim.

Sfînksa bê raz

Oscar WILDE

Rojekê piştî nîvroyê ez li Cafeya de la Paixê rû-nîştibûm, min vexurka xwe fir dikir û li jiyana parî-siyan a sefil û semyandar temaşe dikir û li ser bergeha ecêb a xirûr û xizaniyê ku li ber min diborî diramiyam, min bihîst ku yek gazî min dike. Min bala xwe dayê û min Lord Murchison dît. Em li za-nîngehê bi hev re bûn lê piştî zanîngehê hema bêje deh sal bûn ku me hev nedîtibû, loma ez kêfxweş bûm ku dîsa leqayî wî hatim û me ji dil û can bi destê hev girt. Li Oxfordê em hevalên pir baş bûn, gelek kêfa min ji wî re dihat, ew gelek çeleng, bi kêf û gelek bi şeref bû. Me hîna xwe girtibû ku em ji wî re bêjin ew ê bibe baştirînê hevalan, ku her dem rastiye nebêje, lê bi rastî zêdetir ji ber duristiya wî em heyranê wî bûn. Min dît ku ew gelek guheriye. Ew bi endîşe û hişê wî tevlihev dixuya û der barê tişteki de bi guman dixuya. Min hîs kir ku ev ne şikberiyê nûjen e, ji ber ku Murchison alîgirekî xurt ê partiya muhafezakar bû û wî ji Tewratê bawer dikir, her wekî ku ji Kameraya Lordan bawer dikir; loma min fêhm kir ku ew jinek bû, min jê pirsî ka ew zewiciye yan na?

Got:

Ez zêde ji jinan fehm nakim.

Min got:

Gerald, ezîzê min, jin ji bo hezkirinê ne, ne ji bo fehmkirinê.

Got:

Li ciyê ku ez pê ne ewle me, nikarim hez bikim.

Min got:

Ez bawer im di jiyana te de razek heye, ka ji me re bêje.

Got:

Em li erebeyê siwar bin, ev der pir qerebalix e. Na, bila erebeya zer nebe, rengêkî din be, ya li wir, ya keska tarî baş e.

Di nav çend xulekan de em bi lez di kolanê de ber bi Madeleine berjêr diçûn.

Min got:

Em ê bi ku ve biçin?

Got:

Tu ji ku derê hez bikî! Em biçin restoraneke li Boisê; em ê li wir şivê bixwin û tu yê ji min re hemû tiştên der barê xwe de bibêjî.

Min got:

Ez berê dixwazim der barê te de bibihîsim. Ji min re raza xwe bibêje.

Ji berîka xwe qutiyeke biçûk a çerm a qulpzivîn deranî û dirêjî min kir. Min qutî vekir. Di hundirê wê de wêneyê jinekê hebû. Ew zirav û bejindirêj bû û bi çavên gir ên ximamî û bi porê vekirî dîmeneke wê ya ecêb hebû, dirûvê medyûman lê dixist û kur-kekî buha li xwe kiribû.

Got:

Tu çi difikirî derbarê vî rûyî de? Ev durist e?

Min bi baldarî lê nihêrî. Wisa dixuya, rûyê ke-sekê ye ku razeke wê heye, lê ez nikarim bibêjim ev raz bed bû yan baş bû. Ev rindî rindiyêke wisa bû ku ji gelek razan pêk hatibû. Rindiya li ser rû de-rûnî bû, ne plastîkî bû û kenê zeîf ê ku tenê li ser lêvan bû bi zorê dihat dîtin, bi rastî ji şîrînbûnê dûr bû.

Bê sebir got:

Baş e, tu çi dibêjî?

Min got:

Ew Mona Lîsa ye ku şîr girtiye. Bihêle ez her tiştê wê hîn bibim.

Got:

Ne niha, piştî şivê û dest bi sohbeta tiştên din kir.

Dema ku berkar qehweya me û cixareya me anî, min sozê Gerald anî bîra wî. Ew ji sendeliya xwe rabû, du, sê caran di odeyê de çû û hat û xwe berda ser palgehekê û çîroka jêr ji min re got:

“Êvarekê ez katjimêr li dora pêcan di Bond Street de berjêr diçûm. Qezayeke trafikê hebû û trafik hema bêje rawestiyabû. Nêzî peyarê erebeyê zer a biçûk sekinîbû, ji ber sedemekê yan jî tişteki din, bala min kişand. Dema ez di wir de derbas bûm ji hundir rûyê ku min îro piştî nîvroyê nîşanî te da dinihêrî. Di cî de ez efsûn kirim. Ew şev heta serê sibê û dotira rojê heta êvarê li ser wê ramiyam. Ez li ser vê riya hejar çûm jor û hatim jêr, min bi baldarî li hundirê hemû erebeyan nihêrî û li hêviya erebeya zer mam; min nikaribû ez jinika dîl-ber a xerîb bibînim û di dawiyê de min got ew tenê xeyalek bû. Bi qasî hefteyekê piştî vê min û Ma-dame de Rastailê ji bo xwarinê hev dît. Şiv saet di heştan de bû. Lê heta saet heşt û nîvan em hê li salonê bûn. Di dawiyê de qewraşê deriyê vekirî tehn

da û navê Lady Alroyê got. Ew jinika ku ez lê digeriyam bû. Ew pir hêdika hat hundir, di nav tentenê cûn de mîna roniya hîvê dixuya, divê min ew vexwenda maseyê, ez bi vê kêfxweş bûm. Piştî em rûniştin min hêdika û bi mesûmî got, "Ez bawer im demek berê min tu li Bond Streetê dîtî, Lady Alroy." Wê reng avêt û hêdika ji min re got, "Rica dikim wiha bi dengê bilind xeber mede dibe ku li te guhdarî dikin." Ji ber vê destpêka bed min xwe reben hîs kir. Ez bê hay ketim nav listikeke frensî. Ew pir hindik axivî, tim bi dengêkî nizm ê muzîkî axivî û te digot qey ditirse ku yekî lê guhdarî dikir. Ez bi coş û ehmeqî bûm evîndar û atmosfera ximamî ya razdar ku dor lê pêça bû meraqa min a bi coş anî kelecane. Dema ku dê ew biçûya, piştî şivê pir hindik sekinî, min pirsî ku dikarim têlî wê bikim an wê bibînim. Ew bi qasî xulekekê dudilî ma, bala xwe da der û dorê ka li nêzî me kes heye yan na û piştê got, "Erê, sibê di çaryek kêma pênçan de." Min lavayî Madame de Rastailê kir ku derbarê wê de hinek agahiyên bide min; lê hemû tiştên ku min karibû hîn bibim ew bû ku ew jinebiyek bû û li Park Laneyê xaniyekî wê yê xweşik hebû û weke çenebazekê dest pê kir got ku jinebî nîşanên herî saxlem ên zewecê ne, ez derketim û çûm malê."

"Roja din ez di demê de gihîştim Park Laneyê, lê xizmetkarî got ku aniha Lady Alroy derket. Ez pir şaş bûm û bi moraleke xerab û xemgîn berjêr daketim çûm kulûbê û piştî ku ez demeke dirêj ramiyam min nameyek nivîsî, jê pirsî gelo ez dikarim piştî nîvro yeke din jî şansê xwe biceribînim. Heta çend rojan min tu bersiv negirt lê di dawiyê de nîşeyeke biçûk gihîşt destê min ku dibêje ew ê roja yekşemê demjimêr di çaran de li malê be û digel vî notê balkêş: "Ji kerema xwe careke din ji min re nenivîse wê navnîşanê; dema ku ez te bibînim ez ê ji te re vebejîm." Roja yekşemê ez bûm mêvanê wê, gelek şîrîn û cazîbedar bû; lê dema ku ez rabûm wê lavayî min kir, ku careke din pêwîst bû ez ji wê re binivîsim, divê bişînim wê navnîşanê "Mrs. Knox, care of Whittaker's Library, Green Street." Got, ji ber hinek sedeman ez nikarim nameyan li mala xwe bigirim."

"Me gelek caran hev dît û atmosfera razê hêç ew terk nekir. Hinek caran min got ku li ber zordestiya mêrekî ye, lê wisa dîrîdest dixuya ku min bawer nedikir tu kes dikare bi wê re hevaltiyê bike. Ev bi rastî ji bo min pir dijwar bû ku bigihîjim encamekê, ji ber ku mîna wan krîstalên ecêb ên li muzeyan tên dîtin ku xulekekê dibiriqin û ya din ximamî ne. Di dawiyê de min biryar girt ku jê re bêjim ez dixwa-

zim pê re bizewecim: Ez ji esrara ku di her hevdîtî de nîşanî min dida bêzar û westiyabûm. Min ji wê re li pirtûkxaneyê nivîsî ku gelo ew dikare duşemîya bê saet di şeşan de min bibîne. Wê got erê û ez ji kêfan difiriyam. Digel kîna razê, ez aşîqî wê bûm. Ez piştê ramiyam, di encamê de, ez niha dibînim. Na; ew jin bi xwe bû ku min jê hez dikir. Razê ez aciz kirim, ez dîn kirim. Çima wê sihûdê ez xistim wê rêyê."

Min got:

-Te tê derxist, piştê?

Got:

-Ditirsim ku na. Tu dikarî bi xwe biryarê bidî.

"Duşemê ez bi apê xwe re çûm ji bo firavînê û li dora katjimêr çaran min xwe li ser Marylebone Roadê dît. Apê min, tu zanî, li Regent's Parkê dijî. Min dixwest biçim Piccadillyê, di gelek riyên hejar re kurterê çûm. Ji nişka ve min li pêşiya xwe Lady Alroy dît, ser çavên wê bi xêlî bû û pir zû bi rê ve diçû. Bi gihîştina xaniyê dawîya kolanê re li nêrde wanê derket, mifteya derî deranî, derî vekir û ket hûndir. "Raz li vir e" min ji xwe re got; min lez kir û bala xwe da xanî. Şêla xaniyekî ku odayên kirêkirinê tê de hene pê diket. Desmala wê li ser şemîga derî ketibû. Min rakir û kir berîka xwe. Paşê ez fikîrîm divê çi bikim? Ez gihîştim wê encamê ku mafê min tune ye wê bişopînim û ez berjêr çûm kulûbê. Di şeşan de ji bo ku wê bibînim çûm. Digel cilên rengzîvîn û bi hinek madalyonên ecêb ên ku her dem li xwe dikir li ser somyayê vezeliyabû. Gelek şîrîn dixuya.

Got:

Ez pir kêfxweş im ku min tu dîtî. Ez îro derneketim derve.

"Min matmayî li wê nihêrî û min desmal ji bêrîka xwe deranî û dirêjî wê kir û min hêdika got:

Te îro piştî nîvro ye ev li ser Cumnor Streetê xist, Lady Alroy.

"Wê bi tirs li min nihêrî, lê ji bo ku desmalê bigire tevnegeriya. Min pirsî:

Te li wê derê çi dikir?"

Got:

Çi mafê te yê pirsînê heye ji min?

Min got:

Mafê mêrê ku ji te hez dike; ez hatim vir ku ji te re bibêjim ez dixwazim tu bibî jina min.

"Wê rûyê xwe di nav destê xwe de veşart û hêstir ji çavên wê barîn.

Min got:

Tu divê ji min re bibêji.

"Rabû ser piyan, li nava çavên min nihêrî û got: Lord Murchison, tiştêkî gotinê tune ye ku ji te re

bibêjim.

Min kir qîrîn:

Tu çûyî ku yekî bibînî. Ev e raza te!

“Çilka xwînê li ser rûyê wê nema û got:

Ez neçûm ku yekî bibînim.

Min got:

Tu nikarî ji min re rastiye bibêjî?

Got:

Min got.

“Ez dîn û har bûm; min nizanibû ku ez çî dibêjim, lê min tiştên sosret ji wê re gotin. Di dawiyê de ez bi lez ji malê derketim. Wê, roja din ji min re namemek nivîsî; min nevekirî lê vegeand û digel Alan Colville ketim riya Norwêcê. Piştî mehekê ez vege-riyam û tiştê ku min ewil di Morning Post de dît xebra mirina Lady Alroyê bû. Wê di Operayê de serma girtibû û ji ber pişikê di pênc rojan de miribû. Min derî li xwe girt û tu kes nedît. Min gelek ji wê hez dikir. Xwedêyo! Min çiqas ji vê jinikê hez dikir!”

Min got:

Tu çûyî mala wê kolanê?

Got:

Erê.

“Rojekê ez çûm Cumnor Streetê. Min bi xwe nikaribû, ji şik û gumanê min êş dikişand. Min li derî xist û jineke rêzdar derî vekir. Min ji wê pirsî ku odeya kirêkirinê heye yan na.

Got:

Belê ezbenî. Ev ode divê bîn kirêkirin, lê ev sê meh in min xanim nedîtiye û li ser wê hatine kirêkirin.

“Min wêne nîşan da û got:

Ev xanim e?”

Got:

- Erê, kîngê ew vedigere, ezbenî?

Min got:

Jinik mir.

Got:

Ax, ezbenî, Xwedê neke! Ew qencîrîn kirêkera min bû. Tenê ji bo ku hinek caran li odeyê rûnê di heftê de sê guinea dida min.

Min pirsî:

Wê li vir kes didît?

“Lê wê bi min da bawerîkirin ku tiştê wisa tune bûye û ew her dem tenê hatiye û wê tu kes nedîtiye.

Min got:

Lê wê li vir çî dikir?

Got.

- Bi piranî ew li salonê bû, ezbenî û pirtûk dixwend û carinan çay vedixwar.

“Min nizanibû çî bibêjim, min sovereign ek da wê û derketim. Niha, tu çî dibêjî? Tu bawer nakî ku jinikê rastî digot?”

- Ez bawer dikim.

- Lê çima Lady Alroy çû wir?

“Geraldê delal” min got, “Lady Alroy jineke manyaqê razê bû, ev ode ji bo wê sedemê kirê kiribû ku bi xêliya xwe biçe wir û xeyal bike ku ew qehremanek e. Rewşeke wê ya veşartî hebû lê bi rastî ew Sifinkseke bê raz bû.”

Tu bi rastî wiha difikirî?

Min got:



Ez ji vê bawer im.

Wî qutiya çerm deranî û vekir û li wêne nihêrî, got:

-Gelo?...

Ji inglîzî werger:

Evdilayê DEWRÊŞ





Amadekar: **Elîxan LORAN**

✎ Ayîngeh û mabeda siyasetê edebiyat e
Medenî FERHO

✎ Şoreşa wêjeyê ↔ wêjeya şoreşê!
Sîdar JÎR

✎ Wêjeya kurdî û polîtîka
Berken BEREH

✎ Wêjeya polîtîk
Sînan SUTPAK

✎ Têkiliya wêje û polîtîkayê
Fatma SAVCI

✎ Wêje, polîtîka û pêwendiya nivîskarên kurd
Çiya MAZÎ

✎ Jiyan yekpare ye
Feratê DENGIZÎ


✎ Di wêjeyê de siyaset
Îsmail DÎNDAR

Hinek mijarên wêjeyê yan jî têkildarî wêjeyê her tim bûne qada nîqaşê. Dem bi dem nîqaş sar bûbin û ji rojevê derketibin jî, bi demê re careke din derketine holê û wek pirsekê di hişê mirovan de bi cih bûne û paşê daketine qada giştî û nîqaş gur û geş bûne.

Têkiliya wêje û polîtîkayê jî bi vî rengî ye. Ji gelek hêlan ve hatiye nîqaşkirin û hîna jî tê nîqaşkirin. Ji bo me kurdan jî rewş wihan e. Ji ber pêdiviya navxweyî yan jî bi bandora cîranan em vê nîqaşê dikin. Ev mijar wek birîneke ku biaxeve, her tim xwe nû dike. Sedom jî ev e; wêje kar û hewldaneke civakî ye. Têkildarî pirs û gelemşeyên civakî ye. Ji ber ku pirsgerêkên me yên civakî çareser nebûne, nîqaşên me yên bi vî awayî jî bi encam nabin an jî encamên ku dertên holê ji aliyê her kesî/ê ve nayên peji-randin.

Tevî ku me dizanibû dê ev nîqaş bi dawî nebin û tiştên ku dê di dosyeyê de bîn gotin jî, dê ji aliyê her kesî ve neyên peji-randin, çend nîfşên din jî dê heman mijaran nîqaş bikin jî, me dîsan jî ev mijar girt dest. Em hêvîdar in wekî meselaya bihevhesan-dina diz û xwediyê malê, ev her du hebûn -wêje û polîtîka- rojek berî rojekê bi hev bi-hesin.

Ayîngeh û mabeda siyasetê edebiyat e



Medenî FERHO

Pîvana şaristaniyê ne tenê pirtûk e, ne tenê gotin û felsefe ne. Ne tenê mîmarî, kolan û binesazî ne; aheng e, disîplîn e, kolektîvîzm e. Li dijî xwezayê serîhildan e. Lewma dibêjin ku dergûşa hişmendî û hewngîriyê li bajaran e. Ev tê wateya qîrîna wekhevîya mirovahiyê. Ev navê ronakbirî û entelektueliyê ye. Dema ku siyaset dikeve navberê û entelektuel û ronakbîran di tara bêjîngê de dîl digire, şaristaniya bê ronakbîr û entelektuel jî nikare 'sfenskên' Xwedawendî biafirîne.

Desthilatdariya ku tu caran naxwaze muxalefet û hemberan erê bike, mixabin di riya cihanşumûliyê de, hewl dide ku van baskan tevan bike amûreke ji hêza xwe. Ji bo vê jî her dem serî li têkbirina "Nas" an daye.

Ev jî bûye sedema gotina ku; edebiyat û desthilatdarî "zîd"ê hev in. Li hemberî ku siyaset wek zannistekê pêş ketiye û wek hunerekê tê binavkirin jî, nehîletê edebiyatê ye.

Siyasetmedar jî, nehîletê nivîskar e û her dem edebiyatê dipelîxîne, nivîskaran jî nîvsaxî dike. Li welatên weke Rojhilata Navîn jî, nivîskar û edebiyat hatiye xesandin û desthilatdarî jî bûne "atêş-î sûzan."

Siyaset jî wek aşûfteyeke li ser sê wêrisên di navbera du spîndaran de hatiye girêdan, dilîze. Canbazî û şeqlubaniyê di hûrê xwe yê deryayî de vedişêre.

Pêdiviya siyasetê bi gotinê heye û gotin şûrê herî dijwar e. Gotin, eger rast were bikaranîn, nenasîn û reda otorîteyê ye.

Lê, siyaset otorîte ye û gotinê bi kar tîne. Doh jî îro jî, otorîteya hukumranî, gotin kiriye "Asayê Mûsa." Cih, cihan kiriye şûr û mertal. Şûr û gotin dest û birakê hev ên jîyanê ne. Hukumranan, pêşî bi gotinê dest bi şer kirine; piştê jî bi şûran otorîte hejandine. Otorîteyên ku "gotin" bi kar anîne û piştê dest bi siyasetê kirine, serî li "şaristaniya aksiyonê" nedane. Ji ber ku şaristanî û aksiyon dengeyê sererast nakin. Aksiyon matematîkî ye,

gotin li derveyî matematîkê kar dike. Aksiyon, navbera dirok û mekan bipêve jî, nikare xelesa girêdanî çêbike. Lê gotin, ronahiya demê zemt dike û zerkî paşerojan -sibe, dusibe û sêsiibe- dike. Yanî wê valahiya ku matematîk danagire, dadigire.

Bi gotineke din; gotin dîplomasiya dirokê ye. Lewma em dibêjin, edebiyat, terbiyekirina siyasetê ye.

Mînakên balkêş

Di seyra dirokê de, mînaka herî baş Mûsolînî ye. Mûsolînî yek ji kesên ku herî baş, serî li listikên fesadî yên Makyawelîstî daye ye û "şoreşa ahlakî û hişmendiyê" bi hev re daye dest pê kirin e. Wek bîrdozekê jî daye qebûlkin.

Di vê bîrdozê de, "nîfşê saf" dixwaze. Vê daxwaza xwe ya bêqidoş û rezîl, di demeke kin de, weke nexweşiyekê li tevahiya Ewrûpayê belav dike. Di nava demeke kin de, bi axaftin û pexşanên xapandinî, yanî bi cambaziya aşûfteyî, jinên Îtalyayê tev kiriye nîfşê ku tenê zarokan bînin, li malê binêrin û xwarinê çêbikin.

Piştê, jî wan jinên ku li malê dîl girtiye, artêşeke karkeran derxist holê.

Mûsolînî jî, Hitler jî, "guhertineke organîk" pêkânî û komên xelkê di nav bextreşîya kujerî de ferfîandin. Li Ewrûpayê, ev demjiyan wek bûyereke ku "hût; heyvê yan jî rojê biqurpînê" ye. Îro li Kurdistanê, siyaseta fermî ya Tirkîyeyê, heman îdeolojiyê bi riya parlamentoya li ser bingeha "6 tîran" hatiye avakirin, dimeşîne. Di demên dawîn de cemaetên olî jî ketin nava vê tevgera kujerî û dixwazin destîniya bextreşîya li dijî kurdan bidomînin.

Guman dikim ku faşîzm, sîstema herî baş a cuda-tiya ku wek "reş û spî" di navbera siyaset û edebiyatê de xuya bike, ye. Ev sîstemên din, piranî piştî şerê duyemîn ê cihanê, di çarçoveya "perwerdehiya neteweyî" de, edebiyat kirin maşîka destên xwe.

Bi vê mebestê mirov dikare bibêje ku, "otorîteya baweriyê" edebiyat berteref kiriye. Lewma Îbnî

Haldûn, ji bo desthilatdaran gotina “atêş-î sûzan” bi kar tîne û ji ber wan jî direve. Mînakê Şahnameya Firdewsî jî, “zewaca fihûşê ya bi desthilatdariyê” re ye. Firdewsî, Destanê Rustemê Zal, nêzikî 1000 çarînan di Şahnameyê de bi cih dike û ji bo berjewendiyên xwe, ligel tacîdaran bi kar tîne. Lê, Mîrza Kazimî Hemedanî destana “Gul û Bilbil”, yan jî Ehmedê Xanî Mem û Zîn, ji bo berjewendiyên gelê xwe nivîsî ne. Yanî du, sê mînakên di yek mêzînê de, lê bi qasî çiyayan ji hev cuda... Şahname hîleya siyasî ye, Gul û Bilbil, yan jî Mem û Zîn afirgeriya ji xweliya xwe ye.

Ha li gorî vê; îro edebiyata kurdî, di ber şibakeya hiyerarşiya faşîzmeke veşartî de ye. Li dijî edebiyata kurdî, çeka bazarê, çeka aboriyê, çeka gotinê, çeka polis, çeka burokrasiyê, çeka saziyan, çeka olê, çeka siyasî û çeka dadê tê bikaranîn. Dagirkeran bi van çekan, cîhana kurd dorpêç kiriye, edebiyata kurdî bi giştî kultura kurdî dîl girtine.

Bi vê pîvanê, kultura kurdî, edebiyat û zimanê kurdî, di bin tehdîdeke dijwar de ye. Nîqaşên li ser siyaseta û edebiyatê, nîqaşên li ser béalîtiya nivîskar û rewşenbîriyê, hinekî “Tezad” in û xwendina “Serazad” an e.

Wek listikekê jî xuya dike. Di şerê neteweyî de, di têkoşîna azadiya kurd de, her nivîskar, her ronakbîr, ne mîna Byron be jî, herî hindik bi qasî Rabalais ê ku dibêje; “Ez evîndarê rastiyê me, lê heta ber bi sêdara dardekirinê”, li “vijdan-î hibriye” xwedî derbikeve ye. Ev berpirsiyarî û binbariyeke dîrokî, cografî, çarenûsî, hişmendî û ademî ye.

Divê ku neyê jibîrkirin, di cîhana global de, kultureke global wê were afirandin û wek kultura populer jî, bi riya teknolojiya pêşketî ya ragihandinê, wê bandoreke mezin li kultura cîhanê bike.

Ev tê wateya ku nîrx û pîrozîyên gelan di bin tehdîdeke mezin de ne. Bê guman ev metirsiyeke tofanî ye. Cîhana ku di herka dîrokê de, magazinên xwe yên edebiyatê bi hêz kirine, wê bi “Cehd”êke kulturî li ber xwe bidin.

Lê gelên mîna kurdan, ku hîna bingeha magazîna edebiyata xwe nû ava dike û di aliyê kêşa hêza ferhengî û akademîk de lewaz û misrî ye, wê li ber pêl û şelqên hêza kultura global bipelîxe û tîk biçe.

Gelê kurd di bin êrîşên hiyerarşiya dagirkeriya çar hêzên dijmin de ye.

Eger hiyerarşiya kujerî ya dagirkeran, bi hêza kultura global re bibe yek û hêzeke homojen ya tofanî derbixe meydanê, hingî gelê kurd nikare ji dahatûya xwe ewle bibe. Bi vê mebestê, em binbarî û berpirsiyariya dîrokî ya nivîskar û rewşenbîran, girîngtir ji “belaîtî” yê dibînin.

Dema împaratoriyan

Mirovên futuhatan serxweş in. Împarator jî serxweş in û her dem “îstîbdad” a ku rûmeta civakan dişikînin, didin meşandin.

Du mînak. Yek Osmanî. Yek jî Eyûbî.

Di demjiyana Osmaniyan de mirov rastî edebiyatê, felsefê naye. Hebe nebe Quran e. Quran, ji bo Osmaniyan têra her tiştî dike. Ji ber ku, nasê kor û kerende, bi fetwayan tê birêvebirin. Serê mirovan û pîvazek wekî hev in. Çend padîşahên Osmaniyan helbest nivîsîbin jî lê civak di gotinên bektasîyan de, li qurçik û enîşkên meyxaneyan hatine ferfitandin. Bi gotineke din; mirovahî di şikefteke reş de hatiye kebîskirin. Ji bo vê jî, mîrateyeke kultur û edebiyatê nehatiye afirandin. Hişmendî û hewngîrî wek “bedua” yekê derketiye holê. Di vê pêvajoya dagirkeriyê de, xanedaniya Osmaniyan bi melkemot re hevkarîya kuştinan dike. Di herka dîrokeke wiha de, ne hişmendî, ne jî hewngîrî, felsefe û edebiyat bi pêş dikeve.

Ev demjiyana ku, Xweda di şexsê xanedanan de derketiye hemberî mirovahiyê ye.

Mînakê duyemîn Eyûbî ne.

Xanedaniya Eyûbîyan di nava baweriyeke “xirand”, yanî ji binyata xwe dûr de ye. Gelek caran tê gotin ku dema împaratoriyan netewiyet nebû, yan jî nîn e. Ez ne di vê baweriyê de me. Ji ber ku derketina îslamiyetê jî, li ser neteweya ereban e. Eyûbîyan jî xizmeta wê neteweyê kiriye. Gotina umet, di bingeha xwe de, propagandeya herî baş a neteweya ereban e. Yek zimanî pêş dixê. Bawerî, dilsozî, dilpenahî, qencî, xêrxwazî, tîkîlî û ademiyet tev di yek zimanî de û bi mînakên yek zimanî bi pêş dikevin. Kesayetiya taybet tê kuştin, ya misilmanan dibin sîwana ereban de tê afirandin. Mînakê wê, Misirî ne, gelên li Sûriye û Iraqê ne. Ne gelê Misirî, ne yê Iraqê û ne jî yê Sûriyeyê, di dema xwe de ereb bûn. Piştî, piştî, piştî... Yekzimanî, bandorê li tîkîliya mirovan, li tevgera civakê jî kiriye. Toreyên qedîm, pêşketin, tîgihiştin û zanyarî li gorî vê “yek” bûnê, hatine guhertin. Lewma ez dibêjim ku, Eyûbî mînakê herî baş e û hêza wan jî, aqil û zîrekiya wan jî, di neteweya erebûnê de, di îdeolojiya “yek” de bi pêş dikeve. Payîtext Misir e û ziman, pêşketin û zanist bi erebî ye.

Hişmendî û hewngîriya kurd, bi zimanê Erebi ye.

Mînakê vê jî Ibnul Esîr e. Yan jî Keyserê Merwanî ku xelîfeyê Îslamê navê wî dike Emnul Dewl. Ibnul Esîr feylesof û zanistê herî navdar ê dema xwe ye û 12 cîld dîroka cîhanê bi zimanê erebî nivîsiye. Hukumraniya Merwaniyan jî di pêşketina şa-



ristaniyê de, li pêşiya demê ye. Lê hişmendî û hewngîriya erebî serdest e. Ebul Farac jî, li pay-texta Merwaniyan, li nîvê cografyaya Kurdistanê li Farqînê, dîroka Merwaniyan, bi Erebi dinivîse.

Ev her du mînak, ji bo xanedanî û demjiyana Eyûbiyan, ku ji edebiyat û kultura kurdî çî birine û dane windakirin baştir werê fêhm kirin e.

Dibe ku sedema her du împaratoriyan jî utop-yaya “futuhatan” be.

Propagandeya tê kirin jî wiha ye: Ola Îslamê netewebûn û çinayetiye erê nake. Karsazî û karbidestî karker û çînên bûrjûvayan, ji hev nayên wejartin. Ev dereweke mezin e. Hiyerarşiya navbera “nas”, ji jora pîramîdê heta bi serê pîramîdê, yanî heta bi cem Xwedê, ji hev cuda kiriye û hewayeke mistîk dayê. Mistîsîzm, gotinê di nava “heriya kozmîk” de jî difetisîne.

Ha, di aliyê hunerî de: gotinên Plêhanov ku dibêje “huner ji bo huner” e tîne bîra mirov. Hunera cîhana îslamî tev ji bo neteweya ereban e. Quran bingeha neteweya erebî ye û her cure huner jî, li gorî wê hatiye dîzaynkirin. Ev jî, bûye sedema ku di cîhana edebiyata gelên misilmanan tevan de bayekî seqemî û reş bibizive. Gelo ev ne siyaseta herî bi hêz a li ser edebiyat û nivîskar e?

Tê xuya kirin ku, Cenabê Mihemed hêza gotinê ew qasî baş bi kar aniye ku, giyanê mirovan, asoyên

mirovan jî dagirtiye. Bi vê hêza mezin re, hêza şûr jî di heman çarçovê de bi kar aniye. Ji aliyekî ve jî, siyaseta aşûfte kir jiyanê û kuştinên bê sînor ên nava umeta misilmanan de da destpêkirin.

Dema netewedewletan

Îdeolojiya netewedewletan kultura madî ye. Her çav û her gav, di vê çarçoveyê de dibîne û tê avêtin. Bê çî qasî împaratorî jî nîrx û pîroziyên gotinê dîr e, tenê koletî û bendetiye bi hêza zorê sazkar dike; netewedewlet bingeha faşîzmê ye û bi riya îdeolojiya bikaranîna giyanî, şaristanîyê jî bi kar tîne. Lewma edebiyat jî dibe amûrek ji yê îdeolojiya netewedewletê. Mîna ku Abdulah Ocalan jî dibêje, “Exlaqê azad” derewa herî mezin a sîstema netewedewletê ye. Sîstema kapîtalîst ku ji împaratoriyan netewedewlet derxistiye holê, sîstemên herî pêşketî yên koletî, bendetiye diafirîne û vê zihniyetê jî, bi kultura madî û manewî xwedî dike. Li gorî sîstemê tixûbekî meşrû hatiye avakirin û di nava vî tixûbî de, holka cîrîda her cure huner û afirgeriya mirov serbest kirine. Netewedewlet qada gladyatoran e. Mirov tê de hev û din dikujin, lê nikarin jê derkevin.

Di sîstemeke wiha de, eger nivîskar di parametreyên jiyanê de nebin bersiv, çî dibêjin bila bibêjin, ew amûreke ji yê sîstemê ne. Bêalîti jî bingeha vê ye. Gotina Gunter Gras ê ku dibêje: “Pêwîst e nivîskar siya-

setê ji siyasetmedaran re nehêlin, naxwe ew ê nîrxên jiyanê biavêjin ser ting û sergoyan” vêya erê dike.

Mixabin barê nivîskarên kurd du caran ji ya nivîskarên cihanê girantir e. Ji ber ku ne tenê parametreyên jiyanê, parametreyên dagirkeriyê ji li bendeyî nivîskarên kurd e û pêwîst e bersiva wan ji bide. Her roj bûyerên kronîk ên kanserojenî, bedena kurdîtiyê dixwin û pûç dikin. Dijmin ji ne yek e ne du ye, ne sê ye, ne ji çar in... Ev dijminê ku hejmara wan zêdetirî tiliyên destan in, di zordestî û kuştinê de, nivîskar û kurdekî di rêze de ji hev nabijêre. Naxwe, divê nivîskar ji kurdê ji rêze bêhtir kar bike, têbikoşe.

Serazatên bêalîtiyê jî, reva ji binbarî û berpirsiyariyê ye.

Netewedewletên dagirkerên Kurdistanê, bi riya mizgeft û meleyan, bi riya hiqûq û dadgehan, bi riya medya, bi riya misilmantiyê gelê kurd dihelîne. Ev riyên ku me hejmartin, tev pîroz in. Ev tê wateya ku misilmantî jî, ji bo hebûna netewedewletan li ser tunebûna gelê kurd hatiye avakirin, bûye amûrê şerê li dijî kurdan. Îcar di van cureyên şerê li dijî gelê kurd de, ji bilî qirkirina fizîkî, qirkirina siyasî û fizîkî, qirkirina kulturî jî heye. Vê kujeriyê, çerxa asîmîlasyon û otoasîmîlasyonê û hwd. jî afirandiye.

Di herka dîroka ku netewedewlet hatine avakirin de, magazîna edebiyata kurdî, bêhtir ji her demjiyanê hatiye valakirin û bi riyên qedexeyan, tedbîrên polîsiyê û eskeriyê derfet tev ji holê hatine hilandin. Ev jî dide xuyakirin ku nêzikbûna sistema cihanê ya li hemberî gelê kurd ne tenê siyasî ye. Dîwarê siyasî ku di qada navneteweyî de li dijî gelê kurd hatiye avakirin, giştî ye. Li dijî cografyaya Kurdistanê ye, li dijî îradeya siyasî û sîvil a gelê kurd e; li dijî kultur, ziman û edebiyata kurdî ye.

Dîwarê di qada navneteweyî de û li dijî gelê kurd hatiye avakirin, berî her tiştî utopyaya kurd kuştîye. Em tev dizanin ku utopya şaristanî û îdeolojiyan saz nakin, jiyanê diparêzên û xweş dikin. Lê jiyanê gelê kurd bi bîrdozên weke “Bîrdoza tevnepîrkê” û bi “Bîrdoza dogehî” hatiye fetisandin. (1)

Sêyemîn bîrdoza hêzên dagirker ol e. Hemberî ku kurd jî piranî misilman in, mixabin dûçarî kujerîya şerîeta tirk, şerîeta faris û şerîeta ereb bûne. Her hêza dagirker, di çarçoveya îdeolojiya fermî ya dewleta xwe de, ‘şerîeta’ xwe çêkiriye û li dijî gelê kurd wek engîzîsyonê bi kar anîye. Destûra bingehîn a van dewletên dagirker jî, li gorî heman îdeolojiyê hatiye amadekirin û riya dîrokê li ber kurdan digire. Vê sistêmê gelê kurd di şikefta tarî de dîl girtiye.

Ji bo ku gelê kurd bikaribe ji vê şikefta tarî derbikeve jî, pêdivî bi entelektuel û nivîskarên peyamber

hene. Peyamberên cihûyan Tewrat, ji gelê cihû re derxistin meydanê. Gelê kurd, ji peyamberên kurd, ne Tewratekê, tenê ûpanîşadên vekirina dergehên utopyayê dixwaze. Vekirina deriyê şikeftê dixwaze. Ji bo vê jî çavkaniyên zêde zêde hene. Nivîsandin û afirgeriya ûpanîşadan, bi hişmendiyê ve girêdayî ye û derfetên alîgiriya hêz û partiyan jî nade.

Îcar 30 sal, di aliyê belge û bûyerên kronîk de, çavkaniya abadanî ye û li benda nivîskarên kurd e. Di pêvajoya jiyan û mirinê de, naskirin û xwedîderketina li nasnameya kurdî, xelesa herî girîng a jiyanê nivîskarê ku li parametreyên jiyanê xwe xwedî derbikeve ye. Nasnameya kurd jî, di belgeyên 30 salên şerê neteweyî de veşartî ye.

Ez ê ji bo vê mijarê jî, gotina sosyologên ku dibêjin “Rewşenbîrê bê alî felçbûyî ye” bi kar bînim.

Mabeda siyasetê edebiyat e

Mirov, ji bo xwe tenê gotinekê nabêje û nanivîse.

Huner, berhem her dem ji bo mirovan e. Lewma nivîsandin, bi mirovan re wek “infîal-î aşk” derdikeve holê. Belaş nehatiye gotin “Hişmendî romani-vîsandin e.”

Li Ewrûpayê, piştî sedsala 17’an hukumraniya hişmendiyê dest pê kiriye û otorîteya gotinê, siyaset “terbiye” kiriye. Yanî li Ewrûpayê mabeda siyasetê bûye edebiyat. Her çiqasî li Ewrûpayê, di Akademiyên Ziman û Kulturî de, pêşî pexşanên axaftinê (li Fransayê) hatibin avakirin jî, hêza xwe di ferhengên de destnîşan kirine û gotin kirine hunera demê.


Piştî demekê, ferheng bûne neynikên dema xwe.

Vê pêşketinê di sedsala 17’emîn de, li Ewrûpayê demjiyana zimanên neteweyî da destpêkirin. Li cîhana Îslamî ev dabaş hatibû fetisandin. Hemberî ku Ehmedê Xanî di helbesteke xwe de dibêje; “Ev fêkî welew kî ne gihiştî û avdar e / Kurdî ye, ev qas bes e û li kar e”, car din, zimanê herêmê di bin bandora ola Îslamê de diferfitî. Ji ber ku siyaseteke aşûftiyê derketibû holê û roleke kujerî dilîst. Li Tirkiyeyê, li Sûriyeyê Îman bû şûrê tunekirin û asîmîlasyonê. Îro jî wek engîzîsyona şiyar, kar dike.

Divê em hinekî li ser “îman”ê rawestin. Gelo ew kesên ku dibêjin, edebiyat û siyaset ji hev dûr in, xwedî îman in û îmana xwe “kamil” dibînin? Eger “îman” tenê erebî be, cemaeta Gulen, bi îdeolojiya fermî û bi piştgiriya dewleta tirk, çima li çar aliyên cihanê dibistanên bi zimanê tirkî vedike? Baş tê zanîn ku dibistan, du tiştan bi zarokan didin fêrkirin; edebiyata wî welatî û îdeolojiya bi felsefe û edebiyata wî welatî hatiye stewihandin, di mêjiyê zarokan de neqîş dike. Evîna wî nîfîş û zimanê wî nîfîş, zerkî nava rayên xwîna zarokan dikin.

Berî çendekî, dema ku serokwezîrê Tirkîyeyê Tayip Erdogan çû serdana Etyopyayê, zarokên Etyopî, helbesta Necîp Fazil Kisakurek (2) û sirûda neteweyî ya Tirk xwendin.

Gelo, zarokên Etyopî, çima behsa şova Erdogan a li Dawosê nekirin? Ji ber ku şova li Dawosê siyaset bû û di aşê edebiyatê de nehatibû hêrtin. Lê helbesta Necîp Fazil Kisakurek û sirûda neteweyî ya Tirk, du stûnên binyata edebiyata Tirkîtiya Kesk û Spî ye. Ev bingeha cîhanşimûliya ku bi riya “mabeda siyasî” bi edebiyatê were pêşxistin e. Ev stûnên ku li ser bingeha şerîeta tirk hatine çêkirin û bi cil û bergên îmanê hatine xemilandin, hêza edebiyatê ya li ser siyasetê destnîşan dike û her dem siyasetmedar hewceyî edebiyatê kirine. Ev rastî destnîşan dike ku “mabeda siyasetê edebiyat e.”



Hişmendiya cîhanê û bûyerên cîhanê bi rê ve dibin. Şoreş jî, hişmendiya ku dikeve pratîkê ye. Îro li Kurdistanê pratîkek heye.

Pratîkeke ji madiyetê dûr. Madiyet û berjewendiyan tu caran li cîhanê şoreş çenekirine. Lewra şansa şoreşa kurdî ji sedî sed e. Me got, şoreşa kurdî ji madiyet û berjewendiyan dûr e. Lê pêdiviya vê şoreşê bi edebiyatê heye.

Guman tê de ne ku, her nivîskar û entelektuel zor û faşizma li Kurdistanê erê dike. Baş e, li gorî vê “erênî” ya zor, li ku dibe bila bibe, derî exlaqî ye, derî ademiyetê ye, derî peymanên gerdûnî ye û derî tore û kanûnên civakî ye. Mafê tu desthilatdariyan, mafê tu neteweyên serdest nûn e ku van nîrx û pîroziyan binpê bike. Ji ber ku netewe di ser neteweyan re nûn in, civak jî, mirov jî xwedî mafê jiyaneke bi rûmet in, xwedî mafê bikaranîna zimanê xwe û pêşxistina kultura xwe ye; xwedî mafê bikaranîna îrade û nasnameya xwe ye. Lê ev otorîteyên ku di çarçove û qalibê her cure sîstemên xerab û kujerî de, dijayetiya kurd dikin, çawa dikarin li ser aligirî û serbixwetiya nivîskarên kurd biaxivin û bi kîjan mafi kemîn û dafikan li pêşiya entelektuelên kurd vedidin û datînin? Bealîtî, yek dafika ku bi destê dagirkeran û li pêşiya nivîskarên kurd hatiye vedan e.

Guman tê de nûn e ku hêza siyaseta wan ku di mabedên edebiyatê de hatiye terbiyekirin, bi wan dafik û kemînan, nivîskar û entelektuelên kurd, siyasetmedarên kurd bi hesanî dîl digirin. Eger em li hejmara ketiyên nivîskar, entelektuel û siyasetmedarên kurd binêrin, (hejmara wan bi qasî çasikên bi çek nebin jî, gelekî zêde ne) em ê rastîyê fêm bikin.

Dijmin bi rêbazên kirêt û gemarî hişmendiya kurd, mîna erdên bi çît û kêlikên tixûban ji hev hatine veqetandin, parçe kiriye. Hiş û ramana gelan dikare cuda be, lê ji hev nayê veqetandin. Erê, hiş û raman bi cografayê ve girêdayî ye û roja ku Kurdistanê kirin çar parçe, navbera parçeyan bi tîl û mayînan, bi qereqol, çeper û kozikan veqetandin, hiş û ramanê kurd, hestê kurd jî parçe kirin. Lê mîna me li jor got, şoreşa kurd di nava 30 salên diwar de, ev tixûbên bi tîlên dirihî û mayînen cureyî hatine veqetenadin, ji holê rakirine. Bi vê pêwanê jî, emê mîna St. Beuve, (3) dibêje ku “Edebîyata bê hişmendî, bê felsefe, bê siyaset, bê matematîk, bê fizîk, bê cografya bê sosyolojî û hwd. erê nabe.” Em ê bibêjin ku, “Edebîyat ne tenê gotinên delal, bi pîvan û neqşekirî ne.” Yanî di edebiyatê de xwedîderketina li siyasetê jî heye. Ji ber ku edebîyat jiyane hembêz dike û siyaset jî parçeyekî girîng e jiyane ye.

Di vê pêvajoya ku êş û azar, bêzarî û pêrîşanî bi

xewnên mirovê kurd re dijî, pêwîst e ji aliyê nivîskar û entelektuelên kurd ve were hembêzkirin

Emperyalîzma kulturî

Wateya edaletê: Rêzdariya li hemberî rûmeta mirov e.

Lê dema ku em li kiryarên dramatîk ên li xaka Kurdistanê dinihêrin, efsaneya Tofanê, agirê Nemrûd û teqîna volqana Çiyayê Wezuvê tê bîra mirov. Lewma, ji bo Xwedayê van bûyerên dramatîk, navê “koma egoîstên harhare”, yan jî “çil haramiyên” ku piştî bûne mîrzade û aristokrat, navên herî baş in. Lê rewşa netewedewletên cendirme, tenê dikare bi gotina “tofanê” werê ziman.

Li jor, me dewlet û îdeolojiya dewletan, siyaseta dewletan bi aşûfteyî bi nav kiribû. Aşûfteyî, geh anarşîst e, geh faşîst e, geh modern e, geh kanûn e, geh şerîat e. Lê di tevahiya bedena xwe de, emperyalîst e û wek kulîhê bejik her tiştî diqurpîne. Dîsa têr naxwe.

Karl Friedrich Brzensky dibêje, “Dewlet tev xwedî îdeoloji ne û jiyan di bin kontrola polis de ye. Artêş di destê de tê komkirin, amûrên propagandayê (edebiyat û medya jî di nav de) û çerxa aborî jî di bin kontrola vî destî de ye.” Ev tê wateya ku gotin îdeola reşa şikeftê ye û utopyaya mirovan a civakan di nava mij û moranê de dihêle. Hişmendîya mirov, kiryar û afirgeriya mirov tev di bin kontrolê de ne. Çima? Ji ber ku gotin, kirine îdeola reşahiya şikeftê, kirine ewrê reş ê li ber ronahiyê. Ev emperyalîzm e, mirov û civak, bi “emr-î yewmiye” ve tê girêdan. Mirov tê plankirin û robotek tê afirandin.

Gotina ku dibêjin, her mirov parçeyek jî çerxa sîstema kapîtalîst e, ji vir tê.

Di sîstemeke wiha de, binbarî û berpirsiyariya nivîskar û entelektuelan çi ye? Bê guman paqijkirina gotinan. Mîna sefarên ku sifiran spî dikin; nivîskar mecbûr dimîne ku sefariya gotinan bike. Di jiyana welatê derew û propagandayê de, tenê bi sefarî û paletiya nivîskar û entelektuelan dikare were safikirin. Eger nivîskar û entelektuel tenekoşin, mîna li Kurdistanê dibe; wê hebûn, nasname, ziman, cografya, çûk, lawir, dîrok, alfabe û hwd, tev wê werin înkarkirin. Dema ku înkâr hat erêkirin, hêdî hêdî tune kirin û jîholê rakirin dest pê dike.

Di pêvajoyên wiha de, gelên mîna kurdan jî, di şikefta tarî de tên dîlgirtin. Ji bo azadkirina van gelan û derxistina ji şikeftên tarî, tenekoşin lazim e. Tenekoşin jî tenê bi riya eskerî nabe. Pêdiviya eskeriyê bi moral û bi hêrsa gotinê heye. Hêrsa gotinê edebiyat e. Edebiyat jî hişmendî ye û hişmendî jî

tenekoşin e. Lê ne eskerî ye.

Li gorî vê îdîayê; edebiyat pêşengê siyaseta ye û nivîskar û entelektuel jî, peyamberên civakê ne, ronî dike û li dijî emperyalîzmê di sefê pêş de dimeşe. Dema ku nivîskar û entelektuel ket pêşîya civakê û wek peyamber karakter stand, nikare gotina “bêalî” bi kar bîne.

Bêalîti derewa herî kirêt û bê mirês a paşverûtîyê ye. Her giyanewer alîgir e. Sosyologê navdar ê tirk, Cemîl Merîç dibêje; “Bêalîti oportünîzma herî bê mirês û kotî ye.” Eger, nivîskar û entelektuelên kurd, utopyaya kurd, xeyalên kurd, xewnên kurd, dil û mêjiyê kurd nexemilînin, kî wê bixemilîne? Gotinên ku ji aliyê siyasatmedaran ve tên lêwitan-din, wê ji aliyê kê ve werin paqijkirin? Bê guman dijmînê ku faşîzma Mûsolînî radestî xwe kiriye, îdeola misilmantiya neteweparêzî di nava ava kîmyewî ya mêjiyê xwe de helandiye, vî karî ji kurdan re nake.

Bila ne parlamento, ne jî saziyên dadmendî û burokrasiya bi krawat ên dagirkerên Kurdistanê, nivîskar û entelektuelan bixapîne. Doktrîna wan êrîşkarî ye û mirovê êrîşkar kujer e. Di demên dawîn de “Doktrîna îslama nerm” jî kirin pratîkê û dewşirmetiya zarokên kurd dane destpêkirin. Dibistan ava kirin, avaniyên razanê, malên ciwanan, yên jinan û saziyên pîşeyî ava kirin û dest bi şuştina mêjiyê zarokên kurd kirin.

Yanî misyoneriya tirkîtiya kesk dane destpêkirin. Ev jî cureyekî ku kapîtalîzm û misilmantiya oryantalist a AKP’ê û cemaeta Gulen di yek qonaxê de bûne yek e.

Mîna keke din, piştî ku Mûsolînî hate ser desthilatdariyê, her cure hişmendî, îdeoloji red kirin û dewlet kir her tişt. Ne dewlet, hemwelatî li hemberî dewletê berpirsiyar bûn. Li Tirkîyeyê, gelo tiştêkî cuda heye? Berî niha dihate gotin, du binbarî û berpirsiyariya cemawer heye, dana bac û bêşê û çûna eskeriyê. Îro jî dema cemawerê tirk zarokên xwe dişînin eskeriyê, li dahol û zirneyê dixin; piştî dimirin, slogana “Bila welat sax be” diqîrin. Li Romaya qedîm jî, piştî mirina eskeran, dîsa eskeran slogana “Her bijî Sezar” diqîrin. Ev xelesa bingeşîn a faşîzmê ye.

Li dewletên totalîter û faşîst, nivîskar û entelektuel herî zêde gotina “Bêalîti”yê bi kar tînin. Mîna Iraqê û demjiyana Sedam Huseyin, neynika vê bîrdoziyê ye.

Gelek kes dibêjin, eger siyaseta edebiyatê bi kar bîne, emperyalîzma kulturî dest pê dike, pêwîst e entelektuel û nivîskar destûrê nedin vê yekê. Lê çawa?

Eger nivîskar û entelektuel destiniya cografyaya xwe bijîn, "lê çawa" wê ji holê rabe? Ji ber ku cografya dîwarê dora dîrokê ye. Parastina vî dîwarî jî, ne barê siyasetmedar, burokrat, dadgeh û eskeran tenê ye. Ibnî Haldûn, bi felsefeya dîrokê dest bi dîroka şaristaniyê dike. Ev jî, gotina sosyologê Tirk Cemîl Merîç rast derdixe. Di herka jiyana ku dibin ferfitandin, gêjkirin, talan û şelandina her cure dagirkerî û mijokeriya bi "îzm"an ve girêdayî û bi "barebarî"yê ve têkildar e, ev rastî çi ye?

Gotina herî baş û watedar a Abdûlah Ocalan e ku dibêje: "Ez edebiyata ku erzaniyê biparêze wekî metirsî dibînim. Pêwîst e nivîskar, wateya çalakiya xwe ya hunerî rast binirxîne û çalakiya xwe ya şoreşgerî jî di çarçoveya edebî de şîrove bike. Ji ber ku guhertinên di mirovê kurd de, ne tenê siyasî û îdeolojîk in. Guhertinên ku bi van gotinan tenê nayên şîrovekirin hene. Aliyê şoreşê yê edebî û hunerî jî xwe daye erê kirin." Lê bersiva vê "Aliyê edebî û hunerî" hîna di eniya rewşenbîriyê de bersiva xwe nedîtiye. Balkêş e ku, di hinek romanên kurd de, navê cografyaya Kurdistanê derbas nabe.

Gotina ku tê gotin; edebiyata kurdî nayê parastin jî heye. Dema ku mirov bi kûrayî û li gorî hoy û mercên îro, li wateya van gotinan nenihêre, mirov wê şaş bibe û erê bike. Lê! Eger desthilatdarî û otorîteya siyasî nebe, parastina edebiyatê wê çawa çêbibe? Yan jî, eger edebiyat otorîteya siyasî terbiye neke, wê edebiyat çawa bikaribe xwe biparêze? Nivîskarê navdar û xelatgirê Nobelê yê Elman, Gunter Grass, di axaftineke xwe de dibêje: "Siyaset ew qasî girîng e ku divê nivîskar destûrê nedin da siyasetmedar vî hunerî mîna alavên ser tingên dîrokê bi kar bîne." Eger nivîskar ji kiryarên rojane û bûyerên dramatîk bireve, hingî gotinên Gunter Grass li hewa dimînin, siyaset jî wê hunera bazirganiyê serdest bike û emperyalîzma kulturî jî wê cirîdê bike.

Îro, li Kurdistanê ev tirs mezin e. Cemaeta Gulen, ev siyaset bi riya baweriyê kiriye çerxa hêrtina zarokên kurd. Eger nivîskarên kurd, nebin Vîctor Hûgo, zarok û xizanên dora Amedê nenivîsin; nebin Balzac, bûyerên rojane nenivîsin û sosyolojiya civaka kurd nekin romanên xwe, eger nebin Romain Gary û têkoşîna li Çiyayên Kurdistanê nenivîsin, gelo wê hêza emperyalîzmê û dagirkeriya faşîzane çawa were şikandin? Kes jî, ji bedêla nivîskarên kurd, hişmendiya kurdîtiyê naparêze û têkçûna zimanê Kurdî, xizanî û pejmûrdetiya zarok û xizanên kurd naqîre.

Kultura ku mirov dike mirov, yanî kultura ku kurd kiriye kurd, li ber şibakeya qedexê û zordest-

tiya îdeolojiya kujerî ya tirk e û di bin zext û zordestiyên her cureyî de ye. Hareketa azadiya kurd gihaye radeyekê û dibe bersiva van zext û zordestiyan. Lê pêdivî bi hişmendiya edebiyatê heye. Gotin lawaz e û binbariya xwe nayîne cih.

Hişmendî. Hêza herî mezin a edebiyatê ye, ya felsefeyê ye, yanî ya gotinê ye. Gotinê, di dîrokê de hêza mekanîk parçe kiriye. Dijmin, di karê qirkirina kulturî de, serî li her cure zanistan dide, xweza û biyolojî jî wek alav bi kar tîne. Di sedsala 19'an de, piştî ku cemawer, yanî komên xelkê ketin romanê, gel hêdî hêdî bi xwe hesiya ku, di seray û qesr û qonaxên derebeg û asîlzaşeyan de, li dijî wan lîstik têne kirin. Heta hingê di teatroyên Moliere û Racîna de, yek ferd dibû dabaşa lîstikan û roleke şiyarkirinê dilîst. Helbest û teatroyên Shakespeare, bûne bingeha serîhildana gundiyên Îngîltereyê. Di şerê duyemîn ê cihanê de rola nivîskarên Rûsyayê tê zanîn.

Di vê qonaxê de, li Kurdistanê, edebiyata kurdî, roman, helbest, teatro çi qasî rola xwe lîstîye? Mijara derfetan dibe ku car din derbikeve hemberî me, lê ne rast e. Molier jî, Vîctor Hûgo jî, Shakespeare jî, Maksîm Gorkî jî, hatine afarozkirin û sergomkirin. Birçî mane, şepirze bûne. Ûûûûû, mînakên bi vî rengî li cihanê zêde hene.

Lewma, xwedîderketina li nivîskar û edebiyatê, nikare bibe bazar û dabaşa nivîskaran. Eger nivîskar, vê dabaş û bazarê bikin, wê xwe bikin "Paçikê pîso."

Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, yan jî Feqiyê Teyran û hwd, bi qasî Sheakespeare bi hêz in. Ehmedê Xanî pêşengê epope û lirîzma cihanê ye; Melayê Cizîrî jî pêşengê romantîzmê ye. Lê piştî 350 salî, îro, helbestên wan bûne bingeha serîhildan û çavkaniya neteweyî. Ocalan, belaş negot: "Em daxwaza Ehmedê Xanî tînin cih."

Kanûnên dagirkeran ku li dijî gelê kurd wek engizisyonê kar dikin, kurd derxistin derî demê; nîrx û pîroziyên wî tev korîk, seqet, felûş û nîvsaxî kirin. Gelek ji wan ji holê rakirin. Psîkolojiya kolektîf kuşt û qedexê jî, wek xelekên zincîrê li pey hev rêz kirin. Îdeolojiya tirk, di zincîra qedexeyan de, "Dûrkirina ji ziman, jibîrkirina ziman û kuştina bazara ziman" kirin pratîkê û serketineke mezin jî bi dest xist. Ji bilî asîmîlasyonê, kotika mezin, otoasîmîlasyon pêş xist. Dûrkirina ji ziman, windakirina nasnameyê ye. Jibîrkirina ziman, jibîrkirin û înkara nîfşî ye. Kuştina bazara ziman jî tunekirina aliyê aborî ye. Ew mînaka bîrdozên aborî bingeha vê têkbirinê ne. Ev "Îstîbdata civakî" ya kuştin û jîholêrakirinê ye.

Dê bidome.



Sîdar JÎR

Şoreşa wêjeyê ↔ wêjeya şoreşê!

Ji destpêka nivîsandinê heta îro, di tu serdeman de wêjekarên xwe ji bûyerên ku li derdora wan qewimîne, neparastine. Ji xweparastinê wêdetir bi pey bûyeran ketine û heta ku ji destê wan hatiye ew ji helbest, çîrok û romanên xwe re kirine bingeh.

Bêguman wêjekarên ku di nava şoreşekê de xwe û pênuşa xwe teslîmî şoreşê yan jî militarîzmê kirine, ne mijara me ne. Wêjekarên ku hişkî û êşa şoreşan an jî ya şeran bi zimanên xwe yên kedîkirî û bi pênuşa xwe ya ku rîşmeya wê tim di destê nivîskêr de ye, kirine ku em îro jî bi caran lê vegerin û wan berhemên ku bi eslê xwe bermayiyên şer û şoreşan in, bixwînin.

Her wekî ku hemû kesên ku ev yek şopandibin, divê me hay ji Îlîada hebe. Çawa ku Troyiyan û yewnaniyan ji hev çî kiribin ew li hêleke din e. Di wê berhemê de, divê tiştê ku îro em ji bo xwe li ser rawestin ew e ku, bingeha wê ew êşa ku jinên Troyayî kişandine. Rondikên wan ên ku li ser kalanên xencerên mêrên wan û hezkiriyên wan wekî bêhnna misk û emberê maye, ew xeyalên wan ên wê bi rojên xweş li hev rûnên û bêyî ku Hektorên wan li qada şer bi rimeke riziya bibe qurbana tiştê ne tişt e, ya girîng. Bêyî ku şer û biserketin an jî têkçûna hêlekê bala me bikêşe, ew dûmenên ku êşa wan


jinan bi awayekî estetîk gihandiye roja me divê bala me bikêşe. Ev yek jî wekî ku bêguman e, ew ê bi saya pênuşeke xurt, bêyî ku sloganwarî be, bêyî ku bê giyan û can be, wê tesîreke wê li ser me hebe.

George Orwell di destpêka *Çewlika Heywanan* de dibêje, “Azadî ew tiştê ku kes naxwaze bibihîze ye.” Belê heger di nava ew qas tiştî de, mirov bikaribe bi hevokekê vê yekê wisa kurt bike, wê demê tu qala wêjeyê de di nava şoreşekê de dikî “Azadî jî mirovan re tiştê ku naxwaze bibihîze dibêje.”

Heger tu kes nexwaze tiştê bibihîze jî, di wêjeya serdema navîn de jî ev yek bi me dane bihiştandin. Ew, siwarçakên ku

li ser piştê pênuşên xwe yên ku ji perikên teyrên tawis in siwar bûne ne, yan jî wan hestên ku mirovahî jê aciz e li dora jîngehên xwe yên ku ji bo siberojê bi xwînê qor bi qor diwar lê kirine. Wekî mînan destana Nibelungenlied a elmanan, her çî qas kes bi helbestkar an jî hozanê wê nizanibe jî, bi sedsalan li ber xwe daye û têkoşîneke ji şerê dema xwe diwartir, daye.

Jê û wêdetir jî Cîda spaniyan, her çî qas gelek kes wê wekî berhemê şer dinase jî, di rastiya xwe de ne wisa ye. Ew berhem, bi awayekî xurt serboriyên siwarçakê navdar Rodrigo Diaz bi me dide xwendin. Em li wir di ser serboriyên





Rodrigo de hay ji şerê ereb û spaniyan çêdibin. Tu kes jî nabêje çima di wê demê de li vir qala şer tê kirin. Ji ber ku ew şer ê liberxwedan û wêrekiya Rodrigo ya bi jiyane re ye. Nivîskar wisa dike ku xwîn û rondik û mirin tiştêkî di nava qelşekê de veşartî ye.

Gava em bala xwe didin berhemên Sheakspeare jî, her çi qas bi awayekî trajîk be jî mijarên wî, şer tê de nîn e. Di berhemên wî de hîs, azwer, îxtîras û hewldanên kesan hene. Sheakspeare bi şerê wê demê re şer kiriye û wekî amûrekê ji bo berhemên xwe bi kar aniye.

Ya ku divê nivîskar li ser bisekinin, ne şer bi xwe ye, jixwe şer bi tena serê xwe nikare bibe wêje jî. Tiştê ku divê em li ser bisekinin, ew êşa ku mirovan kişandîye. Şer û şoreş vê derfetê dide nivîskaran ku bi xurtî berhemên xwe biafirînin.

Li aliyê din jî nîqaşeke dîtir heye ku gelo ew ê nivîskar çawa xwe ji wê hişkiyê biparêzin û bi awayekî estetîk qala şerekî bikin, qala şoreşekê bikin. Wê demê jî ji wêjeya me mînakêk tê bîra min; Şivanê Kurmanca ya Erebê Şemo ye. Di mercên Şoreşa Oktoberê de çi bi serê însanan de hatiye, ew tenê nimûneyeke li ber çêv. Sirgûnî, mirin, birçîbûn, rêwîti, rev û şer hemû di nava hev de bi hev re werin honandin wê demê pênûs ji şûr

tûjtir dibe. Her çawa be, şer tî jibîrkirin piştî demekê, lê ew berhemên ku bi zimanekî kedîkirî werin nivîsandin dikin ku ew şer an jî şoreş bibin nemir.

Gelek mînakên din li cîhanê hene ku wêjeya şoreşê bi awayekî hildane dîst û bi ser ketine. Wekî Nadîne Gordîmer ku jineke ji Efrîqaya Başûr e. Nadîne bi xwe ne jineke reşîk e. Lê belê di hemû jiyana xwe de wê reşîk û jinên reşîk ligel şoreşa xwe û wan parastiye. Û Nadîne Gordîmer di hewldana xwe ya ku bi xwe jî şoreşek e de, bi ser ketiye. Ji ber ku Nadîne Gordîmer di tu nivîsên xwe de ji mîxalîfbûn û şoreşgeriya xwe daneketiye û tu caran asta pênûsa xwe jî danexistiye. Tiştê ku dixwazim qal bikim ev bi xwe ye; bêtî ku tu asta nivîsandina xwe daxî, tu bi xurtî û bi zimanekî xurt û kedîkirî şoreşa bi şûr û mertal û keleş û tank û topan pêk hatibe û xwîn mîna robaran herikîbe jî, tu bêtî ku xwîneran aciz bikî, bi asta nivîsandina xwe ya bilind û xurt bi wan kesên ku te dixwînin, bêhna xwînê, êşê, rondikên jinên kurd an jî troyîyan bidî hîskirin e.

Her wisa jina reşîk û xweşik a amerîkî, Alice Walker jî bi heman rewşê û zanyariyê tevgeriyaye. Di berhemên xwe de tim li ser cudakariya di navbera reşîk û yê din de aniye zimên. Lê belê bi

zimanekî wisa ku wî zimanê reş xelata herî mezin a Pulitzerê jê re aniye.

Gava em bala xwe didin gotinên şoreşger an jî şervanên cîhanê, em lê rast tên ku divê em bi çi awayî tevbigerin. Wekî mînak Troçkî dibêje “Mirov nikare tenê bi politikayê bijî, divê huner û wêje jî di jiyana rojane ya mirovan de ciyekî xwe yê taybet hebe.”

Abdulah Ocalan ê ku sazûmankarê Partiya Karkerên Kurdistanê ye dibêje: “Ew kesê ku helbesteke xweşik, çîrokeke çak an jî romaneke gewre bixwîne û tu tiştî li xwe zêde neke wê demê giyanê wî/wê kesî/ê wekî dareke hişkbûyî ye” û vê jî bêyî ku metirsiyên wî yên siyasî hebin ango bitirse ku ew ê siyaseta xwe qels bike, bi wêrekî dibêje; “Ew pêvajoya seretayî ya mirovahiyê, pêvajoya helbestî ye.”

Li aliyê din jî wêjekarên ku îro tu şik ji pênûsa wan nîn e jî balê dikêşin ser vê yekê, yanî balê dikişînin ser şoreşa ku divê were nivîsandin. Her wisa ev nivîsandin divê bi hişekî dîrokî be.

Her wekî ku pîrsa ramyar û şoreşgerê sovyetê Troçkî dipirse, divê îro jî pîrsa ‘Ciyê wêjeyê di pêvajoya şoreşê de çi ye?’ were kirin û li gorî wê were nixandin. Divê mirov bi dirûvekî çawa şoreşê di nava rûpelên wêjeyê de bi cî bike esastirîn pîrsa vê yekê ye.

Wekî nêrîneke berovajî mirov bi hêsanî dikare li ber çêv raxe ku destpêka hemû şoreşan jî bi wêjeyê ye. Wekî mînak, di şoreş û ihtilala Fransayê de kesên wekî Voltaire û Jan Jack Rousse bi nivîsên xwe çirûskên pêşin ên wê şoreşê pexistine.

Mayaqovskî ku helbestkarekî gewre ye, xeyala xwe ya destpêkê wisa vedigot, “Ez dixwazim hunereke sosyalîst biafirînim” bêguman mebesta wî jî hunera sosyalîst ne helbestên wî yên ku di xwepêşandanan de dibûn slogan. Xeyala Mayaqovskî jî wekî ya hemû kesên ku şoreş di dil û hişê wan de tu caran neditefiya, dixwest kesekî wekî Gorkî bi helbestên xwe bi girî ve bike.

Di her şeweyê de gotin ji afirandinê re nîn e. Lewma jî divê bi wêrekî afirandin çêbibe, jixwe ku wêrekî nîn be, ew ê tu tişt jî neyê afirandin ango tu tişt wê neyê guherandin. Li Amerîkayê, di dema ku nijadperestiya li dijî reşikan di radeya herî bilind de bû, jineke reşik û gelekî pênûsxweşik bi navê Alice Walker radibe, xwêdana jinên reşik ji pênûsa xwe re dike hubir û wê gotina ku her kes dibêje, *ji civakê ji bo civakê* pêk tîne. Walker li hemberî wê nijadperestiya li dijî reşikan bi wê xwêdana jinên qederqemer di asta herî bilind de reşikan diparêze.


Wekî mînak mirov dikare ji hemû deverên

cîhanê mînakan bide. Bêguman li welatê me jî mînakeke gelek xurt û berbiçav heye ku hem yek ji pêşengên şoreşên me ye, hem jî yek ji pêşengên wêjeya me ye. Belê, Mîr Celadet Elî Bedirxan e, ew pêşeng. Celadet Bedirxan bi entelektuelî, bi wêjekarî, bi zimanzanî, bi pêşengî her dem wekî abîde û aqîdeya îmanê ye ji bo hemû kurdan. Di hemû kêliyên jiyana xwe de ku mirov dişopîne yan li pey şoreşekê ye yan jî şoreşekê dinivîse Celadet. Dem hatiye çakê wê firotiyê û text û mîrekî berdaye çûye bi pey peyveke botî ketiye, dem hatiye li pişt peyva xwe siwar bûye û çûye Serhed û Binxetê li pêş şoreşgeran siwarçakî kiriye. Lê her tişt bi adab û forma wê kiriye. Lewma jî divê kurd û neteweyên din bi taybetî Celadet Bedirxan nas bikin da ku rê û dirbên di şoreşa wan û ya wêjeya wan de çawa çêdibe, çêtir fêm bikin. Ji ber ku hêleke şûrê wî şer dike hêla din şoreşekê dinivîse.

Di nava van hemû mînakan de ku em wekî çend gotinên dawîn li ser şoreş û wêjeya xwe rawestin, divê neyê jibîrkin ku ev mînakên li jor borîn hemû piştî şerên çekdarî yan jî di rewşeke aram de derketine holê. Lewma bi kêmanî bi qasî bibiryarbûna şoreşgerekî/e gewre divê wêjekar jî bi biryar be ku ew ê çi, çawa binivîse. Bêyî lez û bezê, heta ku hin tişt danenîsin şolî ne. Heta ku hin tişt baş nepijîn werin ser sifreyê ew ê xavî bin. Ku xavî bin, ew ê mirov ji xwe bibe, ew ê xureyê xwe aciz bike, ew ê ciyê xwe negire.

Di nava germola jiyanê de, jiyanekê şoreşgerî de gotina herî xweş Troçkî dibêje. Troçkî şoreş û wêjeyê li hev digêrîne, mirov nikare bibêje kîjan jî kîjanê ye; “*Mirov nikare tenê bi politikayê bijî, divê huner û wêje jî di jiyana rojane ya mirovan de ciyekî xwe yê taybet hebe*”

Wêjeya kurdî û polîtîka



Berken BEREH

Polîtîka û wêje du têgehên girîng in ku ev bi sedan sal in li ser wan û têkiliya ku divê di navbera wan de hebe tê axaftin û nivîsandin. Lê di dawiyê de her kes li gorî hizr û ramana xwe vê pirsgrîrêkê şîrove dike. Heta îro jî hê li ser vê mijarê encameke hevbeş nîn e. Nebûna wê jî tiştêkî baş e. Lewre her du têgeh jî rasterast bi jiyane û civakê ve girêdayî ne. Gelek caran bandorê li dema xwe dikin. Jixwe polîtîka li ser çareserkirina pirsgrîrêkên civakê û sazîkirina desthilatdariya wê ava dibe. Ango polîtîka serhevdeya têkiliyên endamên civakê ne ku bi saya polîtîkayê tê dizaynkirin. Bi vê taybetiya xwe jî jiyana însên li gor polîtîkaya demê dirûv û teşe digire. Em baş dizanin ku bûyer û qewimînên civakî li gor polîtîkayê pêk tên, li ser jiyana însên tesîrê dike. Tam jî li vir têkiliya polîtîkayê û ya wêjeyê derdikeve pêşîya me. Lewre, mijar û babeta wêjeyê însan û tiştên ku bandorê li însanî dikin e. Di dîroka wêjeyê de em pêrgî bi hezaran berhemên li ser vê mijarê tên. Dastana Gilgamêş, ya Troya, Ro-barê Qerisî... Romana Îbrahîm Ehmed, Mem û Zîna Ehmedê Xanî û hwd. Gelek helbestvan an romanûs ji ber berhemên xwe hatine kuştin, nefikrin. Paul Eluard di şerê azadiya Frensayê de bi helbesta xwe ya "Azadî" encama şerî daye diyarkirin. Nexwe wêje û polîtîka du têgehên bi bandor in li ser civakê û desthilatdariya wê. Bi vê kartêkeriya xwe jî nêzî hev in. Polîtîka erka encamgirtinê ye, wêje pirsgrîrêkê aşkere dike. Bi gotineke din tiştê tesîrê li însên dike mijara wêjeyê ye, polîtîka jî yek ji wan e, bes ne bi awayekî sloganî lê bi estetîk û hestiyariyeke edebî. Li hêla din wêje bi jiyane ve girêdayî ye û babeta xwe ji jiyane hildibijêre û wê li gor raman û îdeolojiya xwe vedibêje. Polîtîka jî beşeke jiyane ye, vêca mirov dikare wê û wêjeyê ji hev veqetîne. Mirovahî di dîroka xwe ya bi hezaran salan de gelek karesat û bobelat li dû xwe hiştin. Îro jî li gelek deverên dinyayê şer û pevçûn hene, li beşeke Afrîkayê însan ji ber xizaniyê jiyaneke xedar dijin. Li welatê me hê şerê rizgariyê

berdewam e. Gelek însanên me koçber bûne. Gelo ev rûdanên nexweş bandorê li ser nivîskar nakin? Di berhema wî de nayên aşkerekirin? Ma ev berhem dê ne bi polîtîkayê ve bê girêdan? Ma nivîskarê Kolombî G. G. Marquezê ku xwediyê xelata nobelê ye "ger tu bi polîtîkayê re nedî û nestînî, dê ew belaya xwe bi te bide" beredayî gotiye?

Beriya ku ez behsa polîtîkayê û wêjeya me ya piştî salên 90'î bikim dixwazim panoramayeke wêjeya me raberî xwendevanên hêja bikim ku bi ya min dê ev bibe pencereyeke baş ji bo van her du têgehên û têkiliya di navbera wan de.

Wêjeya kurdî di rêwîtiya xwe ya bi hezaran salan de her bi civaka xwe re jiya û bi wê re dirûv û teşe girt. Ji ber nebûna desthilatdariya siyasî vê rewşê heta îro jî hefsarê wêjeya kurdî zêft kiriye û nahêle ku ber bi asoya xwe ya rengîn ve bifire. Bê guman vê trajediyê nehişt ku kurd jî wek her neteweyê bi awayekî siruştî bikemilîn û wêjeyeke yekser biafirînin. Em vê rastiye di berhemên wêjeyê de bi awayekî zelal dibînin. Di demên ku kurd li ser axa xwe azad û serbixwe dijiyan de, berhemên wêjeyî jî li gor wê civakê rengîn û tîr xwe navdar in. Melayê Cizîrî û berhema wî vê rastiye diselmînin. Dîsa jî di berhemên wî de polîtîka heye;

"Hûn ji dêrê ve tên, qesta kenîştê hin dikin

Ne ji van im, ne ji wan im, min derê xemmarê bes."

An

"Dilkeştî me ji dêrê, naçim kenîşteyê qet

Xirqe va ye bi min ra, wer da biçine Laleş!"

Lê kîngê kurd û welatê kurdan ket bin zext û zilma dagirkeran polîtîka jî bi awayekî aşkere û wek endameke sereke di wêjeya me de cihê xwe girt. Ev jî tiştêkî pir asayî ye. Lewre berhemdar mecbûr e xwe bispêre rastiya civakê û jiyana ku diji. Ehmedê Xanî ku bi ya min mîrê vê rastiye ye bi awayekî aşkere berhemeke bi polîtîkayê ve têkil-dar raberî me dike. Ev ristên wî;

"Ger dê hebûya me ittîfaqek

Vêkra bikira me inqiyadek

*Tekmîlê dikir me dîn û dewlet
Tehsîlê dikir me îlm û hikmet*

An,

*“Da xelqî nebêjîtin ku ekrad
Bê me’rîfet in, bê esl û binyad
Enwaî millet xwedakitêb in
Kurmancî di bê hesêb in”*

Di sedsala nozdemîn de ku welatê kurdan hat parçekirin di nav çar welatan de, polîtîkayê hê bêhtir di wêjeya kurdî de cihê xwe xweş kir. Ev jî tişteki xwezayî ye. Lewre nivîskar mecbûr e berhema xwe li ser civaka xwe û rewş û halê wê damezirîne. Bes divê li vir destnîşan bikim ku gelek caran nivîskar ji pîvanên wêjeyî dûr ketin û nivîs kirin alava polîtîkayê. Lê ez vê helwestê bi xweşbînî dihesibînim lewre ji nivîsê bêhtir ku bikare “êş” a civakê û wijdana nivîskarî rihet bike, tune bû. Li hêla din jî bo pêkhatin û damezirîna hiş û bireke neteweyî bê guman pêdivî bi vê cure wêjeyê heye û li hemû deverên dinyayê jî ev qonax bi vî awayî pêk hatiye. Li vir dixwazim xwe bispêrim çend camêran;

Gregory Jusdanîs di pirtûka xwe ya bi navê



“Modernîzma derengmayî, çanda estetîk” de;

Dibêje “Neteweyek, ji bo ku bikare bibe netewe pêdivî bi du tiştan heye; avakirin û damezirandina tixûb û wêjeya neteweyî, netewe ne tenê sînorên xwe her wiha divê sînorên hiş û bîra xwe jî fireh bike.” “Ruhê zimanekî di heman demê de ruhê wêjeya neteweyekê ye” Lewre, ziman nîşaneyê herî resen û xweser û tekane stûna neteweyê ye. Ji ber vê ye “wêje, rojnivîsk û çîroka neteweyê ya rabirdû, îro û dahatûya wê ye” û îşareta amadebûna hemdemî û modernîzmê ye.

Entelektuelê Afrîkî Ngugi “Li Efrîka nivîskar û siyasethan di heman demê de eynî kes e û tevli têkoşînê dibin; ji bo wan pênûs û çek heman alav in lewre di xizmeta azadiya welatê xwe de ne. Ji ber hindê li Efrîkayê du estetîkên dijber hene; yek estetîka zilm û zordariyê ya din estetîka têkoşîna neteweyî” ye.

Dîsa Addison Gaylee dibêje ku “Xweşikbûna helbest, newa yan romanekê ne girîng e, ya girîng ew e ka wê melodî, helbest, lîstîk an romanê jiyana reşikekî çawa xweşiktir kiriye.”

Mîr Celadet Bedirxan ê ku bingehe ekola edeb û wêjeya kurdî a nûjen, bi tîpên latînî ji me re daniye, ku îro, em bi saya wê ekola wî xwe serbilind û serfiraz di nav civata miletan de dibînin. Ji encamên wê ekolê yan wek ku hatiye naskirin di Hawarê de armanca xwe wiha dibêje; “Divêt bête zanîn ko ziman ji hîmê heyîna me ye û bê zimanê xwe em nikarin bijîn û di nav koma miletan de wek miletekî serxwe bimînin û paydar bibin. Nemaze ji bona me û ji bona wan miletên ko ketine rikanê miletekî hevol. Ji ber ko miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi du qeweta, du çekan diparêzin: Ol yek, Ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bi tenê ye û bend tenê ziman e.”

Ji ber parçebûn û dagirkeriyê li her parçeyî kurd bi gor mercên xwe û bêhtir jî di bin siya serdestên xwede man. Li bakur ev trajedî bi awayekî hovane hat jiyîn lewre serdestan nehişt kurd bi zimanê xwe bidin û bistînin, kurd wek tune hatin hesibandin û bi her cure çekên bişavtinê ketin ber pêla tunekirinê. Lê wek ku bav û kalên me gotine “Giya di bin kevir de namîne” Piştî salan û derfetên xwendinê, çirûskên hişyarî û lixwemikurhatinê xwe dan der. Ji salên şestî û pê de zana û xwendeyên li zanîngehan di ber têkoşîna siyasî re dageriyan ser ziman û wêjeya kurdî jî. Kesên mîna Kemal Badilî û Edo Dêran bi zimanê tirkî re bi kurmancî jî helbest lêkirin. Lê belê ev hewldan giş di bin konê siyasethê de sêwî man û nikaribûn xwe bigihînin civakê.

Di sala 1979'an de wekî roja nû hilatî Tîrêj'ê seranserê bakurê welêt bi ronahî û germahiya xwe hembêz kir. Bêguman ev şoreşek bû di çand û kelepûra kurdî de. Tîrêja ku bi du zaravayan weşana xwe didomand bi her kesî da zanîn ku kurdî qeyd û bendên bişaftinê şikênand û ber bi bi-hara xwe ve dimeşe. Rojen Barnasê ku bi helbesta xwe ya "Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir" ala mêrxasiyê û kesayetiyeke kurdewarî milmiland, her wiha bi gelek navan rûpelên Tîrêjê jî xemiland. Her çiqas di kovarê de kesên mîna Mem Ronga, Arjen Arî, Malmîsanîj, Mehmûd Lewendî û Berken Bereh jî dinivîsandin lê Rojen Barnas bûbû sem-bola Tîrêjê û wêjeya kurdî ya wî nîfşî. Di sala 1979'an de pirtûka wî ya helbestan "Li Bandeva Spêde" ku yekemîn pirtûka bi kurdî bû di dewra komarê de.

Helbest, serhevdeya têkiliyên însanî ya diyalektîk e. Ji bo vê jî helbestvan di afirîneriya xwe de ji aliyekî ve bi sînor e. Lewre helbestvan kere-seya xwe ji bendera ezmûnê, çavdêrî û kelepûra civaka xwe tomar dike. Van têgihîştinên xwe li moxila zanîna xwe dixê û yên bi kêr bînin bi xewn û xiyalên xwe -ku dirûvê xwe ji şarezayî û zanistê distîne- hevîr dike û ji nû ve diafirîne. Rojen Barnas, Mem Ronga, Arjen Arî, Berken Bereh, tam jî helbesta xwe li gor vê rêbazê çêdike. Dema ku em bala xwe didinê helbestên wan, pisporiya wan a teoriya helbestê û di hêla nasîna civaka xwe de bê çiqasî xwedan zîrekiyan in, aşkere tê dîtin. Ku em vî nîfşî bi awayekî zanistane binirxînin, em dê bibînin ku bêtîrî haya wan ji hev hebe û bi hev re di nav têkiliyeke durist de bin, metirsî û xemên wan ên ji bo helbesta kurdî ne dûrî hev in.

Di salên 90'î de kurdan karibûn bi awayekî rêxistinî cardin weşangeriya kurdî û wêjeya wê bidin destpêkirin. Li Stenbolê kovarên Nûbihar û Rewşenê, li derveyî welat Nûdemê dest bi weşanê kirin. Bêguman di weşangeriya van kovaran û ên din de keda siyaseta kurdan gelek e. Jixwe nivîskar û weşangerên wê demê û heta îro jî di heman demê de siyasatmedar û têkoşerên kurd in. Ev rewş tiştekî asayî ye. Lewre kesên ku dest bi nivîskariyê


dikin rewşenbîr û ronakbîrên wî gelî ne ku li her devera dinyayê di destpêka netewebûyîna de wiha pêk hatiye. Mehmud Derwêşê Filistîna, Atila Jozefê Macarî, Mayakowski, Nazim Hikmet û hwd. navdarên vê cureya wêjeyê ne.

Bêguman helwest û hişmendiya wêjewanên salên 90'î hêjayî nirxandineke berfireh e. Lewre nîfşa 90'î di wêjeya bakur de gelek kar û xebatên hêja kirin. Em dikarin vî nîfşî û kovara Rewşenê wek ekolekê bi nav bikin. Rewşen piştî Hawar û Tîrêjê di wêjeya kurdî ya li bakur de wek dibistanekê tevgeriya. Gelek kesan di vê dibistanê de derfeta xwepewerdekirinê bi dest xistin. Her wiha wê rê li ber gelek cureyên hunera kurdî û lêkolîn û nirxandinê re vekir. Ev nîfşa nû ku hemû ji xortên xwendevan û dilgerm pêkhatî, wek pitika bikeve ber çiçikê diya xwe bi coş û peroşî ketin nav livbaziyeke hêja ya nivîs, lêkolîn û xwendinê.

Lê di dawîya salên 90'î de bi rewşa civakê re helwest û berhemên wêjeyî hinekî berê xwe guhertin. Hinek ji nivîskaran înkara têkiliyê ya di navbera wêjê û politikayê de kirin û xwestin berhemên dîrî siyasî bîafîrin. Lê xwediyê van angaştan jî mixabin nikaribûn berhemine resen rabêrî me bikin. Bi ya min sedema helwesta van nivîskaran ew bû ku dengê xwe û kesayatiya xwe bi nîqaşên beredayî gur bikin û bi vî awayî cihêkî ji xwe re terxan bikin. Lê piştî demeke kurt nivîsên wan hatin guhertin û pala xwe dan rastiya civakî. Li vir

dixwazim destnîşan bikim ku di serî de berhemên gelekî xirab û dîrî pîvanên edebî wek mînakên baş di weşangeriya kurdî de hatine belavkirin.

Nivîskarên Rewşenê di berhem û afirandinên xwe de politîka tu carî piştguh nekirin. Heta em dikarin bibêjin qibleya berhemdariya wan heta demê rasterast politîka bi xwe bû. Heta ji wan dihat di berhemên xwe de îmaj, metafor û hêmayên politik bi kar dianîn. Ev rewş wê hingê tiştekî asayî bû, lewre her roj li ber çavên wan gund dihatin şewitandin, gel mecbûrî koçberiyê dikirin û kuştin û zîndankirin bûbûn tiştine ji rêzê. Van hemû rûdanên diltezîn helbet dê pênûs û wijdana nivîskarî



bihejanda û bikira ku bi awayekî aşkere û rût û tazî hest, raman û dilînên xwe dariştê ser kaxizê. Li hêla din van nivîskaran xwe wek pêşeng û mamosteyên gel didîtin û dixwestin hest, raman û hizra netewîtiyê gur û geş bikin. Ev helwest di heman demê de mîrateyek bû ji bo wan, çî ji wêjeya sedsala 20'an û çî ji siyaseta wê.

Helbet vî nîfşî di maweyeke kin de karibû xwe bikemilîne. Di ber xwendin û ezmûneke hûrgilî re rê û rêçikên wêjeyeke modern û li gor demê kartêker, dîtîn. Wêje her sal ji ya berê rengîntir û watedartir bû. Her çiqas ji ber nebûna edîtorî, rexnegirî û weşangerî û reklameke modern, berhemên hêja û yê xerab li nav guhê hev ketin. Xwedî û rêvebirên kovar û weşanên kurdî mixabin li nivîs û berhemên wêjeyî baş xwedî derneketin. Her li gorî siyaseta tevgeriyên. Ji ber hindê kovar û weşanên kurdî bi awayekî rêkûpêk nikaribûn jiyana xwe bidomînin. Vê rewşê kir ku berhemên sloganîk bêhtir ji xwe re, rê û derfetan bibînin. Helbet hinekan ev berpirsiyariya xwe bêtir ku ji pîvanên wêjeyî dûr bikevin pêk anîne.

Di nîfşê Rewşenê de çend kesên karibûn ji xwe re kiras û rengê modern bifasilînin derketin û bi vî afirîneriya xwe pencereyên nû vekirin li qesra wêjeya kurdî. Bi vî ji wêjeyê bêhtir ronahî dît. Ji van kesan Rênas Jiyani di berhema xwe "Janya"yê de helbest û politîka bi awayekî serkeftî bi cih kir. Bû berdevkê neteweya kurd; tevî êş û kulên wî, rê û rêçikên politîkayeke neteweyî destnîşan kir. Dîsa di "Mexzena xwînê" de portreyeke civaka kurd neqîşand û yek bi yek endamên vî civakê û ruh û giyanê wan ê ku li ber xwe dide raberî me kir. Ez dikarim bibêjim ku Rênas Jiyani bi berhemên xwe rastiya civaka kurd û realîteya politîkayeke çareseriyê danî ser sifra me.

Rênas Jiyani ku ruh û giyanî û bandora wê ya li ser tevgera însên di helbestên xwe de derxistiye pêş, Îrfan Amîdayê ku dixwaze pexşanhelbestê di vî zeviyê de bi cih bike, Kawa Nemirê ku serborî û serhatiya kurdan û nemaze yê ji ber neçariyê koçber bûne û di metropolan de wek kesên bê nasname û bê welat û bê ziman tevdigerin vedibêje û Lal Laleşê ku dixwaze helbesta rojavayê û ya kurdan çî klasîk çî modern di nav hev de bicebilîne û

avahiyeke rengîntir ava bike, di helbesta bakur de wek stêrkên şevê diçirûsin. Her wiha gelek ciwan jî li dorhêla wan ji xwe re li kuçeyekê digerin da li wir bihêwirin.

Dilawer Zeraq, Cihan Roj, Çiya Mazî, Roşan Lezgîn, Ronî War, Şener Ozmen, Yaqob Tilermenî û hê gelekên din di çîrok û romana kurdî de hem bi hefsarê estetîkê girtin û hem jî politîkayeke neteweyî bi cih kirin. Helbet netewebûn û hestên neteweyî û rêyên çareserkirina êş û kulên neteweyî di hemû berhemên de rengê herî tarî û birqonek e. Jixwe ev helwest jî rastiya qonaxa neteweya kurd e. Lewre ew dixwaze qeyd û bendên li ber nasnameya wî hatine avakirin hilweşîne û ber bi asoya xwe ya rengîn ve bimeşe.

Kesê bibêje ez politîkayê nakim û jê dûr im, neweyan dibêje. Em di nav şerekî de mezin bûn, xizani, neheqî, koçberî, stemkariya çandî hê berdewam e. Li dinyayê neheqî, mêtinkarî, gemarkirina xwezayê û gelek pirsgerêkên din bi hemû giraniya xwe bandorê li me dikin. Sedema travmaya ruh û giyanê me ev êş û kulên civakî ne. Ango kaniya berxwedan û têkçûna kesayata me bi van ve girêdayî ye. Vêca kesê ku bibêje ez ji van tiştan dûr im, yan jî bandorê li min nakin neweya dibêje û nikare berhemekê biafirîne.

Li hêla din, ger hestên neteweyî gur bûbin hinekî jî bi saya vî wêjeya kurdî ya berxwedêrî û têkoşerîya wê ye. Li gorî rexnevanê estetîkê Ernest Robert Curtius "Kesê bixwaze di hêla siyasî de rolekê bilîze divê pala xwe bide stûnên wêjeyê. Heta serweriya vegotin û nivîsê pêk neyê, xebata bo serweriya jiyana civakê bi kêrî tiştekî nayê û karekî pûç e. Divê neyê jibîrkin ku çarenûsa helbest û ya neteweyê bi hev ve girêdayî ne."

Bêguman wêjeya kurdî li bakur roj ji rojê çêtir û rengîntir dibe. Hewldan û helwesta wêjevanên bakur hêjayî pesindayîne ye ku dê di demeke kin de bikaribin estetîk û rengê kurdewar bi dest bixin.

**Mîr Celadet Bedîrxan, Hawar, hejmar, 20/1033, Şam*

Wêjeya polîtîk

Sînan SUTPAK

Wêje û polîtîka. Ji ber dahûrandinên klasîk ên li gorî modernîteya kapîtalîst û dahûrandinên li gorî modernîteya demokratîk, divê mirov van her du têgihan jî ji nû ve, cuda cuda binirxîne da ku girêdana wan zelaltir bibe.

Ev pêwîstî ji vê yekê tê, wêje û polîtîka bi navîka pîrsgirêkên civakê ve girêdayî ne. Li gorî guherîn û xwenûkirina jiyana, xwe nû dikin û vediguherînin. Bi guhertina jiyana civakî re berê xwe firehtir dikin.

Wêje ji berhemên nivîskî, yên bi nivîsên her awayî û devkî re; yên ku di milê naverok, awa û çawaniya xwe de, bi hincet û mexseda ku xwîner di der heqê mijarekê de serwest dike, ji aliyê derbirîn û têgihînê de têr dike, pê hest û ramanên xwîner dişidîne re, tê gotin.

Wêje rêbaza dahûrandina pîrsgirêkên civakî, derbirîna derd, kul û kovanan, rêbaza teşedayîn û raberkirina birînên civakî, derbirîna reng û bengên jiyana û derûniya civakê ye. Kêfxweşî, xemgînî, hêrs, tîrs, şaşwazî, dilgiranî, etirîni, minêkarî, hetikîn û hemû tîkiliyên mirovane dadihurîne. Ji wê yekê ye ku wêje kakilê giyana civakê ye. Çawani, reng, herikîn, lez û beza xwîna di damarên civakê de raber dike. Lewre wêje neynika civakê ye. Raber dike, dide raberkirin. Balê dikşîne ser alozî, xeletî û xetimînên rehên civakê. Êşa birînên veşartî dide der. Bi wê derbirînê civakê fêr dike û rê bi ber dixê.

Wêje fêkiya dara hestan e. Carinan tehl, carinan tîrş û carinan jî şîrîn digihîje tîgiha mirov. Ji hizira hestiyarî tê pelandin û di hizra dahûrandî de tê se-maxkirin. Bi çavdêrî û ceribandînan rojane di-hêvişê û weke fêkiya temizî, di çiqilên dara derbirînê de; di helbest, çîrok, çîrvanok, metelok,

fabl, gotar, cerb, destan û romanê de, carinan li ser kaxiz, bi hibira tîr û ron, a bi rengîn, carinan jî li ser zimanê dengbêj û çîrokbêjan de dide der û nav li xwe dike; carinan Mem û Zîn, carinan Siyabend û Xecê, carinan Cebeliyê Mîrê Hekariyan û Binevşa Narîn, carinan Edûla Emer Begê û Dewrêşê Evdî. Bi dahûrandin û fikirandina serpêhatî û qewimînan de dibe rêberê civakê.


Dara wêjeyê ya di dema civakbûna mirovahiyê de hatiye çandin, fêkiyên xwe yên çêjejan jî bê nav nahêle. Li welatê Zînê nav lê dike Bekoyê Ewan, di nava lehiya çemê çandê de şax diavêje Ewropayê û nav lê dike Mefistoteles.

Wêje bi dîtina nivîsê re derneketiye holê. Beriya nivîsê jî wêje hebû. Wêjeya devkî weke çîrok, gotinên pêşyan, gotinên efsûnî, stranên gelêrî jî qewimîn û qesidînan derketine û li têgihan asê dibin. Di zimanên ezmûndar de dihatin pelandin û diniquitîn têgihên nûgihayî. Her wiha, beriya ku çapxane derkeve wêje bi nivîsên destan, li ser kasikên heriyê û li ser çerm dihatin nivîsandin. Tê zanîn ku pirtûka Zerdestê Kal li ser çerm hatiye nivîsandin û ew "Penda rindik, gotara rindik, kirdara rindik" jî wê dahênanê ji me re diyarî mane.

Wêje çeka parastina civakê ye. Ew çek e ku li şûna berikê bêjeyan; li şûna barûtê hêmayan; li şûna guleyan tuwancan bi kar tîne. Di tîkoşîna civakê ya xwegihandina heqîqetê de xwedî rîsteke bê hempa ye ku dide tîgi-

handin û qanih dike. Her ku di gihîştina civakê ya heqîqetê de erka xwe dileyîze, civakê nêzikîti heqîqetê dike û avê dide aja hizra civakî.

Wêje bi zimanê gelekî yan jî neteweyekê, weke nîrxê wî gelî derdikeve holê, lê xwedî bandoreke gerdûnî ye. Bi wergerandina zimanên cur be cur di nava gelan de belav dibe û dibe amûra ragihandina çandê.



Polîtîka li gorî nêrîn û dahûranînên klasîk; “Derbirîna aborî a tîrkirî” û domandina şer a bi amûrên din e.” Li ser van peyitandinan polîtîka dihat nîrxandin. Bi nîrxandinên bi vî rengî polîtîka di qalibekî bê ruh, bê reng de dima. Milê wî yê sincî û wijdanî vala dima. Her wiha nîrxandin tişî diman.

Bi nîrxandin û peyitandinên modernîteya kapitalîst de girêdana konevanî û sincê bi awayekî zelal û zexm nehatibû çêkirin. Ji ber wê yekê ye ku weke pêşdaraziyekê, di hizra mirov de polîtîka, weke gerandina dek û dolaban rûniştibû.

Bi dahûrandin û peyitandinên birêz Ocalan, ên di pirtûka wi ya bi navê “Sosyolojiya Azadiyê” ve ew têgih û qalibên li gorî modernîteya kapitalîst; aborî, şerê çînî û neteweyî, tev ser û bin bûn. Di heman demê de di dahûrandinên xwe yên ji tecrubeya şaristaniyê û ji rûxandinên dîroka mirovahiyê ya dûr û dirêj pelandî de, pêdiviya girêdana polîtîka û sincê bi awayekî zexm û zelal raber dike û konevaniyê weha bi nav dike; “Polîtîka di rastiya xwe de rêzikên sincî yên pêwîst bi civakê re peyda dike û bi vê ve girêdayî pêdiviyên bingeîn ên dargî û hizrî dabîn dike û bi nîqaşên domdar ve bi biryar dike”

Bi vê peyitandinê ruh dide konevaniyê. Şaxên konevaniyê yên giyanî, jiyânî, sincî û wijdanî zexm dike. Her wiha bi van peyitandinan, konevanî bi nêzikbûna rastiya mirov û civakê ve bi sînor namîne, dibe rê û rêbaza sererastkirina aloziyên civakê, ku di her kêliya jiyana mirov de, di danûstandina mirov de pêdiviya mirov bi van rê û rêbazan heye.

Her wiha, birêz Ocalan di pirtûka xwe ya bi navê “Di rojhilata navîn de qeyrana şaristaniyê û çareserîya şaristaniya demokratîk” de konevaniyê bi vî awayî dipeyîftine; “Polîtîka ew e ku di mijara pîrsgirêkên ku rojane derdikevin pêşberî civakê de, tevahiya biryarên hatine standin e.” Ev peyitandin jî zinditî û livdariya konevaniyê raber dike. Kêlî bi kêlî girêdana wê ya bi jiyana civakî re li ber çavan radixe. Konevanî di hemû nêzikbûnên sar û germ, mîmîk û mîzaca mirov de, di her kêlî û kitekitên jiyânê de veşartî ye.

Cudahiya di navbera wêje û konevaniyê de

Di vê xalê de cudabûna di navbera konevanî û wêjeyê de derdikeve pêşberî me. Wêje ji nava jan, êş, şadî û bextewariyên civakê derdikeve holê û bi zimanê wê civakê, pîrsgirêkên heman civakê derdibirîne. Lê di cî û war de sînoran nas nake. Di

raberkirina pîrsgirêk û rastiya wê civakê de bandan napejerîne, gerdûnî ye. Bi demekê ve girêdayî namîne. Pîrsgirêkên civakê yên wê demê derdibire lê bandora wê derbirîne bi sedsalan didome. Mî-naka vê yekê destana Gilgamêş e ku di dema şaristaniya Sumeran de hatiye jiyîn û B.Z. 1250’yî de ji aliyê kurdekî Kasîdî yê bi navê Sîn Lekke Ünîni ve, li ser kaxizên heriyê hatibû nivîsandin e. Destana Gilgamêş beşek ji Mîtolojiya Sumeran e. Her wiha pîrsgirêkên civakî yên dema Sumeran û lêgerînên dargî û hişî dihundirîne. Ev sê hezar sal in ku ew berhem bandora xwe didomîne û hin jî dibe hinceta dahûrandin û lêgerînên zanistî yên der barê civak û şaristaniyê de.

Wêje dengê bindestiyê ye. Berteka bandorên ne ji rêzê û ne xwezayî ye. Li hember nejrêziyê rêzikan dihone, pîvanan pêşkêşî helwestên ne ji rêzê dike.

Polîtîka kêlî bi kêlî ye, rojane ye, demdemî ye, herêmî ye. Li gorî danehev û mebest, wijdan û sinca mirovî û desthilatdariyê diguhere. Her wiha li gorî dem û helwestê teşe digire, teşe dide berhemên civakê. Ji ber wê yekê ye ku girêdana konevanî û wijdan dibe pêdiviyek.

Li gorî van daneyan em dikarin bibêjin ku konevanî amûra rêvebirin û teşedayîne ye. Ango rêbazê serdestiyê ye.

Ji aliyê ziman ve wêje û polîtîka

Zimanê polîtîkayê fermî ye, bi fetl e. Li gorî bûyer qewimîn û qesidînê, helwest û armancê diguhere. Gelo dê bi çî awayî bê nîrxandin, bandoreke çawa bê kirin, encameke çawa derxîne holê û hwd. Di van xalan de zimanê konevaniyê bi guman, nepen e, berjewendîparêz e.

Zimanê wêjeyê diyar e. Ji ber ku ji dilê dayîka xwe angû ji jiyânê diwelide, ji ber ku ji dengê dilê dayîka xwe olan dide, xweser û vekirî ye. Ji ber ku di hembêza dayîka xwe angû ji jiyânê de digihîje, ji aliyê rê û rêbazê ve bi xwe bawer û bi aheng e. Ji ber ku çêjîkên jiyânê dimêje û digihîje, kêşvan e, germ e, jîr û didaktîk e. Carna rasterast, carna jî bi îronî û tuwancan, qerf û pêkenokan derdibire. Tîrên peyamên xwe di giyana mirov de dadiçikîne û di giyana mirov de desthilatdariya xwe dide peji-randin. Zimanê wêjeyê ji ber ku xwe, ji dayîka xwe jiyânê berpirsiyar dibîne, di xîtabê de ne bi sînor e. Tenê xîtabî êlekê, olekê, girseyekê, qewmekî, gelekî û neteweyekê nake. Dibe zimanê derbirîna civakê û pîrsgirêkan; hevî, pêdivî, û daxwazên civakê tîne ziman. Li gorî dem û cî, mêjû û helwestê naguhere. Ji ber ku di aliyê wateyê de xwediyê newalên kûr û

çiyayên bilind e, bi ber e. Li gorî têgihîştina xwîner çêjê dide. Di aliyê têgihîştinê de xwediyê wateyeke felsefî ye.

Wêje xwediyê zimanekî nerm û tewandî ye. Nişmî û didaktîk e. Bi honandinên xweser û bi pîvanan peyaman dihone. Di honandina peyaman de zor vebijêr e. Pirsgrêkên civakê bi peyaman dipeyîtîne û pêşkêşî dahatûyê dike. Di aliyê reng û bengê de reş û spî napejirîne. Alternatîfan pêşkêşî civakê dike.

Ji aliyê hizrî ve wêje û polîtîka

Di wêjeyê de bêtir hizra hestiyariyê li pêş e. Hisên civakê dadihûrîne û bi xwîner dide pêjnkirin. Valahiya derûnî dadigire. Ango di aliyê manewiyatê de risteke bê hempa dileyîze. Di vê xalê de mirov dikare pirtûkên pîroz wekî mînak bide. Tewrat, Încîl, Zebûr û Quran ew in ku li ser manewiyata mirovahiyê xwediyê bandoreke bê hempa ne. Mîtolojiyeke xurt tê de hatiye afirandin û valahiya giyanî dagirtiye. Bi efsaneyên afirandinê di têgihîştina mirov de deriyên nû vekirine û rê li ber afi-

randinê vekirine.

Di polîtîkayê de rêbaza dahûrandinê di asta herî bilind de tê dîtin. Rêbaza dahûrandinê di der barê armancekê de, bi giranî jî li ser daringiyê, li gorî çarçoveya armancê lê digere û li ser kitekitên danûstandina civakê kûr dibe. Bi heska janan hizra hestiyariyê tevdiide, mij û morana hizra hestiyariyê li moxila xwe dixê, dipelîne û dixê qalibekî. Mirov dikare wî qalibî weke polîtîkaya wêjeyê bi nav bike; dê bi çi awayî raber bike, bi kîjan rêbazê biderbirîne, bi kîjan peyaman siwarî baskên hêmayan bike û wan tîran bi kîjan rengî bi ser têgihîştina xwîner de bişîne. Şiyarkirin û serwestkirin karê polîtîkaya wêjeyê ye. Lawazî û otokontrola xwîner jî xemên polîtîkaya wêjeyê yên sereke ne.

Wêjeya devkî

Wêjeya devkî wêjeya Mezopotomyayê ye. Gelên Mezopotamyayê xwedî dewlemendiyên sererd û binerd in. Ji ber wê dewlemendiya xwe, her tim welatê wan hatiye talankirin, wêrankirin. Ji ber wê gelên Mezopotamyayê wêjeya devkî afirandine.

Wêjeya devkî bi taybetî jî ji bo gelê kurd tê wateya parastina rûmetên gelêrî. Çand û zimanê kurdî bi wêjeya devkî jî tofanan filitiye. Gelê kurd li hemberî dagirkeriya navneteweyî, li hemberî zext û zoran li ber xwe daye. Di wan berxwedanan de trajediyên hatine jiyîn bi wêjeya devkî hatine parastin û weke stranên gelêrî û efsaneyan hetanî îro hatine.

Welatê me Kurdistan bi destên hêzên dagirker ên navneteweyî hate parçekirin. Her wiha gelê kurd kirin çar parçe û avêtin ber devê malxur û leşxuran. Di wan perçiqandin û talankirinan de tiştê ku cewherên gelê kurd parast, wêjeya devkî ye. Her ku gelê me ji hev hat qutkirin, sazî û dezgehên gelerî hatin rûxandin, trajediyên mezin hatin jiyîn. Di wan qewimînan de wêjeya devkî xwe komî ser hev kir, xwe atomîze kir û xwe di zimanê



dayîkan, stranbêj û çîrokbêjan de veşart. Di wê veşartinê de wêjeya gelê kurd hat parastin ku îro kêlî bi kêlî bi xwe ve tê û bi têkoşîna gelê kurd ve dinya lê ronî dibe, jiyan me ronî dike.

Wêjeya politîk

Nîqaşên wekî “Wêjeya ji politîkayê dûr” an jî “Divê wêje bi politîkayê ve negirêdayî be” û hwd. bi serê xwe alîkariya konevaniya desthilatdariyê dikin û angaşên politîk in. Wêje û politîka weke goşt û neynok bi hev ve girêdayî ne. Wêjeya bê politîka weke şîva bê xwê ye. Tehmsar e ku tenê mirovên nexweş dikarin pê debara xwe bikin.

Ger wêje giyana civakê be, politîka bersiva “Giyaneke çawa” ye. Ger wêje derbirîna pirsgrîrêkên civakî be politîkaya wêjeyê reng û çawaniya çareserkirina pirsgrîrêkên civakê ye. Wêjeya politîk hizra civakê ya dema xwe ye. Dema xwe dadihûrîne û bi zimanekî politîk, bi rêbazeke didaktîk, bi dem û war ve negirêdayî vedibêje û pêşkeşî civakê dike. Wêjeya politîk hest, giyan û derûniya civakê digire dest û bi awayekî dahûrînerî dihone. Di honandina xwe de estetîze dike. Di wê estetîzekirinê de hişmend e, hewngir e. Mebesteke wêjeyê heye. Ew mebest beyî politîka nabe. Her wiha politîka pêşbîniya wêjeyê ye. Hevûdin dixin formatekê.

Modernîteya kapîtalîst hemû amûrên ragihandinê kiriye alavên konevaniyê û mirovan li gorî bîrdoziya kapîtalîzmê beralî dike. Ji bo vê xetereyê birêz Ocalan dibêje; “Xwarin û vexwarina me jî kirine bîrdozî” Her wiha politîkaya wêjeya kapîtalîzmê giraniyê dide teşeyê. Xîtabî ajoyên civakê dike. Bi giranî jî li ser şexs disekine. Civakê bi hizra ezeziyê ve bi sînor dihêle. Hişê civakê bi çareserkirina pirsgrîrêkên xwe bi xwezayî asteng dike: “Ez dê çi bikim. Çawa bikim, çawa bi dest bixim, çawa ber bi xwe ve bikişînim?” Modernîteya kapîtalîst bi vê konevaniyê wêjeya mêtîngeriyê bi pêş dixe û dixe hinava mirovan. Hiş, hest û pêjna mirov kiriye nava tora xwe ya beralîkirinê.

Li hemberî vê konevaniyê, wêjeya modernîteya demokratîk xwedî konevaniyeke civakparêz e. Di-jberî beralîkirina modernîteya kapîtalîst xwedî helwest e. Xwîner li hemberî mêtîngerî, dagirkerî, zordestî û hemû kirinên dijmirovane şiyar dike, di warê parastina civakê de serwest dike, hêza wî raberî wî dike, wî dişidîne. Di wê serwestkirin û şidandinê de xwenasî, civaknasî, derdornasiyê esas digire.

Wêjeya politîk bi peyamên dagirtî tabûyan rûdixîne. Wêjeya ku bi destê Îbrahîm pûtan dide şikandin, wêjeyeke politîk e. Bi wê politîkbûnê di mêjiyê xwîner de tabûyan dişikîne, dogmayan rûdixîne û wî jî bo çareserkirineke nêzikî heqîqetê

dixe nava lêgerînê.

Di civakên bindest de hişmendiya parastina kakilê civakê, ango parastina malbat û jinê - namûsê- zor xurt e û mijareke hesas e. Modernîteya kapîtalîst di pêşxistina mêtîngeriyê de ji ber ku takekesiyê esas digire, malbat û jinê dike hedefa xwe. Di romaneke ku berxwedana têkoşerên Cezaîrê girtibû dest de, beriya têkoşîna gelê Cezaîrê a li hemberî dagirkerên fransî, di nava sosyolojiya Cezaîrê de, jimalderketina jinê dihat wateya mirina wê. Nivîskarê romanê bi awayekî balkêş heman mijar dahûrandibû. Dagirkerên Cezaîrê jina malê sê rojan girtibû binçavan. Zext û zor lê hatibûn kirin. Ew lehenga jin jî ji êşkenceyê bêtir ji helwesta mêrê xwe û civakê ditirsiya. Piştî sê rojan dema vegeyabû malê, ji ber tirsê mêrê xwe, êşa canê xwe ji bîr kiribû. Jinika lehenga dema dikeve hundir mêrê wê dibêje “Tu ne birçî yî?” Êdî helwesta têkoşerên Cezaîrê guheriye. Nivîskar di wê berhema xwe de ne tenê rê li ber têkoşerên Cezaîrê dixe, ji bo têkoşerên hemû gelên bindest, alternatîfan pêşkêş dike.

Wêjeya politîk di honandina peyaman de zor ve-bijêr e. Bi wan peyaman, kêmasiyên di jiyan xwîner de raber dike, ji bo dagirtinê alternatîfan pêşkêş dike, xetereyên li pêş civakê raber dike û alternatîfan pêşkêş dike. Her wiha de aliyê lawaziyan de dibe neynika civakê. Di warê qanihkirin û têgihîştinê de tuwancan bi kar tîne û bi ferasetên baştir xwîner ber bi xwe ve dikişîne.

Dema mirov Destana Gilgamêş dixwîne, xwîner jî ku dera cîhanê, ji kîjan olê, gelî û neteweyî dibe bila jê be, heman tiştî pêjn dike. Hevaltiya Gilgamêş, lêgerîna wî ya dermanê nemiriyê, ango heqîqetê xwîner dixe nava lêgerîna azadiyê. Dema mirov “Sefîlên” Wîktor Hûgo dixwîne, heman pêjn û bandor derbasdar e. Dema mirov “Oblomov” a Goqarov dixwîne her wiha. Di wan klasîkan de pirsgrîrêkên civakê yên dema wan, bi wêjeyeke politîk hatine dahûrandin û bûne neynika civaka wê demê.

Feylesofê Nemir Ehmedê Xanî jî di “Mem û Zîn” a xwe de bengdariya du hezkirîyan digire dest. Ji dahûrandin û şîrovekirina wan bêjeyan pizotîn em îro tê derdixin ku Mem ew (em) bi xwe ye (ne) û Zîn jî welatê wî (me) Kurdistan e. Bandora wê wêjeya giranbiha ku bi konevaniyeke giranbihatir hatiye honandin û bi sedan sal in didomin û di warê serwestkirina ruhê kurdewar de rista xwe dileyîze.

Wêje bê politîka nabe, çawa ku tov bê ax û av nabe.

Têkiliya wêje û polîtîkayê



Fatma SAVCI

Di gelek qonaxên dîrokê de, têkiliya wêje û polîtîkayê hatiye nîqaşkirin. Her îdeolojiyê, her çînê li gor nêrîn û pêdiviyên xwe têkiliya wêje û polîtîkayê nîrxandiye û li gor berjewendiyên xwe nêzî vê mijarê bûye.

Wêje û polîtîka her du jî rastiyeke civakî ne. Qada van her du têgihan jî mirov û têkiliyên mirov in. Li gor ku çavkaniya van her du mijaran jî civak e û afirînêriya wan li ser bingehê vê civakê ava dibe, nexwe divê ku têkiliya wêje û polîtîkayê jî bi hev re hebe. Ne heman tişt bin jî, divê ku derinan serê wan rastî hev were.

Polîtîka:

Polîtîka dest diavêje hemû mijarên ku mirov di jiyana xwe ya civakî de lê rast tê. Mirov dikare wek birêvebirina dewlet, welat û mirovan jî fam bike. Mirov di xwezaya xwe de ji hev cuda ne, li gor rewşa xwe ya civakî û aborî xwediyên ramanên cihê ne. Polîtîka li ser bingehê van fikrên cuda û berjewendiyên cuda ava dibe. Her raman û îdeolojî jî bo bidestxistina desthilatdariya xwe polîtîkayê wek rêbazekê bi kar tîne. Hemû ramanên rêvebir û dijberên wan ku dikevin pratîkê polîtîka ye. Bi kinayî polîtîka hemû raman û çalakiyên der barê birêvebirina mirov û desthilatdariya civakê de ne. Lewra mirov li cihanê ne wek takekes, lê belê wek hebûneke civakî dijî. Polîtîka jî ji vê pêdiviya birêvebirina komên mirovan ava bûye.

Wêje

Wêje hunereke bi hêz a vegotinê ye. Wêje hunera vegotina raman, hest û xeyalên mirovan in. Hunereke bi bandor û xweşik e ku hem bi nivîskî, hem bi gotin tê ser ziman. Wêje jî têgiheke berfireh a civakî, çandî û takekesî ye û çavkaniya wê jî jiyana bixwe ye. Her afirînêriyeke wêjeyî çalakiyeke mirovan e û li gor rastiyan civakî pêk tê. Mijara wêjeyê hemû gerdûn e û problemên wê ne, loma jî bê sînor e û bê dawî ye. Hemû berhemên ku bi

hunereke estetîkî hatine nivîsîn, hem bi teşe, hem bi naveroka xwe digihên kûrahiyekê, wek berhemên wêjeyî tîn binavkirin. Bi kinayî wêje neynikeke bê kêmanî ye ku dikare hundirê mirov û civakê nîşan bide. Her cureyê berhemeke wêjeyî xwedî nêrîneke taybet, felsefeyêke jiyanê û xwedî perspektîfeke xwezayê ye. Wêje xwedî erkeke civakî ye, ji ber vê yekê tim bala mirovan kişandiye û mirov eleqedar kiriye.

Hemû qadên jiyanê tevî polîtîkayê mijara wêjeyê ne:

Wêje tu sînoran nas nake, hemû qad û pirs-girêkên jiyanê mijara wêjeyê ne. Li gor ku polîtîka jî parçeyekî jiyanê ye, nexwe nikare têkildarî polîtîkayê nebe. Divê ku di berhemên wêjeyî de, hemû nakokiyên jiyanê, bindestiya neteweyan û çînan, neheqiyên li jiyanê dibin, bêdadiya belavkirina aboriyê, êşên mirovan, werin nivîsîn an vegotin.

Dîroka wêjeyê jî dide xuyakirin wêjevanê ku li dûrî rastiyan jiyanê rawestiyaye û hewl daye wêjeyê tenê ji bo wêjeyê biafirîne berhemeke hêja neafirandiye. Berevajî vê yekê, hemû berhemên ku wek mîrat bûne milkê mirovahiyê tu carî ji polîtîkayê dûr neşekinîne û bê alî nemane. Mezinahiya wan berheman jî ji vir tê ku wêjevan bi ramanên pêşverû, bi awîrekî rexneyî û peyamên polîtîk nivîsîne. Lewra wêje hewl dide rastiyan derxe holê, hewl dide rastiyan bi awayekî estetîk nîşan bide. Wêje nikare ji têkilî û rastiyan civakê dûr bisekine û her wiha nikare ji polîtîkayê jî dûr bisekine û dest nede mijarên polîtîk. Lewra ev ê ji wêjeyê re neheqiyek be. Wêje di mijarên polîtîk de jî ne bê teref e, nikare bêalî be. Eger wêje bê alî be, nexwe wê tu rola wê ya pêşverû tune be. Nexwe wê di guherandina civatê û pêşxistina mirovahiyê de ne xwediyê tu rolî be.

Wêjevan mirovên hişyar û serbixwe ne:

Wêjevan ew kes in ku di berhemên xwe de, hemû rastî, hemû şert û mercên civaka xwe radixin ber çavan. Eger ne wisa be nexwe tu rastî û tu feydeya vê berhemê tune ne, ji bo mirovahiyê jî bê wate ne. Wêjevanê xwedî wişdan û durist nikare xwe ji rastiya politîkayê dûr bixe û çavên xwe li ber bigire, serê xwe li ber bê dadî û kirinên ne li rê bitewîne.

Wêjevan ew kes e ku nikare piştî xwe bide pirs-girêkên civak û mirovan. Nikare çavên xwe li ber rastiyan dema ku tê de dijî bigire. Wêjevan di berhemên xwe de teqez xwedî helwesteke radîkal e. Lewra ew nîşandayîna pirs-girêkên civakî û guhertina civakê weke erkeke dibîne. Tevî ku wêjevan vê yekê nebêje jî, bi berhemên xwe dibêje ku ew berpirsiyar e ji fêrkirin, nîşandayîn û guhertina civakê.

Divê ku wêjevan lêpirsîna civak, desthilatdarî, zeman û awayê jiyîn û birêvebirina civakê bike. Wêje mecbûr e mirov û têkiliya mirov a bi derdorê re vebêje. Lewra wêjevan li hember hemû qewimînan mirovên herî hişyar û hestiyar in. Ew naxwazin werin bi sînorkirin û pêşiya wan bi qaliban were girtin. Hewl didin ku fêrkirin û bûyerên ne layiqî mirovahiyê, pêk neyên. Hewl didin xwe fêrî neheqî û nexweşiyên nekin, loma ji dêvla hemû mirovahiyê ve êşê dikêşin û bi wê êşa xwe berhe-man diafirînin.

Tevî ku wêjevan bi giştî wek kesên nerm û bê deng dixuyên jî, ew serhildêrên herî dijwar ên civakê ne. Di berhemên xwe de, bê tirs, li hember Xwedê, li hember desthilatdarî û qanûnên wan, li hember civakê û zagonên wan û li hember hemû pergala heyî derdikevin. Û gelo em dikarin politîkayê ji van mijaran veqetînin û biavêjin aliyekî? Em dikarin bibêjin ciyê politîkayê di nav van mijaran de tune ye?

Her wêjevan xwediyê awirekî politîk e:

Her nivîskar li cîhan û qada ku dijî teqez xwedî awirekî politîk e. Wêjevan bixwaze nexwaze ra-mana xwe di berhema xwe de dide der.

Lê belê ne direkt, ne ku di nav rêzikên xwe de bike hawar. Ne ku diruşmeyan berz bike û berhema xwe bike metna partiyeke siyasî. Lewra diruşme rastiyan ku wê wêje vebêje biçûk dike. Jiyanê di çavên wêjeyê de teng dike. Belê her wêjevan xwediyê awirekî politîk e, lê ne wêje ne jî wêjevan ne dilê politîkayê ye.


Lewra wêje ne amûreke sivik, basît a politîkayê ye. Nabe ku politîka bibe desthilatdarê raman û wişdanê wêjevan. Di dîrokê de gelek mînak hene ku hêzên politîk xwestine wêje bibe navgîneke politîkayê û li gor berjewendiyên xwe yên teng bi kar bînin.

Wêje ji derveyî hemû sînorên teng ên politîka û disîplîna wê ye. Lewra wêje ne girêdayî tu zagona heyî ye, li gor xwezaya xwe divê hemû sînoran derbas bike û hemû dîwaran bişikîne, hemû perdeyên li ser jiyan û mirovan daxîne û xwe bêhtir bi kûrahiya her tiştî ve berde.

Loma wêje xwedî hêzeke mezin e ku dikare pirs-girêkeke heyî bi zîmanekî xweş û estetîk, bi awayekî balkêş û kûr vebêje û nîşan bide. Berhemeke wêjeyî ya bi vî awayî wê ji pirtûkeke teorîk a politîk baştir û bi bandortir be.

Bi kinayî li gor raya min, divê wêje xwedî awirekî politîk be lê ne dilê partî, dewlet an hêzeke din a politîk be. Lewra wêjeyeke dil nikare pêşengiyê ji civakê re bike. Lewra giyanekê dil nikare ramanên azad biafirîne. Wêjevan ser-hildêrên dema xwe ne, dijberên hêzên dîlgirtinê ne. Ew wişdanê zelal ê mirovahiyê ne. Dema pêdivî pê hebe bedelên mezin dide û bi tena serê xwe dikare dîktatoran tehdît bike. Lewra wêje etîkeke nebînayî ye û etîka wê azadî ye, xweşikahî ye.

Wêje, polîtîka û pêwendiya nivîskarên kurd



Çiya MAZÎ

Ji ber ku wêje ji jiyanê tê û wêjevan di nava ji-yana civakî de mezin dibe, polîtîk in. Heke wêjevanek wekî mirovên civakê, ji wê jiyanê hez bike; daxwazên xwe di derbarê wê de diyar bike, ew dibe polîtîka. Ji bo nivîskarên kurd polîtîkbûn realîteyek e. Ji ber ku ji sibê heta êvarî û ji êvarî heta sibehê polîtîka li dora wan e.

Wêje di derbarê jiyanê de agahiyan dide mirovan. Xweşikî û êşên jiyanê, bi mirovan dide fêmkirin an jî hezkirin. Helbestvanek ku pesnê tiştekî bide an jî tiştekî, kesekê/î hez bike, ji welatekî hez bike, ji civak an grûbekê hez bike û bîne zimên, ev dibe polîtîkaya helbestvan bi xwe.

Lê wêjevan ne wekî kesên siyasetmedar an kesên ji rêzê xwestinên xwe bilêv dike. Di vê derê de em tên û li ser rêbazên bilêvkirinê û nivîsandinê disekinin, em bi xweşikiyê an estetîkê re rû bi rû dimînin; wê çiqasî qebe be, çiqasî nazîk û narîn be, çiqasî fêmdar û bi bandor be. Wêjevan wê hezkirina xwe çiqasî zanibe bi mirovan bide fêmkirin û hezkirin. Ev girîng e û wateya wêjeyê li vir derdikeve holê. Wêjevan ji tiştekî hez kiriye yan ji fikrekê hez kiriye yan jî fikreke wî heye, di hişê wî de tiştin afirîne û dixwaze kesên din jî ji wan aferîdeyan hez bike yan dixwaze kesên din jî ji hezkirinên wî hez bike. Îcar bi vê ramanê dikeve livek wisa ku dibe misyonerê fikrên xwe yan jî neqilkariya fikrên xwe dike. Her wiha di-kare neqilkariya fikrên kesên din jî bike. Ango wêjevan ne ku ilehîm hezkirinên xwe û fikrên xwe tîne zimên; ew fikir û hezkirinên mirovên ji derveyî xwe jî dikare neqlî civakê an neqlî kesên sêyemîn bike.

Di vê derê de jî dîsa ya girîng, rêbazên xweşik-neqilkirinê yan xweşixuyakirinê ye. Ji ber ku wêje fikra jiyanê estetîzekerî ye, rûyê jiyanê bi vegotinê

hatiye holê ye; wê demê tu dixwazî partiyekê, tu dixwazî serokê wê partiyê têxe destê xwe; tu dixwazî keçekê, zarokê, xwezayê yan ajalekî têxe destê xwe û estetîze bike, ew jî wêje bi xwe ye.

Ji ber ku wêjevan polîtîkaya xwe yan polîtîkaya wêjeya xwe, bi xwe diafirîne û ji ber ku ji kesên din destûrê naxwaze, midaxeleya ji derve bê kirin tenê rexne ye. Ji bilî vê yekê mirov nikare midaxeleya bike. Dibe ku helbestvanek helbesteke pir erotîk jî binivîse, dibe ku babetek pir dûrî civakê ku tê de dijî jî bîne zimên, lê vê yekê bi rêbazên edebî û estetîkê pêk bîne, teqez hinek kes û grûp jî vê şewaza wî hez bike û bandorê jê bistîne. Wê ew helbesta erotîk nûnertiya wan kesan û wê grûba ku jê hez dike, bike. Gelo mirov dikare bibêje “Çima wisa dinivîse” û asteng bike? Gelo mirov dikare bibêje

“Çima ne wisa ye?” Rexne divê, lê nepejirandin an xwestina jîholêrakirina wê helbestê, nepejirandin û xwestina jîholêrakirina wê grûbê ye. Wê demê mirov bi vê fikrê dixwaze hezkirinên wan jî asteng bike. Wekî mirov bibêje “Te çima ev helbest nivîsandiye.” Heke bi maneya sêdarkirinê bê gotin, wekî mirov bibêje; “Tu çima ji vê keçikê hez dikî? yan “Te çima simbelên xwe berdane?” Ev yek ji demokrasîyê dest pê dike heta mafê

hezkirinê ya ji xwe, ya ji xwezayê û heta babeta mafê mirovan bi xwe jî dihere.

Pêwendiya nivîskarên kurd û polîtîkayê yan jî siyasetê

Dema ku tê gotin “Bila wêjevanên kurd ji siyasetê bi dûr kevin”, bi ya min tê wê maneyê ku “Wêjevanên ku dixwazin berhemên hêja biafirînin bila ji siyaseta aktîf bi dûr bikevin.” Lê dema ku ev tê

gotin hinek kes bi pêşbînî lê dinihêrin. Ev pêşbînî di nava saziyên siyasîetan kurdan piran de heye. Ev fikra ku “Divê wêjevan ji siyaseta aktîf dûr be” diecibînim. Ji bo çi ev fêmkirin bi min re çêbûye; wekî gelek nivîskaran jiyana ne temam û ne aram, ev fikir bi min re çêkiriye ku “Divê nivîskar karê xwe bike.” Ji bo ku mirov karekî bi rêk û pêk bike divê mirov bi hostetî û pisporî bike, ne wekî naşî û şagirtêkî. Ji ber ku mirov tabê nebîne, êşê nekişîne, ku mirov xwe ji hinek tiştên jiyanê bi dûr nexê û ji hin tiştan fedekariyan neke dê çawa berhemên hêja bê afirandin? Dibe ku wêjevanek piştgiyê bide siyaseta aktîf û tevî daxuyaniyan jî bibe, lê bi ya min ji wêjevan re ne hewce û ferz e ku têkevin rêveberiya partiyên. Bêguman di vê derê de sinorekî hesinî tune ye; dibe ku hinek karibin wêjeyê û siyaseta aktîf bi hev re bimeşînin û kes nikare bi pêxîla kesî jî bigire, lê belê mebest li ser karê xwe hûrbûn û ponijandina kûr e. Gotineke rûsan heye dibêje “Heke mirov bera pênc heb kîvroşkan bide, mirov yekê jî zêft nake.” Lê heke wêjevanek tenê li ser çirokê yan babetên wêjeyê yê din bi salan bifikire û jiyana xwe li ser bike, teqez dê bi ser bikeve û berhemên hêja biafirîne. Ji ber çi? Ji ber ku ji bo berhemên hêja demên hêja û dirêj divê, ponijandina kûr û hûr divê.

Çima dema ku behsa wêjevanên dinyayê û berhemên wan ên hêja tê kirin siyasatmedar û wêjevanên kurd xweziya xwe pê tînin û dibêjin “Ax heke ev kurd bûya piştî me nedigihastê erdê?” Bi rastî civaka kurd a niha bi piranî wisa difikire; him dixwaze berhemên hêja bê afirandin û him jî ew bi xwe asteng dike. Asteng dike lê hay jê jî tune ye ku asteng dike. Dikare ji wêjevanekî/ê re bê gotin “Here di partiyê de bixebite”, lê nikare bibêje “Here karê xwe bike, çi eleqeya te bi partiyên re heye?” Ango berovajî vê peyva dawiyê helwesta gelek kesan e. Gelo ne hêja ye ku mirov ji wêjevanan re bibêje û sozê ji wan bistîne; “Karê xwe bikin, başbikin û navê welatê me, jiyana mirovên me, çanda me, wêjeya me bi cihanê bidin naskirin. Heke hûn nedin naskirin, hûn berhemên hêja neafirînin em ê destên xwe têxin qirika we û bi paxila we bigirin.” Hêja ye û hewce ye ku mirovên kurd vê hevokê bi cih bin.

Xwezîka wisa bûya. Xwezîka wisa bûya û wêjevanên kurd ji siyasatmedar û civaka kurd ev peyvên hanê bibihîstina. Lê wekî me got berovajî vê yekê helwestek li dar e a niha. Wêjevanên ku dibêjin “Ez dixwazim tenê karê xwe bikim” jî gelek caran rastî rexneyên tûj tên. Ev helwest ne tenê yê partiyekê an saziyekê ye, bi rastî ev helwest yê pirê partiyên

siyasî û saziyên kurdan e, anga siyaseta kurdan a niha dixwaze wêjevanan têxe bin bandora xwe. Her yek ji aliyekî wêjevanan bi ber xwe dikişîne. Bêguman ev helwest ji tîrbûn û hewcedariya têkoşîna azadiya welatekî tê. Ji ber wê yekê jî dibe ku heta demekê û sinorekî ev helwest bi giranî xwezayî bê dîtin. Lê êdî divê ew dem xelas bibe. Lê wê demê objektîviya wêjevan jî kêr dimîne û nikare bi serê xwe yê aram û serbixwe bifikire. Ji xwe wêjevan bixwaze nexwaze jî, bi helwesta xwe ku tevî hemû zehmetiyan jî, bi kurdî dinivîse, pêşiyê li wê têkoşînê bi awayekî xwezayî, her tim vedike.

Çima wê wêjevanekî/e kurd ne di bin bandor û siya siyasatê de, lê bi serê xwe romanûsek bi romana xwe, helbestvanek bi helbesta xwe, çiroknûsek bi çiroka xwe şervanekî kurd bike fenomen û li nava dinyayê bigerîne. Ev yek bi xebat û lêhûrbûnê pêk tê, bi ta û derziyê tê holê, ne bi durîşmeyî û peyvên sivik.

Bi rastî ev jî heye; wêjevan bi xwe jî hê xwe azad nekiriye û gelek caran xwe bi xwe dixin vê dafikê. Hingî hinek wêjevan di bin bandora siyaseta ku jê hez dike de ye û li bendî firsetê ye; dema ku mirov behsa “Dûrketina ji siyasatê” dike, ew tenê dûrketina ji partiya xwe fêr dike yan jî dixwaze wisa bide fêmkirin. Heke wêjevanek nêzî siyaseta ku ew jê hez nake be, dibêje “Ew kes siyasî difikire.” Loma jî ji hemû berhemên wî/ê re dibêje “Ne başe.”

Bi gumana min ev jî tê jibîrkirin; heke kesek bi rastî wêjevan be û karê wî tenê wêje be, divê li xwe û wêjeya xwe xwedî derkeve. Çi dibe bila bibe, divê karê xwe bike û li ser mijaran başbifikire. Wêjevanên dinyayê ji bo berhemên hêja biafirînin jiyana xwe bi tiştêkî nehesibandine û hê jî nahesibînin, dikarin xwe birçî û tazî bihêlin, lê xwe bê fikirandin û wêje nahêlin. Heta û heta malbata xwe jî, zarokên xwe jî û welatê xwe jî terk dikin, lê tenê ji bo wêjeyê dixebitin. Hinekan hişavêtine, hinekan ji tenêtiyê û ji xebata pir, tazî û birçî mane yan jî xwe xeniqandine. Mixabin ev e, wêje trajedî ye ji aliyekî, agir û êşe jî. Ew wêjevanên ku van fedakariyan û van êşan dikişînin jî, berhemên herî hêja yê ku kes nikare xwe bigihînin, afirandine û diafirînin. Çima wê wêjevanên kurd wisa nekin û berhemên hêja neafirînin? Lê heke piştgiyî gelê wî yan welatîyên wî hebe, trajedî jî dernakevin holê û dibe ku bi dilxweşî jî berhemên hêja biafirînin. Gelek mirov dikarin siyasatê bikin, lê weleh hindik kes dikarin wêjeyê bikin. Her pişe bi hewldanên pisporê xwe, anga bi endazyariya xwe bi pêşdikeve. Nexwe siyasat pişeyek be û pisporê wê hebe, wêjevanî jî pişe-

yek e û pisporî jê re divê. Ji ber ku hewcedariya pêşketina civakê bi xwe heye. Ji bo çî, hewcedarî çî ye? Ev hewcedarî; bi xwe û nasnameya xwe hesandina e, bi hesandina êşên ku kişandine yan bi hesandina dîroka xwe ye, bi hesandina dinyayê û dîroka wê ye. Dema ku mirovek hay ji xwe hebe, hay ji dîroka xwe û ya dinyayê hebe, hay ji raman û hestên mirovên derdora xwe û ji mirovên dinyayê hebe, dê ji bo xelasî û azadiya xwe jî hê xweşik bixebite û têbikoşe. Dê ji bo dîlxweşiya xwe xweşikiyan biafirîne. Dê hê başreh û kokê xwe bera erdê bide.


Îcar civakeke pêşketî û bi reh û kok dê kî û çî saz bike? Bawer im wê nivîs saz bike û bi piranî jî wêje. Çima kurd dixwazin xwe bi berhemên dîrokî bizeliqînin û careke din jê neqetin? Çima xwe bi Ehmedê Xanî ve zeliqandine, xwe bi Melayê Cizîrî zeliqandine yan xwe bi Baba Tahirê Uryan ve dixwazin bizeliqînin û bernedin? Gelo helbestvanên a niha xerab dinivîsin? Na. Ji ber ku ew kesên di dîrokê de helbestên bi kurdî nivîsandine, bûne reh û koka gelê kurd. Ji ber çî di vê sedsala dawîn de bê pergala û bê sazî mane? Bi baweriya min, ji ber ku ew reh û kokên dîrokî ji wan hatiye qetandin; ew nivîsa veşarî ku di dîrokê de maye, qedexa maye û negihîştîye yan jî dereng gihiştîye nîfşê me; bingeheke neteweyî, bingeheke zanistî û xwestina azadiya takekesî û bingeha xwestina azadiya civakî çênebûye. Her ku ew reh, ew nivîs derketiye, bi tundî hatiye qedexekirin. Car bi car derketiye ser rûyê erdê lê dîsa wînda bûye. Kîjan rehê xwestiye xwe bera erdê bide, lehiya qedexebûnê ew bi xwe re biriye. Civakê jî vê yekê bandor girtiye û fikra civakî, fikra takekesî parçe parçe, sivik, li hewa, bê wate û rijî maye. Civak bê siyaseteke modern, bê çanda nîqaşkirinê û nirxandina zanistî, maye. Mirov dikare bibêje siyaseta berî salên heyştêyî û piştî salên heyştêyî jî bi xwendina civînan hatiye holê. Lê hê jî haya civakê ji bi sedan û hezaran lehengê wê yê dîrokî tune ye, haya civakê ji bi sedan zanîn û zanistên kurd tune ye. Yê ku gihiştîye nîfşê me û serdema me jî, ji hevdu dûr û bê hay û baya hev du maye. Ji ber ku van 15 salên dawiyê, nivîs hinekî bi pêşketiye jî, ew zanîn, wan leheng û zanistên kurd hêdî hêdî ji dî-

roka veşarî derdikevin û roniyê belav dikin.

Mirov îro li nivîsa li ser dîroka kurd dinihêre, bi piranî jî biyaniyan sîd hatiye girtin. Hinekên kurd bi fedekariyê bi tenê lêkolîn kirine, lê gelo bes e? Çima wê derfetên mezin ê aborî jî bo lêkolîna dîrokê neyê terxankirin an hinek kesên dewlemend wê sponsoriyên mezin nekin? Ji bo wêjeyê jî wisa; çima wê derfetên mezin jî bo xebatên wêjeyî neyê terxankirin da ku berhemên mezin derkevin holê.

Ji bo vê yekê jî ez di wê baweriyê de me ku wêjevan tiştên pîroz dikin û divê bikin. Dema ku dikin jî divê ji karê siyaseta aktîf hinekî bi dûr kevin. Hinek dikarin siyaseta aktîf wekî erka her kesî bihesibînin û ji bo ku wêjevan nekevin nava wê siyaseta aktîf, ji wan re bibêjin “Wazîfeya xwe nakin” jî. Lê nafikirin û nabêjin “Gelo wazîfeya wêjevan çî ye?” Gelo wazîfeya wêjevan ne afirandina berheman e? Ne afirandina helbest, çîrok, romanê ye? Mirov dikare wisa jî bifikire; dema ku wêjevanek dikeve nava siyaseta aktîf, wê demê gelo wazîfeya xwe ya esil bi çî tîne yan na? Mirov dikare wisa jî bifikire “Ji wazîfeya xwe ya esil direve. Ji ber ku wazîfeya wî ne siyaseta aktîf e, wazîfeya wî wêjeya kurd bigihîne asta herî bilind. Ha, dibe ku wêjevanek bibêje “Min wazîfeya xwe ya jiyanî bi du felqan kiriye, yek siyaseta aktîf û ya din wêje ye”. Ev jî dibe, divê hurmeta mirov jî vê helwestê re jî hebe. Lê wekî ew jî dibêje “kar bi du felqan” dibe an niv bi niv tê holê.

Wekî encamê mirov dikare bibêje; ku bergiya wêjevanên kurd vekirî be û alîkariya derûnî, alîkariya aborî bê kirin û berhemên wî jî bê xwendin; ew ê wêjeya kurdî bigihîne asta herî bilind an jî wê bergiya wêjevanên ciwan başbike. Bi vê yekê re dê mirovên kurd, siyasatmedarên kurd û bi giştî civaka kurd sîdeyê jê bigire. Siyaset û zanîn dê rehên xwe bera erdê bidin û careke din kes nikare pê bilîze. Mirovên civakê jî dê dîlxweşbîjî û pêşketinê bibînin.



Feratê DENGIZÎ

Jiyan yekpare ye

“**Polîtîka**” ango “**konevanî**” yan jî bi şêweya xwe ya erebî “**sîyaset**” bi ya min rê û rêbaza herikîna jiyanê ye. Polîtîka ku ez ne şaş bim bi latînî tê wateya “rêyên pir, pir rê” û bi erebî jî siyaset ji “me-heskirina hespan” tê ku herdu wate jî hev temam dikin û rêbaza rêvebirin û xweşkirina jiyanê layiqî mirovî rave dikin.

Jixwe bi kurdî “konevanî” jî kombûna binê “kon” tê û riya rêvebirinê ya şêweya jiyanê eşîrî û şivaniyê ye. Yanî wate tev li ser nêreka “rêvebirina jiyanê, şêweya rêvebirina jiyanê, xweş û hêskirina jiyanê” ne.

Di esasê xwe de û bi wateyên ku lê hatine barkirin “polîtîka” pîroz e û jî bo mirovî pîroz û rêbazeke jênegera jiyanê ye.

“Wêje” jî wek têgeh û bi formasyona xwe tê wateya şayesandin, vegotin, hêskirina û xeyalkirina jiyanê azad û her wiha ya xweş û layiqî mirovî. Utopya û xeyalên wêjeyî jî rastiya jiyanê ne dîr in, lê li ser vî bingeşî, bi fantezî, nîgar û ramana azad zorê dide qalibên heyî yên jiyanê û berê mirov dide lêgerîn û şikandina sînora û çirandina tariyê û jiyanê xweştir ya mirovîn.

Mirov dibîne ku “wêje” û “polîtîka” him nêzikî hev in û him jî dîr, lê rehên wan digihên hev û jêr-zemîn û çavkaniyên wan, jêderên wan yek in. Herdu jî xweşiya jiyanê dikin armanc lê bi armanca rêvebirinê berê polîtîkayê, riya wê diguhere.

Her wiha, bê gotin û îtiraz di navbera wêje û polîtîkayê de wê têkilî hebe û ev divêtiyê jî jêner e. Pîvan, nêzikbûn, liberpêçûn û teoriya wê divê li ser rastiya jiyanê û hestên mirovîn, yanî wijdanê kesî û civakî bin. Divê li gorî civaknasiya azadiyê be. Pîvana sereke divê polîtîka ne serdestê wêjeyê be, yanî pêşiyê lê negire. Polîtîka divê jî wêjeyê xwedî bibe, wêje wek ku kanî, çavkanî û diya her hestên mirovîn û jiyanî ye, ya polîtîkayê ye jî. Îlham û rêveker e wêje. Û nabe ku wêje navgîna polîtîkayê be û pêgirtiyê wê be. Lê ev nayê wê wateyê ku polîtîka

bê wêje ye. Yanî wêjeya polîtîkayê jî wê hebe û ew jî pîroz e. Divê di navbera wan de têkilîyeke serdest û bindestiyê tunebe. Ya herî girîng divê wêje ne li benda “**parî**”yên polîtîkayê be û bi wan pariyan xwedî nebe. Siyê li ser xwe qebûl neke. Wek ku tevlihev xuya bin jî, lê na. Ez dixwazim vêya bibêjim: “Wêje, polîtîkaya ku bi rastî (ku ez jî polîtîkayê vê fêhm dikim, ne riyên xapînok) di xizmeta civak û mirovahiyê de be, bi afirîniya xwe û bi xweşikirin, fantezî û utopyaya xwe, wê xwedî dike. Û tu tişt û tu polîtîka bê bîrdozî, bê bîr û bawerî tune ye û nabe jî, bi vêya wê carinan riya polîtîkayê û wêjeyê yek be ku wêjeya polîtîk dertê holê, wê diafirîne. Mînakên mîna; J.P. Sartre, P.Neruda, M.Şolohov, S. Ali, Y.Kemal, M. Gorkî, Cegerxwîn, F.Teyran, E. Xanî, J. London, W. Hugo û her wiha. Ev kesên hanê xelatên zêrîn in. Mirov nikare wêjeya polîtîk a rêveker, ya ku ruhê têkoşîna jiyanê ye, piştguh bike. Belkî zimanê wê tûj e, rasteqîniya sar û ziwa dide lê afirîner e û jî bo hestên jiyanî û herî mirovî têdikoşe. Û her bedelê jî dide mîna hezkirina ku jî bo wê bimire. Dengê zindan û çiyayan, bi wêjeya polîtîk vediguhere hestên xweşmîrovî yên hêvî, hebûn, şabûn û azadiyê. Ev nikare bê înkarkirin. Ne hewceyî înkare ye jî.

Bi qasî ku ez dizanim li dinyayê rewş berevajiyê vêya ye. Wêje hema bibêje bûye “dîl”ê polîtîkayê. Sermayedariya hemdem, şaristaniya sermayeparêz çawa jiyan jî tu kesî, jî tu tiştî re nehiştiye, jiyan jî wêjeyê re jî nehiştiye. Wêje, jî xeynî îstîsnayan, navgîna “kar”ê ye. Mijara danûstendinê, mal an jî dargê sermayeya sermayedariyê ye. Mînakê herî berbiçav, Xelata Nobelê ye. Dayîna Xelata Nobelê ya jî bo kesên bi serê xwe vê têkilîyê radixe ber çavan. Bi ya min divê ev zêde were nîqaşkirin. Lê jî ber ku nîqaş jî bi destûran(!) e, ev ne li ser bala tu kesî ye. Cîhana serdestan a yekreng jî ber ku jiyan kuştiye, kujerê jiyanê ye, berê tu kesî ne li nakokiyên e. Kesên hanê jî bi qasî tiliyên destan in, ev jî

têra nîqêşeke xurt nake. Balê nakişîne. Sermayedarîyê bala her kesî kişandiye ser mezaxtin, xwarin û ajoyên mirovan ên heywanî. Hestên mirovî; evîn, hez, jiyana hêja, xweza, gerdûn, zanistiya civakî û mirovîn, dahatûya mirovî û têkiliyên mirovîn, mîna fanteziyên paşverûyan an jî wekî mijara olan tê dîtîn. Evîn tune ye. Evîn hatiye kuştin. A rast jiyân bi xwe evîn e û evîn jî azadî! Ji ber ku jiyana mirov, rûmet û hestên mirovîn, cîhana xeyalan a dewlemend ketiye bin lingan, bala her kesî li jiyana naylonî ye; li ya ku xapînok û bi şewq dixuye ye. Ev bûye sedema bê manewiyatê jî. Lewre dinyaya mirov a manewî û ya razber jî hatiye firotin; bûye mijara ticaretê. Yanî bi rastî “bihuşt” jî hatiye firotin. Mirov, bi gelemperî “kadawra” ye, bedeneke bê ruh. Polîtîkaya ne rast, a ku rûmeta polîtîkaya rastîn daxistiyê pênc qirûşan, “polîtîka” jî bê rûmet kirîye û bawerî jî tune kiriye, erzan kiriye. Rewşa dinyayê li ser vê mijarê bêhêvî ye. Lê tovê hêviyê, hêviya mirovahiyê xurt in! Evîn û azadî xurt in!

Nabe ku kurd dûrî wêjeya polîtîk bin. Li vê herêmê, li vî welatî, li ser vê xakê pel jî bêtî polîtîkayê naheje. Ev rastiya jiyana li ser vê xakê ye, mîna diyalektîka jiyane. Destpêka jiyane û meş û xwestina jiyaneke layiqî mirovahiyê ya xweser û azad, xwestina jiyaneke maqûl û têrevîn, danûstendina nefeseke bi hewayê xweyîn, nêrîneke bi hestên ruhê civakê xwe ya rengîn, lêgerîna evîneke Şîrîn, Mem, Xecê û Siyabendî, avêtina dil ya bi hezkirinê tev polîtîkayê dileqîne. Carinan dengê jî kûrahiya çanda kurdewar, ruhê mirov diezimîne jiyane, diezimîne bihuştê. Wek jî devê Siyabendê Silîvî; **“Roja ku sed û yek bela neyên pêşîya min, jiyân bê tehm e! Ew roj ne jî jiyana min e!”** Ev rastî û xweşdîtina dijiwariyên jiyane ya li ser vê xakê radixe ber çavan, bi ya min. Lê van rastiyan tev ser-

destiyê naynin. Polîtîka wê rê veke û wê jî wê bi hest, evîn û rengîniya jiyane, bi nexş û nîgara van diyardeyan û bi hêza xwe polîtîkaye xurt bike û berê wê bide maf, ked, edalet, wekhevî, dirustî, paqijî, civak û mirovahiyê. Yanî têkiliyeke hevtemamkirinê, ne ya serdestiyê! Xweseriya Demokratîk ku rast û xweş bi jiyane re bikeliye, wê jî kurdan re têkiliyeke hêjayî mirovahiyê ya polîtîka û wêjeyê derkeve holê. Rikberî na, hevaskirin, hevpejirandin, hevaxurtkirin û komûnalî, jiyaneke xwezayî ya rastîn a herikîna ruhê candariyê.

Jiyân yekpare ye. Her aliyên jiyane, cudahî û guherînên wê, her rûyên ku jiyane bi pîrengiya xwe dikemilîne û dixemilîne, ber bi yekparetiya beden, dil, mejî, hebûn, mirovahî û civakê ve diherike. Yanî **“yekbûna bedenê, wahdet-ûl vicût”** hevtemamkirin û hevpêçana cudahî û pîrengan e. Ev e esasê hebûn, evîn, azadî, cîhan û gerdûnê. Baş e, ma bê ewlehî, bê xwexwedîkirin û bêtî xwezêdekirinê jiyân diherike? Parastina hebûnê, li gorî şert û mercên heyî, bi çi ye?!

Rewşa polîtîk divê li ber çavan bê girtin, lê ne weke **“qadîr î mitleq.”** Wêje çemekî azad, bayekî gurbahoz û bozîrewan e li ser vê xakê û li binê vî asîmanî. Mîna nakokiyê xuyaye. Belkî jî nakokiya nepenî ya xurt û afirînkare. Lê rastî ev e ku, heta ev têkilî rast neyê hûnandin û ristin wê azadî tim û tim bi qisûr be. Evîneke heralî, xweşalî û hevtemamkirinê pîroz e, bihuştî ye. Ger ku hê kurd bindest in û keda wan tê xwarin; axa wan, navê wan, zimanê wan, jiyana wan ne ya wan e, beyî polîtîkayê wê wêje bê hêz û qels be. Polîtîkaya bê wêje jî wê rijî û xwedîneker û ne çareserkar be. Divê polîtîka xwe bi wêjeyê xwedî bike, têr bike. Ku nakokî hebûn û çareserî jî jiyân (b)e;

Jiyân yekpare ye. Divê **“dil û mejî”** li hev bikin!





İsmail DÎNDAR

Di wêjeyê de siyaset

Wêjeya siyasî, bi feraseta bîrdozî û civakî li jiyane di-nihêre û bi vê yekê nêzî rastiye dibe. Ev yek hin hêmanên wêjeyê yên mîna 'takekes', 'estetîzm', 'hest', xeyal û ramana kesane nabîne. Loma jî gelek kes wêjeya siyasî di nav cîhana wêjeyî de napejirînin. Ji mijar û naverokê bêhtir li teşe û awayê berhemê dinihêrin.

Li gorî dîtina min, çawa ku berhem tenê bi mijar û naveroka xwe, bêtî zimanekî xweş – xweşik û karîger, ava xwe nagihîne deryaya wêjeyê, yan jî nav ruhê gerdûnî; berhema dûrî rastiya heyî, berhema rasteqîniya jiyane mikûr dike, berhema ku li ser kirûyên beloq ên ku mirov û civakan dixine nav labîrentên êşê biqevize, nebîne jî; jî ruh, sinc û rewîştê wêjeyê dûr e.

Bêşik, dirûşme û derbirînen hestî yên di nav agirê jiyane de ku mirov dixine nav peroşa têkoşîna jiyana siyasî, tu carî bi tena serê xwe nikarin bibin fêkiyên dara wêjeyê. Lê bi hêz û bikêriya hunerî, ew hest, bûyer û kirûyên ji rûpelên jiyane û dîroka pevçûneke civakî jî dikarin bibin 'xweş û xweşik'. Dikarin bibin raman û hest û xeyalên ku bi zimanekî xweşik, estetîk û bi bandor tîne vegotin. Ma ku wêje û huner ne ev yek be, nexwe çi ye?

Wêje çawa di dîrokê de pir caran bûbe navgîna zêftkirina hest û ramanên mirovan û bi hunera xwe ya karîger mirov li hemberî desthilatdaran kedî kiribe, her wiha dikare -û divê jî- bibe navgîn û qadeke ronîkirina rastiyan jiyane yên ku mirovî bibin deryaya jiyaneke bextewar.

Li vir tiştê ku divê mirov jî bîr neke ew e ku, di wêjeyê de, gava mirov hevîrê berhemê strand, bi qasî ku divê; huner û afirînerî tevî hevîrê xwe bike. Piştî tîr bistrîne û peyre tîr bipijîne ye.

Ku mijareke mirovane, mijareke jiyane, mijareke xwezayî û sirûştî; çi dibe bila bibe, bi riya hunerê bête afirandin û tîr bête strandin û di tenûreke guncav de bête pehtin gelo kêmasî yan şaşî dê li ku derê be?

Ku em li berhemên navdar ên ku tu carî ji hişê mirov naçin binihêrin. Di wan berheman de ligel ku huner û afirînerî heye, gelo mijara wan a polîtîk çi xisar daye wan? Yan gelo bi wê mijara xwe ya mirovane û rasteqî-

niya jiyane ew nebûne başên başan? Mîna helbesta bi navê 'Tanya' ya Nazım Hikmet, mîna 'İnce Memed' ê Yaşar Kemal, mîna 'Bilûra min' a C.E. Bedirxan, mîna 'Kî me ez' a Cegerxwîn û hwd.

Jixwe jiyane bi xwe, (her weha hemû têkoşîn, pevçûn û şerên civakî, siyasî bi mebesta jiyaneke xweş û xweşik in heke!) li ser bingeha diyalektîkê ye. Ma ku wisan be, mirov dikare çi kêliya jiyane, her weha hest, raman, bûyer û kirûya mirovî jî hev cuda bike. Heke çavên nivîskar bal (vekirî, şiyar) bin, divê bi hemû rasteqîniya xwe jiyane bibîne, heke rewşenbîr ne ker be divê bi guhên xwe his bike, heke mirov xwediyê wijdanekî be divê di dil û mêjiyê xwe de cih bide hemû rastî û pêdiviyên jiyane.

Jixwe pîrî caran mirov nikare nîrxandineke wisa teqez bike û bibêje ku ev kirûyeke polîtîk e û ya hanê jî ne polîtîk e. Jiber ku siyaset jî, huner jî, wêje jî, zanist jî; bi tevayî li ser rûyê gerdûnê çi xebata mirovî hebe, bi tevayî bi jiyane, bi xwe ve rasterast girêdayî ne. Hilberîn, afirandin, çandin, çînîn, parvekirin, ked, dizî, heq û neheqî, şer û aşî, tîkîlî û nêrîna li xwezayê, feraseta jiyane jînê, ol û nêrîna li olê, evîn, wêrekî, dilsozî û her cure kirû û bûyer jiyane ne û yek bi yek bi hev ve girêdayî be, teqez ew mijarên siyasetê ne jî, ew mijarên hunerê ne jî, ew mijarên wêjeyê ne jî.

Weke mînak ku mirov helbesta Nazım Hikmet Ran, a bi navê 'Destana Bedretîn' hilde dest;

.....

Ji bo karibin bibêjin,

Ji bilî hinarikên yarê,

Li her derê

Di her tiştî de

Tim bi hev re,

Ji deh hezaran man du hezar

.....

Ku mirov bi tevayî, li naverok, raman û hestên di wê helbestê de binihêre, rasterast ramana komunîzmê ku bingeha xwe jî ramanên Hegel wergirtiye tî dîtî. Ji hêla siyaseta lebatî ve jî, rasterast têkoşîna rêxistinî û tam

û girîngiya şerê civakî tê de beloq e. Her weha ji bo teşe, rêbaz û huner û afirîneriya di vê berhemê de kî dikare bibêje, ev berhem ne estetîk e, yan ev berhem bi zimanekî xweş û xweşik, herikbar, karîger nehatiye hûnandin. Kî dikare bibêje min ev helbest xwend û di bîra min de nema. Yan min nexwest ez careke din bixwînim. Yan ji hêla ramanê ve, ji hêla hestan ve, vê helbestê ez nebirim nav xewn û xeyalan. Yan min xwend lê min tu tam jê wernegirt.

Wêje nikare ji rastiye bireve û divê wêje tu carî ji hemanên huner û afirîneriyê jî bi dûr nekeve. Him êşa ci-

vakê û him jî di nav civakê de êşa (her weha kêf û şahî jî) 'kes' jî di hundirê teşta xwe de bistrîne.

Di vî warî de, nivîskarê frensewî yê bi nav û deng Stendhal di nivîseke xwe de wisa dibêje: "Siyaset, di nav berhemeke wêjeyî de, mîna ku di nivê konserekê de demançeyek biteqe ye, lê dîsa jî siyaset tiştêkî wisan e ku di wêjeyê mirov tu carî nikare jê dûr bimîne.

Bi min, bi tena serê xwe tenê jî siyaset huner e. Hûnereke zehmet û ew qasî jî xweş e. De êdî ku huner, wêje û siyaset di nav hev de bi hosteyî û bîn strandin..!

... û ez



Kamran Simo HEDILÎ

rêza pêşîn
a pirtûkên qedim "*bixwîne!*"
qewlên min, berî nivîsa bixwîne!
berî peyv û nivîsê jiyan peyda bû
û berî giyan jî ronî
destana afirandinê
di vê peyvokê de veşartî ye
arkeologên kevnexirban
û dizên goristanan dizanin
Xweda û evîn, şer û huner, jan û xurûr
û tofana Nûh min afirandin
giyan min firand asîmanan
darên kevnar
agahdarê esil û fêslê kevnariya min in
temenê min di temenê rayên wan de ye
çend caran ronî û tarî
di min de hatine dinyayê û çûne
îro cihê min di peyvên de nemaye
bêhna meynoşên ji êvarê mayî
û fermanîdarê artêşê xwe windakirî me
demên çûyî, stêrên dûr

şûrên tûj û neynikên şikestî
rûyê min danîne cihê min
xeyalên xeyalwindakirîyan
dirêjî xeyalên min dibin
destên wan dilê min germ dike
siya xwe dadîqurtînin
mirinê jî bîr dikin
û ew dibin mirin
axaftinên avê, kevirên lal
bêpêjinên hênîk û bîranînên tenik
wêrekî anîne mirinê
qîrînên çavwindakirîyan
miskîniya min dihejin
bedenên bêserî, û zarokên bînav
di giyanê min de
bi qasî kûrahiya deryayê û agiran kûr
çaxên di zinarê bêziman de razayî
xemgîniya min in
şev sêwî, rê sêwî, bêja sêwî
û qîrîn sêwî
min daristana gunehan derbas kir
û sekinîm

Heykelê Mazlûm dê kekobiray

Sînan SUTPAK

Bi adir dê şidey da to ya. Kilitê ocaxan dê nimitan agabeyyay. Nimitene de mewdanî. Mewdanê ki ne darîrê ci sencêno û ne tesîrê ci peymêno. Tenûrê zeriyan bî sûr. Çikda ci ra. Palokey berheman kewt a kar. Bî eştan da zerî û ariq dê çarî ya.

Hêga dê omidan de bastonî awdeyay. Rezan dê xo-pande axrey. Zeriyan de şitlê vilikan dê şidey denîşay. Text dê zeriyan. Bi firçe dê ê hisana û tacda hunerî ya.

Heyhelê to neqîşya. Deqê ci wejey ro. Temeya ci hunerî ro perdan dirnenê. Ta ki sûran dê Amedî ya. Bey dê sî da şengî denîşyo. Hetani hi ariq û gonî ra. Wirekebo bêhempa viraziyo. Bo murekeba. Dirûşmeya xo ver ro dayene. Sûran dê mêjû ro û sî bi sî da welatî ro bineqîşyo û alaya “xo verro dayene cu ya” bîvirazyo. Bi şadiyey da newrozêna Sûrandê Amedî ro denîşyo. Hetani kî azmêno istareyê sûrî nêhiwe riyan dê domanan dê rojî ro. Werdene heram, şimitene axu bo. Bi sondo ki mew da to ra axûre giri to heme zeriyan dê gulê serehewadayene akerdi ya. Bi sondê adir dê niftî da to ya. Ki adirgan dê zerdeştî ra miraz girito. Hetanî a roja ki qebristanê to dimayînan bibexîşine. Werdene heram şimitene axu bo.

Bi a vaten da to a ki senîneya cu dê parzûn dê xo ver ro dayene ro û xo ver ro dayene îmtihan dê erciyanan ra ravêrnê ya çikê adir dê şidey qalik xo ro şikna. Û defîneyay xizna da pûngali ro. Pungalo ki zeri da dayikan de azmên ci ro weşêneya bi. Ware dê baz û hewranan de kund û dodokuşan wendê. Dayikan o ware dê wext bi hewexteya peymit.

Heq da şen dê neheqey ro. Kul û keserê xo bi hersê çimana çiman dê qebarênana alawitî. Serebotanî qewimiyay.

Mewsim dê halen ra pernayene de. Wiskiserdê hisan. Bi dirbet da qalik girotê ya Baz û Bewrani peray. Herûn da jan dê dirbetan de. Sî dewsnay xo zerî ro.

Dirbeta nêcebiryayê leym girot bi. Vewre pro vi-leşnê. Dirbeti azirayay. Bazbewranî halên ra peray. Deman dê veraştan rê bizrê vergirotene. Zeriye kuyan bi gulan dê ariziyana xemilya.

Wexto ki vajêno Amed ti. Vajêno Mazlûm xo ver ro dayene Yena merdimi vîrî. Hepisê Amedî. Hurca hîris û pênjîne. Ki hisê dimlastî bi emir do ciwana mojnay

wahêran ro. Bexto! Tî serey xo bûrê. Bi o jana ki to pa. Heme wastenê beşerî. Ayre dê xo ver ro dayene de tahnitî ya dayikan şewê bêhew nî ninay xo çimî ro. Bi hût da ariq dê deji ya. Axûreyê hêviyan karitî xo zerî ro. Qabristanan de, istan dê dapîr û bapîran ra. Keseranê pindosyayen eşt tever. Bazî kewtî alingan ser. Bewrani bi peran dê bazena.... Karwanî kewtî ray. Dayikan her tîkaya zerî de xo. Cenê dejên dê gan dê to ro. Bi sebate dê ê tîkeyana. Egît û Zilanê xo welidnay. Adiro wel da xo ra welidyaye. Bêçareyîne de toximê çareyan karit xo mezg ro.

Bi lez û bez dê to ya. Baz û bewranan halênê xo peymit. Peymitenan tewe girote. Tewa sînayen da embazina to. Nameyê embazin da to, o bin rayvistene. Raynexşeyê a embazine newe de ra waneya Newe de ra nûşya, herûn da ripelan de kenaya mezgan ro. Zeri-yana Qesrê genehî awan bî. Ci ra raynexşe vijya. Her ki dem virya kendene. Her ki kendenî bî xorî. Roj demi ro bi germ. Daristan. Birê zerî newede ra ceneyay. Musay û musneyay pê. Ki ariq dê mezgi û adir dê zerrida to ra. Mewdanê mendey. Bivlêşnê xo zerî ro. Bi asna witen da name û serwexten da kerden da to ya. Koy nalay. Nalîna koyan olan de destan. Deştê çengiz-nayey xo ra şiyayene ra veciniqay. Verojan hût dê koyan. Axûreyê vatenen dê to. Zeriyan dê xo bi xo vîra-kerolan de kariyay. Xo vira kerdene bi tewrdê hîmana qilayay. Guldanan rezî, kezan welat xemilna. Gulanê sûran, pelweyê delaley varnay. Her da pîroze rê berdêl.

Bi jan qebaran dê dayikana û cedewan dê dapîrana. To xo resna nîrwana da hemdeme. Qebaranê to çiman cedewanê to çiman dê dayikan de da tever. Ci ra koçê karwanan dê dayikan mêşey awday. Mêşeyê mehdan. Zeriye dayikan. Jan dê verşiyayenan de. Bi mîraz adir dê to ya. Mîrê amyayene alawit. Hêvî degêryay. Artêşa gulan dê rojî. Bi tewrdê jan dê. Terteleyana, zerriyan dê dayikan de virazyay û kewtî ray. Ray dûrî, ray bê-peynî, ray pro pisûla vinîkerdê. Kudeynê. Nenguyana koy kendi. Perziniya bîrî aşanay. Kerdenana Qesrê ehdan nijînenê. Hetanî a roje ki heykelê to, Kemal dê biray, Xeyrî dê deyndari, Ekif dê zerî nerm û gonî-germi, Elî dê gonîşîrini û çehar zeriyan dê bulane. Sûran dê Amedî sero denîşnê.

Bi mewdan da şîma. Berdêl da ganana dê nazikana. Helwestî zelalyay. Erciyayeyê nîmite verdayey. Kewtî aw disa şelikerdê ser. Taqet û şîyanê şîma. Mewsîm dê manewiyatê de. Bî tava rojî. Tavanê wesaran dê bereketênan. Îniye vînî teqay çîmeyê awzêman de roj akewt. Zerqî da mû da sebrîro. Vînê inadî wişkserdan de zîl da. Mezgê bişavtey rapelîkyay û kok dê xo sero rûwikyay. Bi mû da îrade dê şîma ya. Resenê nêasyayey mûneyay. Welato zerî pro çehar leteyên û zeriyê parzemînan dê raştey da xo ra remayey şîdênay pê ro. Agabeydeya bêhempa a tim û timêne. Her ku çekuyan ra quleya cumleyan virazyê. Giraneya hêmayan bi agir dê to ya degêrya. Mezgê dê wêjekaran de xapa deyndarey aşaneyê. Zimistano seqem pro veşate. Amnana germ pro cemidyaye de. Kozîga hêmayan halên de acîfineno. Peymitena janana. Axina porsîpan û kerbê erdîşîpan. Ziwanarden da ci ver. Dirbetê nêcebir yayey qalîk erzenê û moristanên janana newede ra tê ra kenê. Bi roşnayîda hîrê darîkana şewana ro tarî dirya. Karberosan ro erd lerza. wendox, pale, karker û cot-

karê welat dê sero azmên dirnayeyî. Lewtî ziwan dê to ro. Çare dê şîma ra ariq list. Zeriyê xo şîdey da şîma ya. Çîmê xo vînayî da şîma ya. Dinyaroşn ro akerdî. Do-mananê welat dê roj pro akewtey. Mezgê dê şîma ra vejen kot. Dayîkanê zerîveşatan dirbetan dê şîma ra tîkeyê ferasetan vîstî xo zerî. Xort û keynekanê resaye û zaclayînan. Bi o ekîla. Kewtî ray. Bi tewrdê qerar dê. Ta bîresê miraz a û heykelê to. sûran dê keleh da xo ver ro dayene sero denîşnê. Adirê to hizîr dê mîyaserey de alawite. Adirê to çîka roj da newê. Zergê xo de cu agozneno. Her Newroz de kawayo hemdem. Asinkarî ra. Adirê gêno û dano hiwate ro. Hiwaten da adirê de leym û lêsê mêjû eizeno tever. Zekîyey, Rehşanî, Berîvanî û Ronahîyê Miyana dê di layan leym û lêsî. Derîwenê. Peyramendene toz û dûman dê xo de com. Adirê to. Dalpeyê hiwatene. Hiwateyê to dalpeyê kozî. Nîqutênê mezgan ro. Kozîga hisan gunena pîro. Ci ra çîkê adirê dê Egîtey pekiyenê. Benê adiro pîroz û zengari zelalnenê. Do bizelalnê. Hetanî ki heykelê to... Sûran dê xo ver ro dayena...

Îşev

Ji bo birayê min
ÇEKDAR SAVÛR (DOĞAN AYDIN) û rêhe-
valê wî ŞAHİN YILDIRIM

Di vê şeva şîlwe de
Ber bi te ve dumena xwe dişî-
kênim
Belkî ji bo nepixandina ba-
birka min
Bayekî min tune be
Lê dîsa jî xeyalên xwe berdi-
dim
Nava şepêlên asê yê Dîcleyê
Belkî weke kelekvanên ermenî
nebin
Lê ez ne kêmi wan im jî ha!

Îşev ez dibim Dîcle
Di hemû hêmayên min de
Tu jî Firat
Ji bo berî bîstîkekê
bigihîjim te

Rêya min dîr e
Lê ez ê di Nokteya Hejîrê re
derbas bibim!
Belkî ez te bibînim
Ev jî berberî her tiştî ye
Îşev radipere dilê min
Ger tu destê xwe bidî
Têlên zengarî yê ruhê min
Dê biweşin jî zîmanê min
Tevî te
Nêwa û stranên qedexê
Ên sedsalî


Îşev eke nivînekê tîr raxistin
Li ber çavên min;
Qubîne, Qurtalan,
Deşta Bamerdê û Mavan
Îşev ez Dîcleyê dişîbînim te
Û li nava xwe dijidînim
Lê dîsa jî bêrîkirina min nate-
bîte

Îşev ez dibim pelandane
Nêgîzên Gabarê
Dibim gerokê zewiyên
Xecxekên Omerîyan

Îşev ez bûm çîlkek baran
Û nîqutîm ser xaka te
Îşev
Bayê te bêhn dikim
Ew bayê ku jî Dîcleyê,
Li Botanê,
Li Mêrdînê
Hatiye şûştin û paqijkirin

Îşev
Ez difikirim:
Belkî hemû qîral
Badilhewa
Li gihayê nemirîyê gerîyane
Eger li van cîwarên qedîm
Bayê Mezrabotan
Kîşandibin cegerên xwe
Û bi te re, jî kaniyên wê
Ava wê tehm kiribûna
Eger jiyana te ya lehengî
Yan jî jiyana ku te afirandiye
Bihîstibûna
Belkî tu carî
Li gihayên nemirîyê
negeriyana

Rêdûr DÎJLE



ar-da JANXWAR

Dilopek ehd mistek jiyan

Eto, li nava erdê xwe yê bejî bû. Bi emaret li lemên firingiyan dinihêrî. Li ser wan bi kozikê ji kê-sêkên axînî û bi kevîrê pehnik nixumandibû, dor bi dor ji wê xetê diçû û dihat an jî xera dikir. Hinek lem jê vemirîbûn, hinek jî ji ber ku li nava rê bûn ji serikan ve hatibûn petkirin, hinek jî ji aliyê kûsî ve hatibûn cûtin lê piraniya wan xwe xelas kiribûn, tije kalik û firîngiyên sor ê kur bûbûn. Bi xwe re çend dendikên zebeş û yên petêxan anîbûn. Lemên ku vemirîbûn li şûna wan kortik kola, dendikên petêx û yên zebeşan avêt binê kortika axa nerm, dilopên ava debok niqutand ser dendikên zebeşan, dendik bi axa sor nixumand. Lemên firîngiyan wer şixulîbûn, şax û guliyên lemê ji nav qulika kozikan re derketibûn û hinek jî li ber şaxên wan nehatibûn edilandin, xera bûbûn. Karê kozikan zêde li ber xwe nedabû. Paşê bi eşêfa nav lemên firingiyan ketibû, darên berûyan li ber lemên firingiyan çend şaxikan nu acir dabû, erê dibû taldesî, lê rewaya lemê dimiçiqand û bê hilm dihişt. Apê Eto, bi das û biviran ket ber darên berû û mazî ji kokê ve pet kir lê neqelihand. Guliyê darê terêf kir, êzing da aliyekî, hejîkê wê jî da aliyekî, gava guliyên darê terêf dikir, pîjîkek firiya got “Şeleep” li eniya wî ket û li ber hev çend xêzikên sorik çêkir. Das û bivir ji dest ket û ji paş ve got “Terepppp” ket xwarê. Eniya wî jan da, erînekê ji cihê xwe ranebû, destê xwe da eniya xwe peland û li pêçiyên xwe mêze kir, du niqutên xwînê yên nedawî di pêçiyên wî de ziwa bûn û du ûtêkên weke kevîr mîna du stûnan di ber hev de hatibû. Di ber xwe de got “Ma gunehê te heye, ev ji te re hindik bû, kê ramedandibû te? Kê gotibû here dara ciwan ji binî ve bibire? Ma pêşyan he-wante gotiye “Darê xwar ne li ar, ne li bar” te biçûya dara xwar bibiriya, ne tu bî ne lema firingiyê be” piştî di ber xwe de axivî, rabû li ser qûna xwe rûnişt, hil-meke kûr kişand singa xwe, li çep û rasta xwe nihêrî, destê xwe da tenîştê xwe hewl da ku rabe piya, hinekî şewta wî puxte bû û şûnde birîna wî qaşilk girt. Lê carinan zextan lê dixist. Li dora kevanê erdê wî çend

darên bişkokaan hebûn, bişkokên wan efare kir û xist ceherê rîsîn û çend mazî bi darên ve bûn, ew jî bi çend rewîkan li paxila darê xist û weşand û berhev kir, xist berîka ceherê rîs. Pîra gund lê temî kiribû gotibû “Tu çûyî çiyê ji min re çend şeqelor û maziyan bîne ji bona nexweşiya mehde pir baş e, ez bawî bûme, nikarim bi çiyê bikevim, tu xêra xwe ji min re bînî.” Apê Eto, piştî ku daxwaza pîrê jî bi cî anî, du sindoqên textikî li ser cila hespê ediland û hinek çilo danî binê sindoqan, çend kalikên hişk danî binê sindoqan, di ber hev de qor bi qor tije firingiyên bejî kir û bi ser wan de çend şaxên çilo wer kir, bi werîs ber-warkî şidand, bi hefsarê hespê girt, ket rêça kaşê xam û berê xwe da sûkê. Bi hemdê xwe lebigîbû û êşa birîna wî çî qas zor dabûyê, ji kêfa çûyîna bajêr ne xema wî bû.

Îro kêfa wî li cî bû. Xwêdana eniya wî bûbûn pere û ketibû berîka wî. Ji firingiyên çiyê çend sindoq firingî anîbû sûkê. Ji kelekela nava rojê heta êvarî li ber firotina firingiyan bû, sindoqek li ser hev dabû, yek jî li ber xwe, li ser teştikeke bi canpol hatibû pî-nekirin li ser raxistibû û bi kîloyan li ser mêzîna nêzî xwe firotibû. Bi firotina firingiyên sor, hinek dirav ketibûn destan, ji xwe re pê saqoyek, taqimekî şal-war, êlek, cakê û cotek qondere stendibû, çend qurîş dirav mabûn, ew jî ji bona pêdiviya çûyîna bajêr bi xwe re hiştibû. Firaqeke vala jî ji zarokên xwe re stend da ku bişkokên bejî û eskîmoyên cemidî têxinê û ji xwe re li kolanên bajêr bifiroşin. Amadehiya xwe ya çûyîna bajêr dikir.

Çi kêmaniyên wî hebûna, hewce bû îroj xelas bike. Ji xwe re got “Çi dibe çî nabe, rahişt qerta xwe ya kesk xiste berîka xwe û kincên ku ji xwe re ji bajêr stendibû amade kir û giştik li ser hesinê di hundirê qomidînê de raxist û cî dayê. Çû li ber destşokê sekinî, destê xwe da bişkoka kehrîbê, serê tiliya xwe pê pitikand, çirûskên ku ji cama daşirê diteyisîn ber wî ronî dikir. Li ber ney-nika ku bi benikekî li ser hemana sekinibû, li xwe mêze kir, riha wî ya gewrikî dibiriqî, riha wî rûyê wî mêtibû,

rûyê wî li ser zerê dawerivandî bû. Riha wî bûbû wekî devîyan, ji xwe kêfa wî ji jêkirina rih re nedihat. Rahişt tasika gupiyayî, cilêteke ûris weke gûzên û firçeyeke ku mûyê wê firidî û darê wê rîzyayî ku di nav de çend kêzikan hêlîna xwe tê de ava kiribûn. Ava şîrgermî xist tasika gupiyayî, firçeya xwe ya sixfiridî di nav avê de vegevîzand, li rûyê xwe yê zerikî da, kortikên gepên wî av tê de digewimîn, av dilop bi dilop jê diniquî, hilm di gepên xwe de digewimand û kefa sabûnê bi riha xwe da seyandin û bi cilêta weke gûzên pê da xeritandin. Bi destmalkê rûyê xwe yê zerînî carinan dida maltin. Mirêka wî ya qoziyeke wê şikestî, qoziyek jî derizî û hinekî zêrikê biriqandî jê şeqitibû, bi zor rûyê xwe tê de didît. Carna dibû dû suret li ser rûyê neynika derizî. Hinek ava sar bi ser rûyê xwe kir, bi destmalkên kêlekên wan mexmerokî û li ser wan wêneyê xezalên kej hebûn bi ser sûretê xwe da maltin. Berê xwe da menzela dawîn, pîjmayê xwe yê bi daxikên sor û spî di ber hev de bûn, ji buxçika di kulînê de derxist û kincên li ser xwe guherand, berê xwe da dirênceka darînî, pê ve rapelikî û çû ser nivînên ku li ser xênî hatibûn raxistin. Bêhna rimilka ser xênî pozê wî şewitand. Pîreka wî nivînê wî li bin darên çilo yên ji bona ku tavroja sibehê nedê raxistibû da ku jê re bibe talde û sî.

Pîreka wî tim çavê wê li riya wî bû. Ji ber ku nexweşiya şekir pê re çêbûbû. Jixwe ew ji kulîmekî û bawî bû. Ji Etokê xwe pir hez dikir. Bi xatirê wî dizanibû. Peyva wê tu caran li cem zarokên xwe li erdê nedixist. Ew berî Eto çûbû nav nivînê xwe, xwe vezelandibû û li hêviya wî bû. Kirasên binî ji xwe şeqitandibû, tenê kirasê berstûkûr û bê derzik lê mabû, çî neqebên asê li ser bedena wê hebûn, ji binî ve hilweşandibû. Mêrgên hêşînî yên neçêrandî jê re şevîn hiştibû. Li hêviya kalîna wî bû. Eto ji pêlawa wî ya çekalî bi xwêr dikişiya, bi bêvila çekala xwe kulmek rimilka axa ku li derdorê civiyabû ber bi qoziya xênî ve bir û çekala xwe li ber nivînan da ber hev û danî tenişta ku nêzikî balgîfa ber serê xwe, da ku xwe ji ajalan biparêze. Weke mahrê bin tahtikan xwe avêt nav nivînên xwe, li ser piştê xwe vezelend û bala xwe da stêrkên li ezmanan, du stêrk di kortala çavên wî de xuricîn, pîreka wî hêdî hêdî pê serê tiliyên piyan kir da ku deng dernekeve, hêdîka bertena kirasê binî weke qijnikan xwe bi doxîna zîlamê xwe zeliqand û jê re got “Îroj halê min ji ber kulîmeka min tune ye û çîpê min dişewitin, ji kerema xwe re hinekî bifirkîne. Eto jixwe ji do ve amade bû ku çîpên spî û gewr bi ber hev de bifirkîne.

Eto hêdîka lihêfa bi hirî kişand serxwe, xwe bera xaçerêka bin lihêfê da, ji pêçiyên piyan dest pê kir hêdî hêdî ber bi gwîzokê xwe weke derîdangê pê ve gerand û pêçiyên tiliyên wê yên melêvî weke xunavê, dilop bi dilop mîna erdê bi êş dimêt û hêdî hêdî bi

kefa destê xwe li ser êşa kulîmekê bi sîngera kefa destê xwe, êşa wê li ser agirê dilê xwe diseyand. Bayê gewdeya wê di ber doxînê de difiridî, wê wextê lepên zîlamê wê ew rehet kir. Bû weke perekî. Eto ji kastîn ketibû. Ezmanê devê wî ziwa bûbû dikira ji tînan bi-mira. Jina wî fêr kir şekirê zîlamê wê kêr bûye, çend hurmîyên bejî û gûşiyê tiriye mazrone di sênî-keke ku berê de amade kiribû anî. Hebên tirî ji gûşî jêkir û dirêjî ber lêvên hevserê xwe kir, ji nû ve hişê wî hat serê wî. Bû şerpşerpa devê wî, hurmî û tirî bi hevdu re xwar û şûn de Eto destûra veketandinê ji pîreka xwe xwest û her du bi şabaşeke xweş ketin nav xeyalên xwe.

Sibehê zû Eto rabû ser xwe çû li ber kaniyê sekinî rû û çavên xwe bi kefa sabûnê kef da û ava şîrogermî pê pak kir, bi destmalkê ve dest û rûyê xwe paqij kir. Hat li kêleka jina xwe li ba zarokên xwe li ber sifreyê rûnişt. Taştêyeke xweş kir û şûnde qala çûyîna xwe ya bajêr kir. Ji ber nexweşiya wî bê dilê jina wî bû. Zarokên wî bê dilê wan bû jî, çiqas li ber geriyan jî “Tu nexweş e, erê va ye em diherin, bes e hewce nake ku tu were, em bes in, çî xwestinên te hebin em ê bi cih binin” lê ji bo bavê wan bê fêde bû. Bavê wan got “Ev hebûn û tunebûna me ye, lê mirin jî tê de hebe, ji vê mirina bi rûmet û xweşîktir tiştê tune ye, destê bi tenê deng jê nayê, hewcedarî pê heye ku em her yek di ku de bin ji bona rojên wilo em bi hev re û bi tevger tev bilivin. Bila perdeya reşbîniyê ya li ser çavên xêrnexwazan biçere, ez bawer im bi hatina min wê perdeya reşbîniyê a li ser derûniya gelek tirsonekan biçere û ji bo rojên din sabê bigire.

Taxa wan ji bajêr hinekî dûr bû, ber destê sibê ve çû sîkê lê hîn kesekî derabeyê dikana xwe venekiribû. Tenê çend kûçikên tolaz û çend heb pisîkên zik-têr xwe di nav gemara navçeyê de digevîzandin. Berê xwe da xeraja tirimpêlan û xwe da benda ajovanê tirimpêlê, lê wî nizanibû ku xelkê ji hefteyek berê ve cih ji xwe re veqetandine. Erca wî li du heban bihurî, li kêleka wan ji xwe û zarokên xwe re bilêt peyda kir. Niştecihên gund û navçeyê bi tîlê yan bi serê xwe ji xwe re cih veqetandibûn, ji bona wilo cih di tirimpêlê de nemabû. Jixwe çî makîneyên li derdorê hebûn, giştikan berê xwe dabûn bajêr. Wexta çûyîna hatibû. Qederekê ji nav bajêr dûr ketin, li pêşiya wan hatibû girtin. Bi hezaran tirimpêlên leşkerî li dora wan û li pêşiya wan girtibû û derbên xwe xweş kiribûn. Bû xirrecira kesan, ên ku tirsîyan gotin “Em ê vegerin, ên ku gotin em ê şer bikin û têkevin ber hev” lê apê Eto got “Em kesek bi derekê ve jî narin, em ê bi tevdir bilivin, bila tevdira me hebe kes nikare me ji ser biryara me vegerîne em ê a niha giştik ji tirempêlên xwe dakevin û li ser rê rûnên lê bi tevger kes bila netirse,

yan wê me berdî yan jî em ê li ser vê rîyê rûnên. Leşkerên li vir dibe ku we ji rê derxe, peyvên ne li gorî dilê we bike, ji we re çî got, hûn jî bi dilnêrmî bibersivînin, bila axaftina we ne çors be.” Piştî axaftina apê Eto çî kesên di tirimpêlên xwe de bûn, giştîk daketin li cem hev civiyan û biryar dan gotin “Yan hûn ê destûrê bidin me em ê herin yan jî em ji cihê xwe ranabin.” Leşkeran xwe tûj kirin da ku êrîşî gel bikin. Bi çend gefan çend cop li kulîmekên hevalên wî xistin û narincokên gazê bêvila wan da şeqitandin û sotandin jî lê biryara apê Eto û hevalên wî nehat şikestin û devê xwe li ber wan sist nekirin. Xort û qîz jî bi keviran li ber wan pehn bûn, derbên wan li wan sarkirin şûn de, piştî çend kêliyan rîya wan hat vekirin, apê Eto û hevalên wî lîlandin, govendek girtin. Tirimpêl, rîya di nav çiyayan de xaro maro difitilî mîna mehran xwe tê de diqurifand û mîna pezkoviyên dabûn dû hev. Dengê tirimpêlê çîya vediqelaşt. Weke tîrmehran xwe li singê çiyê dixistin. Çî sihorîk û kutkutokên di sing û berê daran de bûn, bi tilîliya dengên tirimpêlan re vediciniqî û çavên xwe dikutandin rêça dengê olanê, xwesteka du çavên melûl bi bazdana li ser ferşekî bilind ew pêşwazî kir, pelên darên nivşewitî, xweliya xwe di çavên pişt zînê de teland, darên rewîsî bi dengên olanê ji çavên xwe de bi stranê sewsî bel dibûn, di yê devê kalan de, di benîştên daran acir dida. Hincirên di devê paleyên di çiyê û asêgehên da bi stranên kalemêran ve ji çuyina pilingan re dibû tiraf, ecacên di singê newala de bi sewta kalemêran ve dibûn ewrên reş û qîr û dilop bi dilop avî dibarand li ser komzikên reşahiyên li ser neqebên pelên hêşînê şewitî, vediçirand bişkokên nepênî yê di keremkotên daran de. Bi ecaca stranan, kalemêrên rêwî re şîncevokên di golên newiqî de, bi cotberên pinên di qelişteka zînê de bê tasewas fêrikên ji wan ber bi dengê rêwîyan re bê tirs û xof bi firê dixist. Marmarokan serê xwe ji qelişteken erdên repîn bêyî ku bibizdin derdixistin û di taldeya kevirên zingarokî yê ji axa erdê, bûbû qeliyên pêçiyên piyên xwe, berteka çavê xwe dixurand û her du çavên xwe yê mîna tehewên payîzî sorik di gewriya çavî de dilîst, çav li pîrêya ku di konê xwe de teqleyan davêje, bi lez zimanê xwe yê dargulîkî dirêjî pîrê kir lê pîrê yê ku mîna “ker dikeve heriyê ji xwedî bezatir tune ye” bi lez xwe di konên bi qul û qewar ên di nav kevir û bûxarên rengî mengo de, xwe wenda dikir, marmarok hêdî hêdî ber bi qirşikekî qalikê wî jê şeqitîbû çû, xwe di qaşilê ku tavê dabûbûyê û mîna lûlikê li xwe civiyabû de ramedand û pelgehên mazî yê lûlikî, serê xwe yê neqîşî di nava pelgehên nedawî de, derxist li dora xwe nihêrî û bazdida ser tehtikên perçivî, piştî xwe bi wan dixurand û li palên berbîjêr

xwe dişemitandin, ber bi devîyeke talde û xewle ve. Bilbilê di zinarên asê de ku qulên xwe ji heriya sor bi nikulên xwe yê kirtikî seyandibûn, bi teva refê çêlikên xwe ve li ser çimikê kewara hêlîna ji heriyê bi dengên xwe teva dengên kalemêra dibûn. Sewta bi newayeke xweş ji newalên çîya ho vedida, ji wan re dibû sab û bi esmanê kul û sor de bi firê diket. Bê tîrsa kevkanîya xwe, nîzm bi sikûra bajêr ve difiriya, perên xwe kevn kiribûn, şûna xwe ji sîxikên nû re dihiştin. Çend kewên gozel bi refên xwe re xwe bera qeraxa ferşê di latên li ser potikên ser xaçerêka di newalê de difetilî, li wir bi seyda kuliyên bê hestî ketin, berkurkên xwe tije kir şûnde bû qeqqeba wan, di sing û berga çîya bêdengî difetisand. Rewşeke bêhempa bi niştêcihê çiyê re çêdibû û êdî bêriya hilmeke bê xaza xerdelê û kîmyayî dikir.

Kalemêr, gede û zarok, xort û ciwan serê xwe ji şîbakeyên tirimpêlan derdixistin, du tiliyên xwe mîna dargulîkan, li ser dîka di singa bê de, dihejandin. Balûhêla xwe dida wîlwîla ku ji çîya dihat. Hejîkvaniyê ku ji hejîkan dihat, di bin piştîyê hejîkan de, li ber kêf û perosîya wan rawestiya û xwe bi asoyên ku di çavên wan de dibiriqîn, germ dikir. Bala xwe dida dawîya tirimpêlan û dinîhêrî; ne dawî û ne pêşî dixuya. Kalemêrên di tirimpêlê de, bi tîlefona destan digot; “Ji hevalên ku tirimpêla wan di pêşîya giştîkî de ye re bibêje, bila ji kerema xwe re leza xwe kêmkir bike, li pêşîya we kaşek heye, li tela kêşê çend darên mazî yê temendirêj û qalind hene, bila tirimpêl li wir raweste.” Çend tirimpêl li paş mabûn, haya wan jî ji hevalên wan çêbû, çend kêliyan sekinîn. Giştîk gihîştin hev, li hevdu civiyan. Bistîkek derbas bû, tirimpêl mîna gêrikên ku li ser moristanê bicivin li ser tûmîkekî civiyan, qîzên xama û tenik û dirêj gulav li xwe kiribûn, xwe bi bêhna çîya dixemilandin û hûçikên rengî pengo bedewbûna wan bêtir dida der. Ji hîlma merivan, kelekela li ser dilê wan, laşê wan sinciran-dibû, çend qomçeyên sing û berê xwe vekiribûn, bêhna sing û berê wan avzêma birînê bernixum di-bişkivand. Pîrekên ku kitanên ji rengê aştîyê bi serê xwe de kiribûn, bi desmalên şîrkî jî dabûn dorben-dên serê xwe, li ser kirasên wan gulên mihemedî û pelên wan ên mezin hatibûn nexişandin. Di binê kitên de, şînbêrik hebûn, bayê lê dida, pelikên li dora gerdana wan dibiriqand û xişînî jê dianî. Hinekan jî kirasên tenik li xwe kiribûn. Piçek bê dihat mîna keramperka hol dibûn. Kalemêr li hevdu civiyan û li bin dara berûyê çarmêrgî vedan. Apê Eto, taximê diranê xwe ji devê xwe derxist, hevalên wî çav pê ketin matmayî man û gotinê: Diranê zêr, diranê zîv di taximê diranên te de hene û heta niha qet tiştêk pê nehatiye, spîsaxlem e. Gelo kê ji te re ev taximê diranan

çêkir. Eto got: Fileh, berî ku nefî bibin, li vir xwediyê sin'et û kar bûn û erbabên karê xwe bûn. Ji kar fêhm dikirin. Tenê ji bo keda helal û karên bi rêkûpêk û bi esas dikirin. Lê em li wan hatin xezebê, me nehişt di cihê xwe de bistirin. Ew her tim kelemên ber çavên me bûn. Ên ku hatin kuştin, hatin kuştin, ên din ji ji mecbûrî bar kirin kun û pîneyên bajarên xerîb. Hevalên wî serê xwe berjêr kir û got; tu rast dibêje û tim çavên me li mizawiriyana bû. Vê ji cir û xuyê me ne xweş dikir. Wê çaxê tot di serê me de tune bû. Ma qey dinya ji ker û bê guh bû gelo! Lê tiştê çû mede dû. Tenê min ev tişt fêhm kir, divê mirov hay ji agirê xelkê hebe, da ku nebe ardûyê wan. De rabe, em herin bila xort û qîzên me, me di vî halê xemgîn de nebinin. Bû qerepera wan û bangî xort û qîzan kirin.

Bi hêzirani û çarpînî pehnî û pozika solên xwe li erdê dixistin û bi kilamên daweta dîlaneke xweş ku ji mil diricifand li dar xistin. Kalên pîr xwe mîna xortên çardasalî didîtin. Bi xortan re kab diavêtin, sol û pêlava xortan di taqê de havêtibûn. Hayt û hoyta wan bû. Devê xort û qîzan ji hevdu çûbû û tew bi sî û stara wan neketin. Ji ber xwe fedî kirin, ji dûr ve li dîlana wan temaşa kirin. Piştî ku ji hayhotê ketin, dev ji dîlana xwe berdan. Xort û qîzan bi çepikan ew pîroz kirin. Kalemêran berî ku li tirimnpêlan siwar bibin, ji tebeqeyên ku li ser pêşberkên wan wêneyên xezalan hatibûn xêzkirin, ji tutina nedawî ya nuh hatibû mengenekirin cixareyên weke qurman qut û stûr pêçandin û di hûndirê kuçikên latên lêvên xwe de diçikandin. Keledûman bi pûş û pelaxa temenê wan diket. Hilma şewitî, bayê kelê bi ser beroşa pişikê dixist, temenê wan dihat avdan û sûretên wan ber bi zerafê ve dikewand.

Piştî çend kêliyan bêhna xwe stend û şûnde dîsa ketin rêça xwe û weke pezên mêşin tirimpêlan dan dû hev û ketin çêrandina şîvên beriyên rewîsî, pitûmk û kulîlkên di neqebên kavi û di taldeyên asê de çirûsîn û mehand, şerûdên lebikî li ser serkêlkên di gomeyên kepirên deriyê kevnare de dida çikandin. Qûrfê hesinî pê de dikir. Poz û bilindahiya bi lewend ji dûrî ve xuya dibû, li ser Pira Dehderî komikên merivan weke gomzîkên ewran ji hevdu belawela dibûn, bi def û erbaneyê mêvanê xwe pêşwazî û kom dikir. Berê wan ber bi derê Mêrdîn ve diqeliband û peywirdarê li ser sûrên bê hempa mişt raperîna dîrokî jê dihat, pelgehên gulên spî bi baskên kevokan girêdabû û her qefleyek û pênc kevok bi hewa dixist û bi gurzên pelên gulên spî li ber piyên mêvandarên li ba dibû.

Apê Eto û hevalên xwe bi dengên berz û spî û gewrikî berê xwe dan ber bi şingewhera hola aştiyê, li her derê holê dengên dirûşmeyên aştiyê dihat, bajar

li vir vehewiyabû. Ji her deverê meriv hatibûn, bi kinc û bergê xwe yê neteweyî bajar xemilandibû, kevokên spî li asîmanê bajêr bi dengê aştiyê teqleyên gewr, bê hilm tiloqe dibû. Asîmanê bajêr tîrêjên heftrengîn jê dibiriqîn, şahî li ber berberojkên dilê bajêr mest dibû, li hin cihan dîlan digeriya, li cihinan şêwr xweş bûbû, li ser dika aştiyê aştiwxaz dixivîn, lawikê wî qabikek lekînî bişkokê avî û çend heb eskîmoyê bi cemed tê de bû ji paxila xwe derxist, bi destê rastê bi çengulê firaqê girt û xist bin çengulê xwe, destên xwe yê çepê ji nav kefa destê bavê xwe şeqitand, bi hemdê xwe destê wî xwê dabû, li dora xwe nihêrî lê devî wî ji hev çûbû, tu carî cihekî ewqas bilind û avahiyên cur be cur û girseyên ew qas bi cil û bergên neteweyî girêdayî, nedîtibû.

Çavên xwe li dora xwe gerand lê bavê wî ji çav dûr ket bû, bala xwe da kirikên bilind, çend kirik li kêleka rê bû, çû li ser kirik sekînî, kî hat û çû bişkokên wî kirîn, çend qirûş ketin berîka wî, lê qet pere ne li ser guhê wî bû, tenê bavê wî li ser guhê wî bû, destê xwe da pêş enîka xwe li pêş nihêrî, tenê dûxan û dengê teqa teqa derban dihat, di ber xwe de kir nirenir du niqut hêsirên sor di ber qûmaxên bibîkên wî de gindirîn, li ser hinarkên wî yê ji germê qemirî bû da, pêlên girî di zengelorka wî de girêk dibû, di destekî wî de firaqa lekînî û di destê din de ji pêçiyên xwe ji xwe re dike saqo, di nav keledûmana jahîrî li bavê xwe digere. Hew dîtina ku dît bavê wî û polisek li teniştê hev in, tu nemaye her du ji tînan bimirin, polês bi derba kevîrekî kevkanîyê ji paş serê xwe xwaribû, bavê wî ji ji bêhna gazê hilm lê çikiyabû û bi lêdanek ji paş ve di cih de qûn rûnişt û li ser piştê veketibû. Lawikê apê Eto çav li bavê xwe ket, çend heb eskîmo û bişkok mabûn di devê bavê xwe de eciqand û çend niqut di devê wî de guvaşt, hilma bavê wî hat ber wî, asta şekirê wî asayî bû. Apê Eto got "Leşkerê tercal bi bedena me ketiye, li serê me bûye kîrê kûçik, lê em çi bikin em ji însanan hez dikin em ne bextereş in" lawikê wî berê xwe da polês çend niqut ji ava bişkokên bejî mabû dawerivand ser lêvê polês, hişê wî hat serê wî, lêvên wî lerizî, bû mirçemirça devê wî û tehma devê xwe xweş kir lê teqînî ji binê firaqê hatibû. Nexweşiya wî ya apê Eto weke hev bû, lawikê wî xwe çend kir hembêza bavê xwe û pêçiyê xwe yê ziravik di nav porên qilçixî yê bavê xwe de veşart lê ûrtûrta bavê wî singê wî dikûpand, lawik destmala xwe ya destan da ser birîna paş serê polês û bi destê wî girt rakir, li ser qûnê rûnişt. Qederekê bi hev re li dengê zengila polêsan û bi teqateqa dengên derban, bi wilewila însanan, bi qerepereya dengên dirûşmeyan li bin guhê hevdu olan dida guhdar kir û di keviya qula çavên hevdu de di cî de ma.

Bilbil

Li seherê li îskanê
Meya eşqê vexwar bilbil
Li nav bax û gulistanê
Pir dinalî çima bilbil

Ji bo gulê meya evîn
Her dinoşî li seherê
Li nav gulistana şîrîn
Bi elemî çima bilbil

Her dem rewşa te xemgîn e
Tew vedixwî li seherê
Nalîna te dilbirîn e
Evîndarî çima bilbil

Li seherê tim hişyar î
Pir digêrî ji bo gulê
Bo evînê her dinalî
Birîndar î çima bilbil

Derd û xem û eleman
Bi zebarî her dem kêş î
Şev û rojê li gulistan
Tu dinalî çima bilbil

Gul ji bo te pir evîn e
Tu bawer be em jî zanin
Ji bo mejî tim şîrîn e
Qe nabînî çima bilbil

Gula me jî heye bizan
Em jî wek te evîndar in
Ala rengîn ji bo Kurdistan
Tu nizanî çima bilbil

Were ez û tu bi hev re
Li seherê hildin îskan
Bo elemên xwe bi hev re
Naynin derman çima bilbil

Bo derd û keder û xeman
Destên biratî nadin hev
Bi elem e gulistan
Bo azadî çima bilbil

Li nav bax û gulistanan
Binalîn tev li seherê
Ez û tu hev bigirin destan
Digel Sîpan wisa bilbil

Sîpan XIZAN



Hesoyê dîn



Berhevkar: Zekî AKDAG

Çi hebû çî tune bû Hesoyek hebû. Heso li cem axayekî azepî dikir. Navê jina wî jî Fatê bû. Rojek ji rojan mangeya Heso dimire. Heso jî mangê digurê (post dike) û radihêle çerm û dihere bajêr. Di nava bajêr de darekê dibîne û çermê xwe li ser guliyên darê datîne û ji darê re dibêje:

-Darê; ez ê hefteyeke din dîsa werim. Gava ku ez hatim te çermê min nefiroştibe ez ê te di kokê de hilkim.

Heso ji darê re weha dibêje û vedigere malê. Piştî hefteyekê Heso dîsa diçe bajêr. Ji hember ve li darê dinihêre ku çerm pê ve tune ye û pê re kêfa xwe xweş dibe. Ew dibêje qey ku darê jê re çerm fi-roştiye. Heso tê hinda darê û dibêje:

- Ka pereyê min?

Dar, deng nake.

Heso dîsa dîsa bang dike: Ka pereyên min?

Dîsa deng bi dara feqîr nakeve.

Heso bi hêrs tevîrê xwe digire û dest bi vedena riçikên darê dike. Piştî vedena demekê Heso rastî kûzek zêr tê. Heso şaş dibe û ji darê re dibêje: Himm, min fehm kir, te heqê çerm veşartîye bin heriyê. Heso kûzê xwe digire û dihere gund.

Ku diçe malê ji Fatê re dibêje:

- Keçê Fatê bicehenime here nîvtilma mala axê bîne ku em zêrên xwe bipîvin.

Fatê bi matmayî:

-Kuro Hesoyê reben te ev zêr ji ku derê anîn?

Heso:

-Min bi çerm ev qas zêr kirîn.

Fatê dere nîvtilmê tîne û Heso zêrên xwe dipîve û çend zêran jî dike binê nîvtilmê û ji Fatê re dibêje:

-Vana jî bide mala axê.

Fatê nîvtilmê dibe, wan çend zêren jî diyarî axê dike. Gava ku çavên axê bi zêran dikeve pir şaş dibe û ji fatê dipirse:

- Keçê Fatê we ev zêr ji ku derê anîn?

Fatê:

-Manga me mir. Heso jî, mange gura û çermê wê bir bajêr fi-roşt û ji me re pê kûzek zêr kirî.

Axa:

-Çi! Kûzek zêr? Wel wel, manga Heso yek e, yên min sed in.

Axe bang li azepan dike û mangayên xwe gişkan serjê dike û digurîne. Axa çerman hildide û diçe bajêr û bang dike:

- Werin çerma, ha werin çerma, çermê dewêr!

Axa heta êvarê wekî çerçiyên bang dike lê kes nabêje ka ew çî ye. Çerm hêdî hêdî bêhnê didin lê bajarî bi vê bêhnê aciz dibin û xeberê didin zabiteyan. Zabita tîn û çend şelmaqan li axê dixin û axê dikin riya gund. Axayê reben dike ji qehran bimire:

-Axx axxx! Kero, Heso te mala min şewitand!

Axa bi vê qehrê bangî Heso dike. Peyayên axê Heso tînin û bi fermana axê dikin çehlê.

- Kî ji gundiyan hat û çû, bila di ser de birî.

Kî dere û tê di ser Heso de dirî. Heso, îcar radibe vê pîsiyê hişk dike. Gava ku sizaya wî diqede pîsiyê dike tûrekî û bi rê dikeve. Pir dihere, hindik dihere dibîne ku karwanekî bazirganan west girtiye. Heso dihere nêzikî wan û pifi bilûra xwe dike. Ew qas xweş pif dike ku her kes heyran dimîne. Heso radibe ku biçe, bazirgan dibêjin:

- Mere! Ji me re hinekî din pifi bilûra xwe bike bira!

Heso:

- Wele gelî birano ez nikanim, lê malê min î sax tiştêk bibe?

Bazirgan:

- Bira, ma kîyê çî bibe? Ger tiştêk bibe jî em ê te kêfxweş bikin.

Heso bilûra xwe digire û pif dikê heta nivê şevê, wan bi dengê bilûra xwe gêj dike û gişkan dike xewê. Gava ku her kes dikeve xewê radihêje tûrê xwe davêje çem. Bazirgan sibê bi qîrîna Heso, bi xwe dihesin.

- Ha hoo, wey li minê bavo! Ka malê min î sax? Ka malê min î sax?

Bazirgan:

- Lo birayê delal heyrana te, tu bang neke tu çî dixwazî em bidin te.

Heso ji bazirganan bi qasî barê kerekî caw digire û riya gund dikute. Tê malê û ji fatê re:

- Keçê Fatê here mîtroya mala axê bîne em van pirtiyên xwe bipîvin.

Fatê mîtroyê tîne û cawê xwe dipîvin. Heso topekê jî dişîne ji mala axê re.

Axa:

- Fatê we ev caw ji ku anî?

Fatê:

- We Hesoyê me kiribû çehlê, Heso jî gû hişk kir û bir bajêr û firoşt, ji me re pê pirtî kirîn.

Axa:

-Heso gû hişk kir firot, ez ê yê teze bifiroşim.

Axa jî weke Heso dikeve çehlê û gundî giş tîndî ser axê de pîsiyê dîkin. Axa vê pîsiyê dike tûrekî û dihere bajêr û bang dike:

- Werin gû, werin gû!

Bajarî bêhna pîsiyê seh dîkin û ji bêhnê dixeniqin, ew qas aciz dibin ku ji qehran xwe winda dîkin û diçerpînin axê.

Axayê reben tîr kutikên xwe dixwe û tîr gund. Bang li peyayên xwe dike û dibêje:

- Wî Hesoyî bigirin dest û lingan girêdin û tîxin çewalekî, devê çewêl jî girêdin û bavêjin çêm.

Peya, bi vî awayî Heso tînin ku bavêjin çêm li tenga gundekî dengê dawetekê tî. Peya ji bo nanxwarinê Heso li wir, li çolê, dihêlin û diçin dawetê ku nanî bixwin.

Hesoyê reben di hundirê çewêl de dimîne. Lê belê Heso dengê keriyek peş dibihîze. Dema seh dike ku şivan hêdî hêdî nêzik dibe Heso bang dike:

- Wele ez nagirim bîle ez nagirim.

Şivan dengê Heso dibihîze û ber bi wî ve tî û dibêje:

- Lo pismam li te xêr e? Tu di vî çewalî de çer dikî? Tu çî nagirî?

Heso dibêje:

- Tew qalê neke pismam, dotmameke min heye qîza axê ye, dîkin ku bi darê zorê li min mehr bikin. Lê ez jî naxwazim bizewicim.

Şivan:

- Lo pismam! Ka ez bikevim şûna te, tu jî bikevî

şûna min nabe?

Heso:

- Dibe, ma çima nabe!

Şivan devê çewêl vedike û bi xwe dikeve hundirê çewêl. Heso jî devê çewêl didirû û wî li wir dihêle û keriyê pêz dide pêşiya xwe û riya gund digire.

Peyayên axê nanê xwe dixwin û tîndî ku Heso çekin çêm. Dema ku peyayên axê tîndî şivan bang dike:

-Ez ê bigirim, ez ê bigirim!

Peyayên axê şaş dibin û dipirsin:

- Tu yê kê bigirî?

- Ez ê qîza axê bigirim, ez ê qîza axê bigirim.

- Hadê kurê keran! Dike qîza axê bigire!

Peya çewêl digirin û davêjin çêm û şivanê reben bi ro de dihere.

Hesoyê te, tî malê û bang dike:

- Keçê Fatê deriyê axura mala axê veke ku ez vî peşê xwe tîximê.

Gava ku çavê axê bi Heso û pêz dikeve, careke din şaş dibe:

- Lo Heso tu nemirî? Te ev keriyê pêz ji ku derê anî?

Heso:

- Na axayê min ez nemirim. Min ev peşê ji çêm anî. Ew jî azepa ez avêtim kêlekê, ger ez bavêtima nava çêm min ê hîn pir bianiya.

Gava ku axa û gundî vî şorê dibihîzin giş riya çêm digirin.

Pîrek dibîne ku lawê xwe dihere li dû bang dike:

- Lawê min ji diya xwe re bizineke kol bîne. Ya bi qoc neyne. Çavên diya te nabînin ê kincên diya te biçîrînin.

Her kes xwe li çêm digire û xwe li çêm diqeli-bîne. Gundî giş difetisin, gund bi Hesoyê dîndî, Fatê û pîrê dimîne.

Çîroka min qediya, rehmet li dê û bavên guhdaran.

Herê: Riha

Şoreşgerê esra teng

li kuçeyê...
roj hêdî hêdî bêyî ku li pişt xwe binêre
diçû ava
sofiyekî li pey temaşe dikir
dirûvê tozê jî dihat guhertin
şeytan di xew de bû
sofî hê li rojê temaşe dikir
hêdî hêdî bi gopalê xwe re giran dibû
hêdî hêdî qesas jî mal derdiketin
kuştî li bin pirê...
û keçikên ku bi destên nesrînê pembû
didan hev
girêdana xwe bi hişkiyekê diguheztin
tolaz jî bi hosteyî li pey wan digeriyan
şoreşger, ji wan cuda ye
ji dengvedana esra teng
lingê xwe ji devê mîroyekê derdixim
ber bi milçikandîna tenûrê ve
ber bi nanê sîrkirî ve
û herî dûrî lêvên bi rûj sinetên dirêj

ji dengvedana esra teng
xwe çeng dîkin janên mist
ji xala rûyên zer ji ava cêrê li ser text,
xwe davêjim nava hawinê serhildanên
kutayî
xwe ji xizaniya zarokbûnekê
davêjim mirina kalekî zahrî ziwa
li ber esra teng li nav xweliya dohnê bera-
nekî
li ber birca belek bi dar ve dikim
hêviyên xwe ên li ber danê esrê
spîbûna porê min,

lêgerîna nava giyanê min
û xwenaskirina min
li ber deriyê esra teng
kevok li serê minarê zelq dike
keçik, bi kolan, toz, bê û dara tûyê re
di ber dilê xortan re dizîzikin
ez jî ji wan kevokên ji rêketî me
dibim neqşek li gopêl tîm badan
qesas hêdî hêdî xefkên xwe badidîn
nîfşên nû li ser goristanên kuştiyan dikenin
roj li her cihî
bi rengê kuştinekê zer dike û diçe ava
keçikên zêviyan di neqeban de di hevşa-
bûnan de ne
Şoreşger, ji wan cuda ye
hê saet pênc
her kes xwe dide hev
li Nisêbîna nîvkuştî
li ber dergehê esra teng
kuştî tenê li rastê dimîne
li kuçeyê...

Marîn REHMAN

**Hasip YANLIÇ**

B e r e d e s

Vî kûçikî ji vê derê biqewirîn! Bila ji ber qehwexaneya min here! Hadê zû!

-Kûçik tu yî! Kûçik lawê kûçikan, çima qehwexaneya te ye? Ez ji xwe re li ser peyarê me. Çi ji te re, ez li vir im û naçim.

- Lawo ez ji we re dibêjim vî kûçikbavî ji ber çavên min bidin alî.

- Hesen tu here hundir looo, xwe zêde aciz neke, ma Elî dîn e tu yê ji li benda wî dikevî.

- Çi dîn e kuro, ma tu nabînî, çi çêran dike, heke dîn e bila ji dê û bavê xwe re çêran bike.

- Dê û bavê min, min naqewirîn ku ez çêrî wan bikim, hey kûçikbav.

Hesen bi kumlan, li serçavê wî dixwe. Cîran wan bi zorê ji hevdu diqetînin. Dev û pozê Elî di nav xwînê de maye. Qîreqîra Elî qerebalixeke pir mezin civand. Ji qerebalixê deng bilind dibû. Niçeniça qerebalixê bû û digotin "Ma şerm e lawo, mirov qehwecî be mirov nikaribe çayekê bide dînekî! Dikirin niçeniç.

Elî birin ser Kaniya Gûzê û dev û rûyê vî şûştin. Anîn ber qehwexaneyê, Elî dîsa dest bi çêran kir.

- Kûçik lawê kûçikan, lawê qereqehpê, tu hew bi min dikarî, here Qere Hadî bila serê te têxe diya te.

-Lawo ez ji we re dibêjim vî dîne heram ji vê derê bibin, ev ê bibe belaya serê min.

Cîranên Hesenê qehwecî ketin piyê Eliyê dîn û ew birin ber bi peykerê Xeto û Remo ve. Elî ji Xeto û Remo pir hez dikir. Ji peykerên wan re jî pir rêzdar bû. Gel jî bi vêya dizanibû. Yekî ji Elî re cixareyek pêçand û dirêjî wî kir;

- Pismam hela vê cixareyê bikişîne, hilma xwe fireh bike lo, tu jî xwe bi ber bayê dînan dixî.

- Jixwe kurê qereqehpê belaya xwe bi min dida. Wer xwe bide ber siya peykerên Xeto û Remo lo.

- Ka hela bibêje Hesenê qehwecî çi ji te dixwaze?

- Nebêje Hesenê qehwecî, bibêje kurê qereqehpê!

- Erê ha, kurê qereqehpê çi ji te dixwaze?



- Nizanim ez vê sibê, ez bi rê de diçûm, Xalê Mihemedê Mala Nofayê tu nas dikî ne wiha?

- Erê lo ez nas dikim, ê paşê?

- Paşê jî ji min pirsî got; "Tu vê sibehê bi ku da diçî?" Min jî got; "Ez diçim qehwexaneya Hesenê kûçik, hew min lê nihêrî kûçikbavo li min xist. Îcar ez nizanim kurê qereqehpê çima li min xist.

Yê li ba wî kenîya û got "Erê ew der qehwexaneya Hesenê kûçik e lê mirov li ba wî nabêje.

- Îcar mirov dibêje çi?

- Mirov dibêje qehwexaneya Hesen Beg.

- De herin lo, îcar li pêş wî beg û li paş wî jî kûçik, de rabe ji xwe re lo. Min bi hevalên min re bihêlînnnn, hadêêê, dureyên heram.

Terka helbestê

Tewfîq HÊJA

Ku mijar terka tiştêkê/î be, dibêjim qey pêşiyê terka dayîkê, terka welat, terka yarê (ku hemûyên wan jî hembêzên germ in) tê bîra mirov. Lê em terkirinên hanê bihelin û weke ku ji sernivîsê jî diyar e em werin ser mijara terka helbestê ku bi xwe ne kêmkî kul û kesera terkên din e.

Heger ne ji xema “em tûj nedin berê” bûya, min ê bigota “xiyaneta li helbestê.” Lê em tûj bidin berê jî, nedin berê jî terkirin her awayê xiyanetê jî di xwe de dihevin. Te pişt xwe daye tiştêkê/î, te lêxistîye û tu çûyî û te ew hiştiye bi halê wê/î, ka îcar em ê çi navî li ve yekê bikin? Xayîntî cureyek ji cureyê çûyîn û terikandinê ye.

Teqez li bala gelek xemxurên wêjeyê ye, hema bigire hemû nivîskar û wêjevan bi helbestê dest bi karê nivîsandinê dikin lê paşîn piraniya wan heta bi hetayê dev jê ber didin. Ji bo gelek wêjevanan helbest pêlika pêşîn e, helbest yar û evîna ewil e; bi eşq û sewda xwe li rêzikan qerase dikin, dixwînin, dinivîsin, ji me tevan eyan e, hin ji wan hebek, du heb pirtûkan jî diweşînin lê paşê, mixabin paşê terkedînya dibin ji warê helbestê, diçin û hey diçin...

Ne tenê em kurd, di gerdûnê de jî heman trend her heye û ji Tolstoy heya J. Joys, ji Wirginia Wolfê heta Yaşar Kemal wiha ne; helbest yara pêşîn e ku ji hembêza wê şîr mijandine. Gelek nivîskarên me yên ku îro hespê xwe yê wêjerûmetê didin bezandin di qada kurdî de jî her wihan in; angû bi helbestê dest bi eşqa nivîsê kirine lê pişt re ne wekî helbestvan, wekî romanûs û çîroknûs hatine naskirin, lewre nivîskariya xwe li ser lewnên hanê domandine. Ku ji helbestê ev çend veger hebe, ku ev çend nivîskarên nemir û mezin li ser vê şopê ne, ka îcar mirov dê çawa rexne, neyînî û negatîfîyekê nîşan bide? Pirseke çetîn û kambax. Bersiv ne hesan e lê ji bo ku em karibin ji navê derkevin gerek em şibakeya xwe ya nêrînê hilibijêrin. Ji şibakeya wêjeya giştî ya xuya dike ev e; riyên ku nivîskarên hanê pê de çûne jî wêje ne, çîrok û roman jî guliyek ji guliyên dara edebiyatê ne; baş e ku gulî ne, baş e ku bi rengorengiya pelan, bi çîql û kulîlk û fêkiyên dagirtî ne; başê başan e ku Tolstoy bûye romanûs û gewreberhemên mîna Şer û Aştiyê, Anna Karanî-nayê bo me kirine diyarî, baş e ku Yaşar Kemal destana civak û mirovatîyê bi navê romana Înce

Memed honandiye...(xwezî û sed xwezî ku karibûya ev destanên wiha bi kurdî jî binivîsîya.) Lê belê ku te ji şibakeya helbestê mêze kir, wê çaxê jî mirov dê bibêje “Wey rebena helbestê, wey pepûkê, wey qijikê, ax û wax ji te re, dîsa ya ku hat terikandin tu yî, ji bo ku te henas û bayên wiha xurt ji dest revandiye rûnê û çongên xwe bixe.”

Helbest maka hemû cureyên wêjeyê ye, destpêk û reh e, bi hezar salan e lewnên nû diwelidîne ji xwe, wan mezin dike, wan dimejîne ji memikên xwe yên newabêjiyê, ji lihevanîna gotin û rîtm û wateyê. Belasebeb negotine “Hemû berhemên hêja û giranbûha helbestî ne.” Loma jî wê gotin cihê xwe bigire ku em bibêjin; tu terka helbestê bikî jî, helbest terka te nake! Û wê gotin cihê xwe başbaş bigire ku em bibêjin; çi xweşyar e helbest, çi dilsoz û dilyar e; çendîn û çendîn û dayîkeke dîlşewat e helbest.


Erê wisa ye lê ka em bi pey pirsar “Çima ji wêjevan re destpêk e” bikevin. Ku em pirsar hanê hew ji me kurdan bikin, bersiv zelal e, lewre heta serê sedsala 20'ê emîn jî hema bibêje nivîsên me yên pexşanî tune bûn. Wêjeya me ya li pêş ya devkî bû û jixwe ew bi xwe jî helbest û muzîkal e, bi qasî ku epîk e, ew qas jî lîrik e. Û li cihê ku E. Xaniyên me, Feqiyê Teyran û Melayê Ciziriyên me, Cegerxwîn, Hejar û Hecî Qadirên me hebin, helbet dilbijokî û hezkirin ji wan re ye, model jî ew in. Lê ne tenê li welatê me, li welatên din jî kêmkî zêde rewşên wiha hene, loma jî em bibêjin; erê destpêka bi helbestê ji çandê ye, ji kevneşopiyê ye, ji dilhebinî û nazenîniya helbestê ye, ji hêsgotin û xweşxaniya helbestê ye; kurt û kurmancî ji mirovayetiye ye, lê terka wê jî çi ye, çima gelek kes heta bi hetayê terka wê dikin û sadiq nîn in bi yara xwe ya pêşîn re?

Bersiva “Çima”yê ne yek e û ji bo hemû kesan ne heman tişt e û helbet biryar û terciha kesan e; mafê terkirina helbestê jî, ya terkirina cureyên din jî heye ji bo her kesî? Hin henin di vegotina pexşanî de şareza û bi huner in ku ji vê taybetiya xwe haydar dibin, rîya xwe diguherînin; hin henin nikarin terz û şewaza helbestê baş hîn bikin, dîlxwaz in lê bi ser nakevin; hin henin sînorê helbestê ji derbirîna mexsed û mirazên xwe re teng dibînin (û şaş in, hew E. Xanî û Fîrdewsî û Shekspere bi bîr

bînin bes e, hê ku me yê modern nehijmartiye); hin jî henin qet lê varnaqîlin ku xweber ber bi çîrok û romanê diherikin, wisa li xweşa wan diçe, wisa jî didomînin. Amena! Her kesek û dilê xwe û her kesek û riya xwe, lê wê halê helbestê çi be? Qey helbest wê hema karê amatoriye be ji gelekane re? Ji bo wêjeya me ya îro bibêjim, gelekên ji me bi çavekî wiha li helbestê dinihêrin an jî têkiliyeke wiha pê re datînin. Hema ku piçêkî vegotina xwe xurt kirin, hema ku qeweta vegotin û nivîsandina du, sê rûpelên pexşanî bi xwe re dîtî, pê re jî rêzikên helbestê li ber çavan biçûk û sivik dibin, helbest dibin helbestok û ka tu li ku yî romana gewre! Ligel “bazara kurdî” bazara helbestê jî her “kesad “ û îro nav û deng jî, mal û milk jî bi helbestvaniyê nabe, tew mal û milkê heyî jî ji dest diçin. Rast e ji bo her kesê/î wisa nîn e, sedemên meşrû, sedemên kesane, sedemên wêjeyî û civakî jî hene lê divê em sedemên mîna berjewendî û payetiyê jî bibêjin.

Helbesta me ya klasîk cihê xwe girtiye, di nav helbesta cihanê de jî xwedî reng û dengê ye, hêj ku têra xwe nehatibe naskirin jî. Helbesta me ya îroyîn jî perwaz dide xwe û çî nizm, çî jî bilind bi firê ketiye û ber bi “banê gerdûnê” ve bala radibe. Keç û kurên bavan hene, bi saya serê wan helbesta me deng û rengê xwe digire û bi saya serê wan wê “xelq bibîne ku kurd jî cahil û nezan nîn in”, “kurd jî bi eşqê dizanin”, şabaş ji wan û ji hemû nivîskarên kurdî re lê ku me got helbestvanî, ev xebat û şixulên profesyonel dixwaze, ne bi hewesên xortaniya naşî ku mîna kefa ser avê bi bayekî sivik bitefe. Profesyonelî jî bo hemu cureyên wêjeyê pê-

diviyek e, lê herî zêde helbest vê dixwaze, dildarî û eşqê dixwaze. Pêdiviya helbesta me ya kurdî jî bi nêzikatiyeke wiha heye. Me pêdivî bi kesên ku helbest ji xwe re kirine armanc heye, me hewceyî bi jin û mîrên ku helbestvanî ji xwe re weke kar û pîşe hîlbijartibin heye; lê bi evîni! Pirtir jî hewcehî bi helbestvaniya jinane heye, lewre helbestvanên me yê jin hemû di nav hev de ji neh, deh kesan nabihurin. Mêr jî wisa ne pir in ku bi temamî bi karê helbestê radibin. Ev yek jî dihêle ku helbesta me têrî xwe xurt nebe û di bin siya tiştên din de bi-mîne. Reng e tu dinihêrî hema hema ber bi hostehiya helbestê ve tê, êdî hêdî hêdî deng û dirûvê xwe çêdike, êdî wexta wî/ê ya afirandina berhemên mayînde ye, lê bi carekê dibe terq û berê xwe jê li ba dixê û ka ku êdî tu karibî careke din wî û helbestê li gel hev bibîni. Îlhan Berk ên xelkê hene, heta nod saliya xwe jî dil û hinav û mêjî û xwîn tev de mişt helbest in; Sylvia Plath ên xelkê hene, bi jiyana û bi mirin û heta bi şewazê mirinê jî mişt helbest in. Hene û hene, mînak gelek in. Şikur êdî helbestvanên me yê helbestyar jî hene, li ser rêça Seydayê Cegerxwîn û Cizirîyan in, lê hindik in, lê xwînerên wan kêr in, lê car din jî bi eşqa helbestê li ber xwe didin û bi bêjeyên kurdiya gululî, bi hêma û remzên kulîlkî dinihêrin li dinêya gewrik. Helbest gerdûneke din e di nav gerdûna heyî de, zimanekî din e di nav zimanê xav û rijî de, jiyanekê din e di nav jiyana reş û spî de û li benda evîndarên xwe yê nû û dilsoz e, ku xêliya ser rûyê wê rakin da ku sirên xwe li ber wan raxe.



Izmir

Li ser parsûyên demê
Çend trajedî hatin jiyîn
Û dergehên hesinî
Li ser çend evînan hatin miftekirin

Vexwerina çayê çi deman
Bê te qet nizanim keko...
Li ber rêwîtiyên bê hejmar
Nizanim ji dilê te re çi xeman
Pêşeroja cihanên nû yan
Serdorên xaniyê min ê tenê mayî

Îdîaname

Li her dera bajêr
Deng û rengê xemsariyê difûre
Bê çav e şev
Bê bav e tav
Xav e
Xwarina bêbavan
Li dadgehan bi nav e
Bêbextî


Faysalê ÛSIV

Xirberojk

Di hembêza kadizê de
Bi lorîkên şeva bi bê re
Daqulî xewnên xwe dibim
Li rojavayê xewnên xwe
Li wesleyek hetav!
Li wesleyek zerya digerrînim çavên xwe
Ne Leylê û Mecnûn heye li vê fêzê
Ne jî şemaleke ku tariyê biçirîne
Bi kirasekî ji qeseba qemerê...
Bi xemla hezar û yek şevî
Xwe li gerdena şevê digerrînim

Da ku veçirînim evora şevê bi ser xirberojkan de...
Guliyên bûkên nûguhêztî kur dikim
Devê kerban vedikim
Difûrim ber bi asîmanê heftan ve
Ey Xweda!
Bi kalîn û nalîna dilê bi lavelav
Li biçirînen te yên çirûsîner dibişirim
“Ronî hinekî din ronî”

Xecê OMERÎ



Şengul OGUR

Dev

Dev bi şûjînan hatiye dirûtin û bi gotinên pîroz hatiye girêdan. Ji bo vê jî nikare biaxive. Li şûna axaftinê hin dengên ku nayên fêhmê ji navbera cihên dirûtî dertên.

Piştî ku demeke dirêj di ser girêdana dev re bihurî, girêka girêdana dev tu nemabû bifilite û pê re jî tu nemabû ku êdî ew dev, dest bi axaftinê bike. Lê beriya ku girêdana devê dirûtî û hatiye girêdan vebe, ji devekî ku duayên bi aqil jê bilind dibûn, dev dîsa heta demeke ku êdî nayê zanîn, hat girêdan.

Derdora devê dirûtî û hatiye girêdan edab gir-tiye. Pizrikên mezin li dora wî devî şîn hatine ku êdî tu çav nikarin dîtina vî devî ragirin. Loma bi dîtina vî devî re tiştê ku bi mirov re çêdibe tenê erq in. Bi yek carê re erq tên mirov û mirov yekser jî xwe re li cihekî ku bikaribe lê vereşe digere.

Pizrikên li der û dora dev şîn hatine tije kurm in. Ev pizrik jî kurmên ku bîza mirov ji wan diçe re bûye hêlîneke biber. Bi hezaran kurm hene di van pizrikên li der û dora dêv de şîn hatine de. Û her ku diçe kurm zêde û mezin dibin û dîkin ku wî devî bi tûmî bixwin.

Heke ev dev nehatibûya dirûtin û girêdan helbet wê niha ne di vê rewşê de bûya. Devekî xweşik wê jî vî devî derbiketa. Loma hingî wê jî vî devî ne kurm, lê wê peyv derbiketa.

Gelo di kûrahiya vî devê dirûtî û girêdayî de peyvên nerizîyayî, bêhnpeketî mane? An kurm bi peyvên di kûrahiya vî devî de veşartî mane de jî ketine? Ma kurm bi peyvê jî dikevin gelo?

Peyv jî dirize? Edab digire? Peyvên ku nikarin werin gotin û demeke dirêj di tariya dev de dîl dimînin erqê bi mirov dixin û dîkin ku mirov vere-

şin?

Çawa qelş bikevin zeviyên avnedîtî wilo jî qelş ketine vî devê peyvnedîtî. Dora dêv ziwa bûye. Rewa tê nemaye. Kurm û kêzan hemû rewaya wê ziwa kirine. Carinan dema ku hay ji xwe çêdibe û hewl dide biaxive jî, çav li şûjînê dikeve û jî tirsê dirûtinê xwe ker dike. Lê dema ku vê tirsê jî ser xwe davêje û jî bo ku xwe ji kurmên xwe xelas bike û biaxive, rîska careke din dirûtinê tîne ber çavan, wê çaxê jî bi devekî ku duayên bi aqil jê bilind dibin tê girêdan û daxwaza axaftinê ya dêv, di dêv de dimîne û peyvên ku dikir jî dêv derbiketina jî, bi yek carê vediguherin xweliyê û bi tariya dev de diweşîyan.

Sê rûyên vî devî hene. Aliyekî wî tirs û aliyekî wî bêbawerî û aliyê din jî nexweşiya jî, di navbera tirs û bêbaweriyê de heta bi hetayê mayîn û bo vê jî xwe jî vê tirs û bêbaweriyê rizgarkirin e.

Lê mirov nizane ka bê kîjan rûyê vî devî wê bi ser bikeve. Heke bikaribe rojekê xwe jî wî devê ku devê wî girêdayî ye, jî wî devê ku jê diayên bîaqil bilind dibin rizgar bike, wê bikaribe devê xwe yê dirûtî veke. Loma ev dev jî tirsê wêdetir, jî bêbaweriyê ketiye vê rewşê. Di kûrahiya çavên vî devî de jî tirsê wêdetir bêbawerî beloq e.

Ji ber ku çîroka vî devî neqediyaye ez nizanim bê çîroka vî devî wê çawa xelas bibe.

Gelo ev dev wê tim wilo dirûtî û girêdayî bimîne û bi demê re birize, beyî ku dest bi axaftinê bike û çîroka xwe jî me re bibêje, yan na ew ê xwe jî tirsê dirûtinê û jî bandora duayên ku wî girêdidin rizgar bike û wekî ku behsa bûyereke dîrokî bike wê behsa çîroka xwe jî me re bike?

Serdaneke dereng



İsmail HACANÎ

Kurê min xendxendok e, dermanê wê mîza zirkuran e, pîrê jî ji bo Xwedê hekîmeke entîke bû, her digot: “Pîsî bi pîsî dice” gelek caran dermanên wê ji zibilê dewaran bûn.

Navkela wî sot, ber ranên wî germ bûn. Bi ser xwe ve hat. Kuro eve min çi kir?

Spêdê dê çi bibêjim xanima xwe, sera mîzê bebik kuşt, dê bo min çi bibêje?

Laheylel wela, ne hestiyên te jî yên bûne ax, evê nîvşevê hekîmiya xwe ji kê derê anî li min kir bela. Tiştê jê hatî wekî dizekî şareza xwe qelast û kurê xwe yê biçûk ji ber singê dayîka wî rakir û danî ber singê xwe.

Xewa wî nahê, nivîn ên çivirbûyî ne, niqiroskek dihê û yek diçe, ji nişka ve asman hemû bû kevalek û demê hevalê wî tê de diyar kir, dikeniya û digot: “Hey kelmîzek hey, hey, hey xwe ve mîz”.

Ew jî di zik de dikeniya, xwedê jê razî, vê nîva şevê tu bo min ji kê derê hatî? Li gel bilindbûna kenîya wî ya pengiyayî, xêzana wî hişyar bû.

- *Te xêre vê nîvê şevê tu bi çi dikenî, te xewnek dîtiye?*

- *Çi nîn e ez bi Pîzo dikenim ê hatiye ber singê min û ez bi nivînan ve avdame.*

- *Hey la bedîle kurt, bi roj ezmanek di devî de, dê hema bi şev jî bibêje çizê.*

Hêj qralê xewê şanên mêşkên wî dagir nekiribûn, dengê di guhan de xewinî:

Were yariyan

Kutilkên kariyan

Berên berdeqaniyan

Mane li hefka kebanîyan

Xwe ji textî havêt û pêxwas çû dergehê qenterê, kolaneke bê pêjn û bê deng. Pişt û pişt zivirî, dergeh girt û pişt xwe dayê. Lêvên wî ziwa bûn. Lêdanên dilê wî siwar bûn. Reha stûyê wî bilind bû. Her du destên xwe kirin gulmîçik û bi singê xwe venan; ya Rebî tu xêr bikî îşev goristanê ez bo xwe kirime armanc, ne ku ez bimirim, an dîn bim, ma ne nîvê yên dîn, dinivîn hişyar û spêdê radibin dîn.

Spêdê zû ji malê derket û neçû ser karê xwe û ne kesî dizanibû ka bi çi ser çûye. Tirimbêla xwe li tanga gundê kevn hêla û bi pêngavên giran û bi sehm kolan bi kolan diçû, gihîşt ber derê mala

hevalê xwe û bi sê dengan gazî kir:

Were yariyan

Kutilkên kariyan

Berên berdeqaniyan

Mane li hefka kebanîyan

Kesî bersiv neda.

Û li çepê zivirî semta pencereya jûra Hesênê Dîn û bi sê dengan gazî kir:

Hesen moçke!

Hesen jî bersiv neda.

Gihîşt kolana teng, tiliya xwe danî ser zimanê xwe, ftiyek veda û daçemiya berekî û bilind havêt; dê here Feho, tu jî di wextê xwe de Fehîma bûyî. Bihurî gorepana pişt gundî, tiliyên piyê xwe yên çepê ji pişt ve kirin nav tiliyên destên xwe yên rastê û bi eşqekê dewrek veda:

Yasîn were berdeqê, ez qebê te dixwazim.

Vepeşiya û tî û tî çû, destê xwe da ber xwe, piştî mûyên spî li pişt destê xwe dîtîn hîna nû zanibû ku ne wextê wî û yariyan e.

Sernişiv bû bo ber bi çeman. Bi rê ve çavên xwe digerland, ne wekî caran xoxek ji barê rezvanekî ketiye û ne hirmiyek. Hindî nêzikî devê gelî dibû hewayeke hênîk dihat, lê ne bêhna pûngê dihat wekî caran û ne jî dengê avê. Hemû tişt guherîne wekî mûyên pişt destên wî.

Piştî hilkehlê wekî peykerekî ma cuhnî û destên xwe serevraz kirin û lêvên wî liviyan: Hooo eve goristan çiqas mezin bûye, eve vî xelkî çi kar nîn e ji bilî mirinê, heger wisa be heta du salên dîn ev her du zûre jî têrê nakin!

Mîna serokomarekî li ser berika sor bi pêngavên giran û pîvayî hêdî hêdî çû ber kêliyêkê û mîna hêştirekê di sê gehan re nixiya û xwe çemand û rûnişt li ber serî. Piştî bêhnêkê ji bédengiyê got: Bi-bore keko tu çi bibêjî mafê te ye, bawer bike ez ne berpirs im, ne bazirganekî hefkstûr. Ez rêncberekî bi heft karan im, spêdê dikim şev û şevê dibizdînim da spêdê naneke germ li ser mêdeka xwe bibînim. Ez dizanim ev ne behane ye, ma bo te çi bibêjim;

Girê Balyoz ê ku bûye gîfîkê egal û postalan.
Kerkûk nemaye Qudis û dilê Kurdistanê, dibêjinê
Îraqa biçûk. Ez dizanim tu jî wekî min jî siyasetê
bêzar bûyî. Tu dizanî Xezê keziya spî li malbavê ve-
handî û Fehê heta vê gavê du caran şû kiriyê. Bo te
çi bibêjim gundê me bûye cihaneke mezin, Eloyê
şivan spêdê taştê li Brukselê dixwe û firavînê li
Amsterdamê û şevbêriya xwe dibe nav tezerên
Parîsê.

Bo te çi bibêjim keko, bi bîra te dihê min hemû
dema dişiya te, li xwangingehê mamosteyî tu di-
hêla li ser piyekî û çepik bo min lêdîdan, dikana
Xatûnka Goyî dilop dikirin, kê ban digêra û kê rihet

loqme dadîqurtand, bi bîra te dihê li kolana teng
kê singê Fehê digemirand û kê li serê kolanê zêre-
vanî dikir û qurç li gewriya xwe didan. Keko min
hemû dema dişiya te, şevên havînan li taxên
qereçîyan min ber di kuleyên jinikan wer dikirin û
spêdê muxtarî li kirasê xwe dida û digot: Hawar ez
bo xwe jî ber Yaso birevim kê derê. Ne jixwe keko
min hemû dema dişiya te, lê vê carê te ez jî qurm
kirim, tu şehîd bûyî û ez mam.

Ez ê bimirim û tu namirî.

** Ev çîrok diyarî ye bo hevalê zarokîniya min şehîd
Yasîn Îbrahîm Şerefanî yê li 13/05/1984'ê hatiye girtin
li ser sinorê Sûriyeyê û li 01/04/1985'ê li gel dozdeh
hevalan li Bexdayê hatine sêdaredan.*



Va ye diçim Amed

Navê te mîna nivîstekê
Digerînim di stuyê xwe de
Îro stuyê zarokan xwar e
Nakenin kal û pîr
Digirîn çem û kaniyên te

Va ye diçim Amed

Keçên te keçên te
Di sindoqa xwe de
Veşartine axa te
Ji bo bejna te
Dengbêjan qelaştine
Qirika xwe
Ji bo bejna te
Me sond xwariye
Me sond xwariye
Ciwaniya me xelata te

Va ye diçim Amed

Baranek dibare
Xwe kirin binê sifirneyan
Çûkên te
Dilerizim diqerisim
Diçilmisim Amed
Mîna gulên te

Kalê min kalê min
Hê jî şekirnokan dide min
Ez jî didim zarokên te
Tu zanî
Nagirîn pilingên te
Me şêr neqş kirine
Li ser deriyên te

Va ye diçim Amed

Bi xatirê te

Peya SUVARÎ

Kalo û nîv kîlo pîvaz

Mîrza RONÎ

Di destpêkê de bi axîneke kûr ez dest bi vê nivîsê dikim. Axîneke kûr ji bo ku car caran dîmenekî bi tenê jî jiyanekê şêst salî, wek ku mirov filmekî di ber çavê xwe re derbas bike zindî dibe. Di her çar kuncê wî filmî de xizaniyek, rastiyeke û jiyanekê trajîk bi ber çavên mirov dikeve. Ev dîmen dîmenê kalekî şêst salî ye. Dema di ber çavê min re derbas dibû, çavê min bi pîvazên di destan de ket û xwezî min ew dîmen nedîta. Bi axînekê min li rûyê kalo û li pîvazên di destan de nihêrî, bi nêrîneke nekar, belengaz û çavtarî.

Kî dizane bê ka wî ev pîvaz bi kîjan pereyên xwe yên hindik kiriye. Dibe ku pereyên xwe yên dawîn dabe van pîvazan, dibe ku bi qasî pereyên dayî van pîvazan jî di berîka şalê kalo de mabe. Li gor wî dîmenê min dîtî, ez dibêim qey ji nîv kîloyî ne zêdetirbûn pîvazên di destê kalo de. Gelo ji bo ku çend zarok bixwin ew pîvaz kirîbûn, kalê min ê qehremanê vê nivîsê. Xwezî min kalo û ew pîvaz bişopanda heta ku armanca pîvazkirîna kalo bi cih bûyî. Min bidîta bê ka çend zarok wê bibeziyan pêşiya kalo. Xwedayo bê ka wê bi çi kelecana û coşê bibeziyan pêşiya kalo û kalo hembez bikirina. Min ê bidîta bê ka kalo çi ji zarokan re bigota, der barê van pîvazan de.

Lê ez naxwazim bifikirim jî, wî dîmenê ku kalo bi kelegirî wê ji zarokan re bigota min pîvaz anîne... Xwezî mafê bijartina dîmenê di destê min de hebûya; min ê ew dîmena ku kalo li cem zarokan, kelegirî pîvaz di dest de, ji mejiyê xwe bişûsta. Ax kalê min ê dilbikula û bi keder, ez dizanim bê ka çi qas ew dilê te yê nazik bi dîtina wan zarokan wek şûşeyê diderize. Ez dizanim bê ka çi qas tu ji bo wan pîvazên di destê xwe de naxwazî biçî malê. Lê kalo

here, here ji bo ku çavên zarokan li riya te ye; da ku tu zikê wan ê birçî têr bikî.

Kî dizane dibe ku zarokên te bi xeyalên fêkî û şekirokan çav li riya te ne. Lê kalê min ê diltenik, tu qet xemgîn nebe, ji bo ku pîvazên te di nava xizaniya te de ji şekirê şamê û xwarina dewlemendan tevan xweştir û şîrîntir e.

Qet xwe sist neke û here devê zarokên xwe bi wan pîvazan şîrîn bike. Tu bizanibe wê zarokên te, te di nava dilê xwe yê dewlemend de heta dawiyê bi cih bikin. Ji bo ku dewlemendî ne di xwarina xweş û pereyan de ye; dewlemendî ew e ku di dilê mirov de çandî be. Te dewlemendî di nava dilê xwe yê xemgîn de wek gula evîndaran çandiye. Û qet ne-fikire jî kalê min ê diltenik, dilê te xwediyê dewlemendiya herî mezin e li cem zarokên te. Tu serbilind û dilciwan î, tu zarok, kal û têrmîrov î. Ew dîmena ku pîvaz di destên te de ne, ne kêmasî ne jî xizanî ye, ew dîmen rastiya şîrîniya dilê te ye, kalê min ê diltenik.

Min gelek mirov dîtine pîvazan naxwin, lê tu her bizanibe ku dilê wan ne wek pîvazên di destên te de şîrîn e; ew diltehl û dilkevîr in. Lê tu kalê min ê xwîşêrîn û dewlemendê mirovahiyê yî. Te îro bi vê dîmena xwe jiyanekê bi jan û kul di ber çavên min derbas kir. Te şîrîniya wê janê wek perwerde di mejiyê min de bi cih kir.

Û her tim bizanibe kalê min ê diltenik, ez ê her tim şopdarê te û pîvazên di destên te de bim. Ez ê hertim şopdarê dîmena jiyana te bim. Ez ê her tim hevalbendê dilê te bim, heta ku em dilkevîran bi dîmena te şîret bikin û wan bikin mirov, em ê di nava doza dilê te de keftûleftê bikin. Û a niha bi xatirê dîmena te kalê min ê diltenik, bi xatirê te.

XAÇEPIRSA HELBESTA KURDÎ YA NÛJEN

1. "gava ez diçûm / nivişteke çêkiribû / diya min ji bo min / sê nanên firneyê qewl kiribû / ji bo ku bayê li ezmanan li min nexista" Ev helbesta bi navê "dê û law" ya kê ye?

- a) Rojen Barnas b) Rênas Jiyan
c) Berken Bereh d) Fatma Savci

2. "Xweda/ Ez ji şaş mam bawer kin / kê destûra vê komkujîyê da / li min biborin/ ketime bextê we!/ Mirovahî/ Hûn bi hev re mirin / bi wekhevî bi biratî / rûreşî para me!" Ev helbesta li ser "Helepçe"yê ya kê ye?

- a) Ehmedê Huseynî b) Şêxmûs Sefer
c) Lal Laleş d) Berken Bereh

3. Kîjan helbestkarî di meydana mezin de got "A ku li ber destê te ye berî helbestê helwest e. Ev şîr ji mîkrofonê re hatine nivîsîn, ne ji xwendina bêdeng re" û welatê xwe terk kir?

- a) Evdila Peşew b) Şêrko Bêkes
c) Cegerxwîn d) Rojen Barnas

4. "Gula sor / hil bû jor / bêhn da dor / Gula sor / Gula sor" gotinên vê strana ku Ciwan Haco distrê yên kê ne?

- a) Celadet Bedirxan b) Cegerxwîn
c) Jîla Huseynî d) Qedri Can

5. "Şevêk bi şeytên re" navê dîwana kê ye?

- a) Nahid Huseynî b) Ehmed Huseynî
c) Jîla Huseynî d) Kejal Ehmed

6. "Şikandim awênêyî teqlîdî qeder" ji helbesta kê hatiye wergirtin?

- a) Şêrko Bêkes b) Mestûre Erdelanî
c) Jîla Huseynî d) Jana Seyda

7. "Ava bi ronahî wek zerdeşt î / Dinê û esman î mêrg û deşt î / Sor û rohelat î deng û nay î / Bihar û bilûr î birûsk û ba yî" Ev gotinên ku Koma Rewşen ji kiriye stran yên kê ne?

- a) Seydayê Tîrêj b) Cegerxwîn
c) Osman Sebrî d) Kamuran Alî Bedirxan

8. "Min heyvanê xwe ji heyva nava xwe girt. / zeman û zemherîr / ziman û zehîr / wekî marekî bê-jehr di kevirên sebrê re bihurîm" Ev gotinên di helbesta bi navê "Qetran" de hene yên kê ne?

- a) Dost Çiyayî b) Lal Laleş
c) Kawa Nemir d) Ferîd Xan

9. "Ez zaremya / bizmika zimanê min zengiya / û zeng firidî ji keviya lêvên min" Ev gotinên kê ne?

- a) Kawa Nemir b) Rênas Jiyan
c) Îrfan Amîda d) Ehmed Ronîar

10. "Netirse / kula ruhê te / bo qonaxên heyata te gor bi gor li dû xwe bihêlin / wê nazilî ava binê şerbikê te bibin / sêhra peyvên jibîrbûyî / eger tu amade bî mîrê mirina eşqê / ez ê bidim nav çolbeyarên ruhê xwe" Ev gotinên kê ne?

- a) Yeqîn H. b) Lal Laleş
c) Jana Seyda d) Arjen Arî

11. "Hewşên gihatehl ji bîr bik / meçî daristanên cîran / kesera te yekpare, sêzaravayî / soz bext, ji te re hoz û rext / va qutabiyê birînên devê te" Ev ji helbesta kê hatiye wergirtin?

- a) Kawa Nemir b) Welat Dilken
c) Mem Bawer d) Mizgîn Aydın

12. "Dilbera qeşeng terhîn û ciwan / Li serî zer-zeng di dest de piyan / Pêşkêşî min kir, mayî ji lêvan / Bi vexwarin da kirim netîwan" Ev gotinên ku Ciwan Haco kiriye stran, ji helbesta kê hatiye wergirtin?

- a) Ehmed Ronîar b) Arjen Arî
c) Mem Ronga d) Rojen Barnas

13. "Min helbestên xwe li ser pelên cixareyê nivîsî û wisa ji girtîgehê derxist" Di heman katê de navê pirtûkên vî/vê helbestkarê ev in "Gulên qasid", "Xewnên zîvîn" û "Bîra birînê" Kî ye ev helbestkar / nivîskar?

- a) Fatma Savci b) Azad Zal
c) Axîn Welat d) Hogir Berbir

14. "Wek dastana jibîrbûyî ya li ser keviyên sincirî yên reşkonê te, ber bi çemê te yê mirî ve tîm / Kavîlên dilê xwe / gav bi gav, bi jena tavsorka te dîlorînim / û dûmana peyvên kefdayî li tenîşt serçavka pencereya te haş dikim." Vê helbesta "Yar gewrê" ya kê ye?

- a) Berken Bereh b) Ehmedê Huseynî
c) Muhsîn Qoçan d) Kawa Nemir

15. "Şêrgele hene; bê kêl û bê gorn / Şêrgele hene; şevçirax û heyve-ron / Şêrgele hene, ji azadiya bi gon / Di bin axa sar de b' axîn razayî!" Ev helbest ya kê ye?

- a) Serkeft Botan b) Evdê Cano
c) Arjen Arî d) Edo Dêran

13 û berjortir: Tu bixwazî ji tu nikarî wînda bibî. Ji ber ku helbestê tu bi peyvê dax kiriye.

8-12: Divê keleke din ji li xwîna te bikeve. Li benda şevên reş be.

4-7: Xwedê çavê te stirandiye. Divê tu gelek nanên qijotî bixwî da ku tu peyvên li erdê bibînî.

0-3: Xwendinên te yên heta niha netê ne. Ji nû ve erdê xwe bîajo